

# HÊVIYA WELÊT

DENGÊ KOMELA XWENDEKARÊN KURD LÎ EWROPA

K.L. 3385

INTEGRAL REPRINT OF THE KURDISH CULTURAL JOURNAL "HEVÎYA WELET", NOS. 1-3

Reprinted in July 1976 Cover: Zoro Mettinî
(Original size DIN A 4)

Edited by the KSSE (Kurdish Students' Society in Europe)

Responsible editor: Hemreş Reşo

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

# TÊDAYÎ


| Nivîsar | Nivîskar | Rûpel |
|---|---|---|
| Destpêk ............ | Hemreş Reşo .......... | I |
| Pêşgotin............ | Dr.Noureddine Zaza.... | II |
| Hêviya Welêt,Hêj.-1: | | |
| Hêviya Welêt........ | Dr.Ismet Ş.Vanly...... | 1 |
| Armancên Xwendevanên Kurd li Ewropa...... | Komîte................ | 4 |
| Bang ji bona Azadîxwazên û Komîreya Mafên Cîhanê.............. | Yekitiya Xwendekarê-, Mamostên-,Xortên-û Jinên Kurdistan....... | 5 |
| Qelsok.............. | Osman Sebrî........... | 6 |
| Hêvî................ | Hemreş Reşo........... | 7 |
| Tika li Xwendevanan. | Komîte................ | 8 |
| Şêrê Nezan.......... | Hemreş Reşo........... | 8 |
| Pirçemêk û Silêman.. | Serdar Grîdaxî........ | 10 |
| Hevalê S.Grîdaxî.... | Soro.................. | 11 |
| Daxûyanî............ | Dawiya Têmuzê......... | 11 |
| Şîrîn Welat......... | Azad Hêvîdar.......... | 12 |
| Pêwestiya Pêşvebirina Zimên.................. | Soro.................. | 13 |
| Zaneyekî me gotiye... | Komîte................ | 14 |
| Mafir............... | Osman Sebrî........... | 14 |
| Xwendevanên Delal... | Berpirsiyar........... | 14 |
| Dicle-Firat......... | Osman Sebrî........... | 15 |
| Durû................ | Osman Sebrî........... | 15 |
| Bersîva "Gazin ji Xwedê" | Osman Sebrî........... | 16 |
| Gotina Welat........ | Cegerxwûn............. | 17 |
| Nêçîr............... | Hemreş Reşo........... | 18 |
| Reş bo Azadî........ | Hemreş Reşo........... | 19 |
| Fedekarî............ | Osman Sebrî........... | 20 |
| Şam Şekir e......... | Cegerxwûn............. | 20 |
| Kovara Deng......... | Hemreş Reşo........... | 22 |
| Ziman di jîna miletan de | Osman Sebrî............. | 22 |
| Sêro û Pîvaz........ | Ronahî,1943............. | 24 |
| Xwendevanên Delal... | Hemreş Reşo............ | 27 |

Hêviya Welêt,hêj.-2:


| | | |
|---|---|---|
| Erke Pîrozekanî Hêviya Welêt | Dr.Kemal Fuad..... | 28 |
| Agir be nextê........... | Kamuran Silêmanî.. | 29 |
| Pîrozî.................. | Osman Sebrî....... | 30 |
| Bi hatina Cejna Newroz.. | Komîte............ | 31 |
| Newroz.................. | Osman Sebrî....... | 32 |
| Bîrweriya Cejna Newrozê. | "Dengê Kurd",1964. | 33 |
| Newroz be xoş hatî...... | Şivan............. | 34 |
| Perîşanî................ | Soro.............. | 36 |
| Nexweşiya me............ | Hemreş Reşo....... | 37 |
| Keçika kibrîtfiroş...... | Bişarê Segman..... | 39 |
| Serpêhatiyên Dîrokî..... | Soro.............. | 42 |
| Reya Serbestiyê tenê.... | "Dengê Kurd",1964. | 43 |
| Jan..................... | Osman Sebrî....... | 45 |
| Gîsin................... | Osman Sebrî....... | 46 |
| Ker û Azadî............. | Osman Sebrî....... | 47 |
| Evîntiya Min............ | M.Bor............. | 49 |
| Bawerî.................. | Osman Sebrî....... | 49 |
| Ji rewşên Şoreşa me ....... | Şefo.............. | 50 |
| Bilûrvan................ | Hemreş Reşo....... | 52 |
| Li pê xelkê mayîn....... | Gênco............. | 52 |
| Hey Qehreman Milletê Kurd.. | Cegerxwûn......... | 54 |
| Ta Kêngê emê karker û cotkarê | | |
| Bega bin................ | Cegerxwûn......... | 55 |
| Diçim Hec............... | Osman Sebrî....... | 57 |


Hêviya Welêt,hêj.-3:


| | | |
|---|---|---|
| Şoreşa Kurd û Daxwaza Awtonomî. | Soro.............. | 59 |
| Kurdistan û Serxwebûn... | Hemreş Reşo....... | 60 |
| Serpêhatî:Şerê.Mêşa | Dr.N.Zaza......... | 62 |
| Kronolojiya Nivîskarên | | |
| Kurd li Kurdistana Bakur | Hemreş Reşo....... | 64 |
| Helbestên Biraderan..... | Dr.Kemal Fuad..... | 66 |
| Sewaş ji Xwedê re....... | Hemreş Reşo....... | 67 |
| Marşa Xortê Kurda....... | M.Bor............. | 68 |
| Newroz.................. | M.Bor............. | 69 |
| Xwarok.................. | Hemreş Reşo....... | 70 |
| Axa Welat............... | Hemreş Reşo....... | 71 |
| Wefda Kurdî............. | Osman Sebrî....... | 72 |
| Hosiya Min.............. | M.Bor............. | 76 |
| Diz û Lawik............. | M.Bor............. | 76 |
| Ho Xort................. | Osman Sebrî....... | 83 |

# D E S T P Ê K

Gava em îro bala xwe berdidin dîroka Kurd, em dibînin ku pir kêm kovar, rojname û pirtûk bi zimanê kurdî derketine. Nemaze hêjmara ên bi tîpên latînî gelekî hindik in.
Kovara ku cara siftê derket "Hawar" bû. Ew kovara giranbiha ku bingehê rêziman û nivisîna kurdî a latînî danî, bi destê Mîr Celadet Bedirxan di 15 Gulan 1932 de derket û hêjmara dawî a 57 di 15 Tebax 1943 de derketibû. Niha destxistina vê kovara hêja, ku parçeyek ji dîroka gelê Kurd e, pir dijwar e. Bi tenê hin welatparêzan li ba xwe gişt hêjmarên wê civandin û veşartine, lê gelê Kurd nikane pê destkewtî bibe. Lehengê serbilind Osman Sebrî yekek ji wan camêran e ku xwediyê vê xezîna bêhempa ye û wî kovar pêşkeşî me kir ku em bikanin ji bo gelê Kurd û Kurdnasan careke din çap û belav bikin. Hêvîdar in ku emê bikanin vê pêwestiya pîroz, bi alîkariya heval û hogiran, bînin cî.
Me berî vê berhevoka kovara "Çiya" çapkiribû û îro jî berhevoka kovara "Hêviya Welêt" di bin destên we de ye. Komcivîna 8. a "Komela Xwendekaranî Kurd le Ewropa" di meha Tebax sala 1963 de biryara derxistina vê kovarê da, komîteyek ji bo derxistina wê danî û ez jî kirim berpirsiyarê wê. Lê ji dest sistî û qelsiya hevalan bi tenê 3 hêjmar derketin û di Komcivîna 10. sala 1965 de min dev jê berda û ji bo derxistina wê komîteyek nû, di bin berpirsiyariya heval Şefo de, hate hilbijartin. Lê wan nikarîn di derxistina wê de domdarbin û ew jî wek ên berî xwe mir. Ger em niha jê bipirsin û lê bigerin, bê şik em nikanin wê kovarê li ciyekî bibînin!. Ev jî wendabûna parçek ji çanda kurdî ye.Jiber vê yekê em derxistina vê berhevokê jî gelekî pêwîst dibînin. Ger niha bihayê wê neyê pîvan jî, em sedî-sed bawer in ku dîroka Kurd ê vê xebata me bipesine û giranbihabûna wê binase.
Wek hûn jî dizanin "Hêviya Welêt" û "Çiya" di navbera sala 1963 û 1970 de derketin ku di wê demê de Şoreşa Kurdistana Nîvro dom dikir. Van herdu kovaran jî li gor kanîn rûpelên xwe ji bûyerên wê Şoreşa pîroz re vekiribûn. Bi vê yekê her Kurdek dikane dîroka gel û welatê xwe a 10 salan di nav rûpelên van de bibîne û binase.
Me di nivîsarên "Hêviya Welêt" de destkarî an jî guhartinek nekir, bi tenê hin çewtiyên tê de rastgerandin û serkîniva bi tîpên ciwantir nivîsandin. Hêvîdar in ku bi vê yekê jî em gîhabin armanca xwe û dîroka çanda Kurd dewlemendtir kiribe.
Gava em rojekê ji rojan bibînin ku xebata me ji bo gel û welêt bêrdar bû ye, emê pir şa û serfiraz bibin.

Hemreş R.

5.7.1976

# P Ê Ş G O T İ N

## Çapa Kurdî li Ewropa

Wek hemî xebatên ku Kurd pê radibin, çapa kurdî jî,emrê çapa kurdî jî pir dom nake, diçilmise û dimire.


Kovara kurdiya pêşin, bi tîpên latînî, ku li Ewropa derket "DENGÊ KURDİSTAN" bû. Banga xwendewarên Kurd a pêşîn li Ewropa bû. Her meh carekê derdiket. Ji sala 1949 heya sala 1950 dom kir û 12 hejmar jê hatin çap kirin.Niha dibe ku ev hejmarên ha, bi tenê li ba Mîr Kamuran Bedirxan peyda bibin. Berî ku ez vegerim Sûriyê, tevî wesayiqên din, min ên xwe spartibûn İsmet Vanly. Piştî ku, di sala 1970 an de ez dîsa vegeriyam Sivisre, min pirsa wan kir: yek jî li ba xwe nehiştibû. Mirina "Dengê Kurdistan" ji ber ji hev xistina civatê bû. Ev jî ji ber endamên wê yên "çep" bû.

Di sala 1956 an de, civata xwendewarên Kurd li Ewropa ji nû ve hate vejandin. Kovara "Kurdistan" bû hingê dengê wê. Lê piraniya nivîsandinên vê bi îngîlizî û hinek jî bi kurdiya soranî bûn. Heya 1963 an, civatê tu kovar bi kurmancî dernexist. Vê salê, Komelê hilgirte ser xwe ku li bin berpirsiyariya Hemreş Reşo, bi navê "Hêviya Welêt" kovarekê bi vî zarê kurdî derêne. Ev xebat pêk hat û,pê hev, ev kovar heya sala 1965 derket. Di sê hejmaran de ku di vê demê de çap bûn, gelek helbest, çîrok, metelok, bendên siyasî, dîrokî û hin din rûpelên wê xemilandin û çanda kurdî zengîntir kirin. Da ku ev xebata ha winda nebe, wekek Hemreş Reşo dil dike ku her sê hejmarên "Hêviya Welêt" bide hev û ji wan kitêbekê pêk bîne.

Ez hêvîdar im ku xortên me wê bixwînin û bikin ku, di pir nêzîk de, kovareke din wek wê dîsa bête meydanê û jê bêtir emir bike. Dewletên xwînxwar nahêlin ku em li welatê xwe, bi serbestî, bi çand û zimanê xwe mijûl bibin. Lê Ewropa ev rê ji me re vekiriye, divê ku em vê kêsa ha ji destê xwe bernedin û bala xwe bidin parastin û pêş de birina çand û zimanê xwe. Bi tenê, bi vî awayî emê Kurd bimînin û dawî jî bigehine doza xwe. Xortno! Brano! Bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin û wî bidin xwendin û nivîsandin! Her ro nîv saetekê xwe bi vî karî mijul bikin têr dike. Miletê me di tarî û perîşaniyê de ye. Riya rizgar û geş kirina wî ev e!...

Dr.Noureddine ZAZA

# HÊVIYA WELÊT



Dengê komeley Xwêndikaranî Kurd le Ewropa

Sal : 1

Jimar : 1

Razber 1963

# HÊVÎYA WELÊT

Derxistina Hêviya Welêt bi zimanê kurdî bi zaravayê kurmancî (ê Bakur) û bi tîpên latînî, ew bi xwe bûyînek mezin e ji bona çanda niştimaniya Kurd a nû. Hêviya Welêt dê ji bona lawên Kurd li welêt ramanên hinkesên baş ji birayên wan li welatê xurbetê bughêze, pê re jî evîndariya wanî şêrîn ji bo Kurdistana dûr, silav ji bo milletê kurdistanî têkoşer. Hêvî ew e ku Hêviya Welêt bi gotarên xwe ve, derketina wê li dû hev dê wê valabûnê di warê çanda niştimaniya Kurd dagire, ji ber ewaya bi zaravayê kurmancî ê şêrîn derdikeve ê pirbûna milletê Kurd pê dipêyîve di Kurdistana Turkiyê de, Sûriyê, Yekitiya Sovyet û hin perçên din ji Kurdistana Iraqê û Iranê. Zaravayê kurmancî zimanê Ehmedê Xanê ê bilind ê ku şaîrê kurdî niştimanê kilasikiyê mezin ku di sedsalên 17 de hatibû dinê, kurmancî a ku niha tê xwendin li hin zanîngeh û dibistanên bilind li Paris, Yekitiya Sovyet a di bin nîrê sitema millî de, nemaze li Turkiyê di çel salên çûyî de, herwekî ku %45 ji milletê me li wir dijîn, a dûrî pêşveketinê ketiye û negîha herdu xwehên xwe zaravayê soranî û mokrî.

Hêviya Welêt bi xwe ne kovareke siyasî ye, lê belê wê kovareke çandî be, tev li wê jî dibînim ku di vê gotara xwe de,di jimara pêşî de, bi lez û bez li ser rewşên milletê meyî Kurd ên niha bipêyivim.Di vir de ne warê ku yek li dîroka milletê Kurd bikole, an jî li welatê wî, reha wî a Hîndo-Ewropî, zimanê wî ê arî, dîroka tevgera wî a niştimanî a pêşverû ku Kurd niştimanekî bi serê xwe ye li gor maneya zanistî a pirsê, niştimanekî ku hemû şirûtên niştimaniyê tê de tên dîtin, yekitiya (Kurdistan), yekitiya zimên, pêkanîna dîrokî, danûstandinên aborî, yekitiya çand û yekitiya derd û hêviyên wan. Niştimanekî zor lê tê kirin, mafên wîna jê hatin standin,welatê wî hatiye perçe perçe kirin.

Ji giringtirî pirsiyarî ye di rewşên milletê Kurd di ên niha bê gotin. Şoreşa pêşverû a niştimanî ku li Kurdistana Iraqê vêketî ye ji êrişa bêbext a ku leşkerên dîktorê Iraqê ê berê General Qasim pê rabûn di 9 septembir 1961 de a ku bû sebeba ketina hukumeta Iraqê û kuştina dîktatorê wê di 8 şubatê sala 1963 de. Weke ku eşkere ye ev cenga han careke din dest pê kir di 10 hezîranê sala 1963 de piştî êrişa leşkerên hukumeta Iraqê a Beesî

bir ser Kurdistan bi alîkariya Beesiyên Sûrî.
Leşkerên şoreşvanên Kurdistan di bin rêberiya qehremanê milletê Kurd General Mustefa Barzanî serekê Partiya Demokratî Kurdistan a ku rêberiya tevgera pêşverûyî Kurd û pêşrewê milletê me, êrişa bêbext rawestand, bê gotin e milletê me û leşkerên wî dê hustiyê êrişvanên Beesiyan bişkêne. Faşîstên Erebên Sûrî,milletê Ereb ji wan xwûnrijandina wan dûr e. Bê gotine dê armancên şoreşa Kurd bi cî bên, ewaya jî dawiya serdariya Beesiyan a bi Xwûn tîne, vegerandina azadiya demokratî, rêstika parlemanyê ji bo Iraqê û gihandina ewtonomî ji bo Kurdistana Iraqê di nava sînorên komara Iraqê dê bi cî tîne.
Milletê Kurdistana Iraqê ne bi tenha xwe di vî şerê derketinê de ye. Pirbûna milletê Ereb li Iraqê piştgirtina wî digre û herweha jî demokratên rojhilatanavîn: Ji Ereban,Farisan û hemû evîndarên dadimendiyê (edalet) li cîhanê bi tevayî.
Piraniya milletên Cîhanê nola Frensizan,Swîsrî,Italî,Elman,Lûbnanî,Sovyetî,Çekî, Mongolî û herweha jî rojnamên cîhanê ên mezin û îzgeh û televîzyon, ev tev de bi gringî didin dû nûçeyên cenga Kurdistan,eşkere ye ku milletê Kurd li derveyî Kurdistana Iraqê piştgirtina Kurdên Iraqê dikin û derdên wan yek e ji ber milletê Kurd tev de niştimaneke û evaya rastiyeke zanistî ye û ne pirseke vala ye, ev piştgirtina han bi xwe li ser hezkirinê ye ji ber nîrên ku îro di perçên Kurdistanê de ne wek nola nîrên ku hiştin ev cenga şoreşî li Kurdistana Iraqê vêkeve. Ji ber van sebebên han ku nayên xwestin yek wan li vir bide xûyanîkirin, dê ev cenga han bimîne bes tenê di nava Kurdistana Iraqê de (ger ku êrişeke leşkerî nere ser Kurdistana Iraqê ji derve, ev jî merovekî bi namûs hêvî nake ji ber parastina aşitiya cîhanê).Lê belê lawên Kurd li Turkiye, Iranê û Sûriyê divê ne bes bi piştgirtina hezkirinê bi Kurdên Iraqê re bin û dev ji pirsiyariyên xwe berdin. Pêwestiya bingehî li ser xortên Kurd li Turkiyê,karkirineke rêxistina nerm li dû hev ji bo pirsiyarên mezin ên tên ber milletê Kurdistana Turkiyê bi taybetî û Turkiyê bi tevayî. Her weha jî wilo ji bo xortên Kurdistana Iranê û Sûriyê.
Pirsiyariyên ku tên ber milletê Kurd li perçekî Kurdistan ne wek nola ê dinê, lê belê tev de bi yek deqa bingehî de tên xûyanîkirin ew jî ev e: Milletê Kurd li her perçe bê par in ji mafeyên xwe ên millî û çandî (kultur) ê tabiî ku ew milletekî bi serê xwe ye di millîbûn û zimanê xwe de wek Tirkan,Farisan û Ereban.

Deqa dudyan a ku milletê Kurd tev pê yek in ew jî rewşa milletê Kurd ku li her perçe bê par e ji azadî û demokrasiyê. Di vê deqa han de milletê me nola milletê Tirk, milletê Ereb (li Sûriye) û milletê Iranê bi tevaya xweyî millî ve tev de ji azadî bê par in.

Têkoşîn ji bo van mafên han û van azadiya di hundirê Turkiyê, Iranê û Suriyê de (ne tenê piştgirtina hezkirinê ji bo cenga Kurdistana Iraqê) ev pêwestiya pêşî ye ji bo tevaya xortên Kurd. Evaya rastiyeke xûyanî ye, lê tev li vê jî baştir e ku yek rastiyê bibêje, da ew nayê ji bîrkirin. A ku hêvî dikin aşitîxwazên û dadimendîxwazên tevaya cîhanê a tevaya tevgera kurdî niştimanî dixwaze bi taybetî rêberiya bilind a şoreşa Kurdistana Iraqê komîteyên nawendî ên Partiyên Demokratî Kurdistan, komîteya li berdana mafên milletê Kurd û weha jî tevaya rêxistinên Kurd li Turkiyê, Iranê û Sûriyê bi reyên aşitî bi alîkariya hiner û hêzên demokratî ên baş ji milletê Tirkî ciwanmêr, milletê Faris ê çak û milletê Ereb ê bi nav û deng bi adatên xwe ên qenc.

Hêviya Welêt, bi bîr û baweriyên min dê nameya xwe baş bi cî bîne ger ku vanên jêrî deyne ber çavên xwe:

1- Guhdan ji bo wêjeya (edebiyat) kurdî a klasikî a ku nû û xûyanîkirina tiştên ku di nivîstokan de di vî babetî de û reya zimên de. Her weha ji ên di zanîngehên biyanî de hatine belavkirin.

2- Guhdan ji bo dîroka milletê Kurd û cografya Kurdistan.

3- Divê em her û her li ser daxwazên milletê Kurd bidin xûyanîkirin, a ku di gîhandina wî de ji bo mafên wî ên millî û çandî di reyên aşitiyê de di nava dewletên ku tê de dijîn, bi alîkariya hêzeñ demokratî ên baş ji lawên dorhêla wî, her weha jî milletê Kurd ji bo wan milletan nameya dostaniyê û evîndariyê hilgire, ji wan re bide xûyanîkirin neqenciyên dîktatoriyê û rehtîyê (riç) û nebaşbûna çûna çînên (tebeqe) serdar, bêmafkirina milletê Kurd ji hemû mafên wîna, xûyanîkirina başbûna vekirina pirsiyariyê kurdî bi aşitî û rengekî nerm ji bo Kurd, Faris,Tirk û Ereb. Rastî û dîroka milletê Kurd a nû dide xûyanîkirin bêkariya înkara mafên milletê Kurd. Daxwaza milletê Kurd bi hiner û înkarkirina nayê vekirin, ji ber ku ewaya he ye..

4- Pêwîst e ku milletê Kurd ne bes guhbide pirsiyariyên xwe ên millî, ger ewaya guhbide pirsiyariyên ku tên ber Turkiyê,Iranê, Iraqê û Sûriyê di warên siyasî, aborî û civakî. Herweha jî milletê Kurd bi hiner û hêzên demokratî û pêşverû ên milletê dorhê-

la xwe kar bike, ji bo wan pirsiyariyên han.

5- Pêwestî ye rabûna hêz û hinerên niştimaniyên Kurd bi pêkanîna rêxistinên xweyî taybetî ji bo karkirinê ji bo wan armancên jorî ên ku hatin gotin. Daxwazên milletê Kurd ên millî ên nerm ku bi carekê armancên wana ne cihêbûnê. Evaya nade xûyanîkirin ku bi carekê rêxistinên taybetî ên bo Kurd neyên pêkanîn. Lê belê a rast ku hebûna wan rêxistinên kurdî pêwîste, lê evaya nabe kelem ku Kurd têkevin rêxistinên demokratî ên Tirk, İranî an jî Erebî, an jî alîkarî bi wan re li gor nîr û rewşan. Ger ku ewana bi hebûna milletê Kurd rûnin û karbikin ji bo mafên wî.

Dijwarî û kelemên ku dê têkevin pêşiya H ê v i y a W e l ê t pir in û di nava hevdidan e. Liber yeka han gereke xwendevanên wêna li welêt guman nekin rabûna wêna bi cîanîna nameya xwe bi rengekî baştir ji destpêkirinê de, ger ku ewana lê bibhurin û alîkariya wê bikin di belavkirina jimarên wêna di nava welêt û agahkirina komîteya wê bikin ji bo başkirina wêna. Jê re rexne û gotarên xwe bi wan re jî nûçeyên welêt bişînin. Bi vê alîkariya a manewî û karkirina - ger karibin jî alîkariya wêna bi diravî bikin, dê Hêviya Welêt bikaribe li dû derketina xwe here û her û her baştir bibe, nameya xwe ji bo çanda niştimanî a kurdî bi cî bîne û alîkariya milletê Kurd û demokratiyê bike.

İsmet Şerif V a n l î

---------------

Armancên Xwendevanên Kurd li Ewropa:

1- Xurtkirina danûstandinê di nava xwendevanên Kurd de li Ewropa û rêxistina dîtina li dû hev di nava wan de.
2- Bi cîanîna alîkariya diravî a beramber di nava xwendevanên Kurd li Ewropa.
3- Vejandina çanda netewê Kurd karkirin ji bo kara milletê Kurd û pirsiyariya wî a welatî.
4- Naskirindana çanda Kurd, welatê wî Kurdistan, rewşên wî û pirsiyariya wî a welatî bi cîhanê.
5- Bi hinerkirina canê alîkariyê û dostaniyê di nava xwendevanên Kurd û xwendevanên welatên din, danûstandin bi rêxistinên şagirtan û şagirtên welatî yan jî cîhanî, alîkarî bi wan re li gor armanc û karên bi hev re.

6- Xebatkirin di têkoşîna milletê meyî Kurd, piştgirtina têkoşîna hemû milletan dijî kolîdar, kevneperest û derebekaniyê, ji bo aşitiya cîhanê, demokratiyê, derxistina welatî û çarenivisiya wan.

---------

## Bang jibona Azadîxwazên û Komîteya Mafên Cîhanê

Ho azadîxwazên cîhanê! Dengê xwe bilind bikin di rûyê hukumeta Beesî a faşist ji bo derxistina bi hezaran ji zarokan, jinan û kalên Kurdistanê ên dikevin bin tirsa wendakirina tevayî bi bonbên "Napalm" ên ku di nava dewletan de qedeXe ne (yasaq),her weha jî bi agirên tank û mîtralyozan. Dengên xwe bilind bikin ji bona derxistina têkoşvanên Kurdistan Salih Ebdulla Yusufî wekîlê serekê nêwerên Kurd ji bo danûstandinê. Her weha ji bona hevalên wî ên mêrxas ku ewana jî endamên delegasyon bûn ku xistin zîndanê di heyştê hezîranê, yanê berî derxistina ultîmatoma dawî ji hukumetê ji bo şoreşvanên Kurd. Ewana niha di bin êşandineke pirr pîs dane di ciyê girtiya "Fedil" bi destê Beesiyan ên faşîst.

Ho azadîxwazên Cîhanê! ji we re rewşekê bi kurtî li ser reyên dirindane ên di zîndanên Îraqê de dibin. Gava welatperwerek tê girtin wîna dibin cihê girtinê lêdixin lêxistinek pirr pîs hetanî xwûn ji laşê wî tê, ew xwe winde dike, nema dihêlin kes here ba û bibîne, da nûçeyên kar û barên wanî dirindane dernekevin der ve ji pişt şivên hesinî. Weha xwûnmij pehlewaniya xwe herro vedigerînin. Xwarin û vexwarin li ser welatperwer dibirin,gava ewaya xurtbûna xwe xûyanî dike, wê gavê ewana dest bi jêkirina laşê wî dikin. Paşê nênûkên wî hildikin, çavên wî derdêxînin, pişt re jî tillî û destan jêdikin heya ew dimire. Wê gavê xwûnmij daxûyaniyekê derdixînin di bin îmza hakimê leşkerî de ku ewaya hatiye bi dardakirin li gor reyên mehkemê. Evana hinek ji pirran ji kar û barên dirindane ên ku Nazî û faşist pê ranedibûn. Ev karên han ger ku tiştekî bidin xûyanîkirin bes tenê kurha (kerba dilê wan) wan faşistan ji reha merovan.

Em bi navê wî merovî ku namûsa wî tê pîskirin û mafên wî di jîneke xweştir tê talankirin bi destên kesên sitemkar û xwûnmij bang we dikin, em bang bextên we dikin ku hûn dengên xwe bilind bikin dijî wan xwûnmijan, da ew bêne tazîkirin li ber Cîhanê.

Yekitiya Xwendekarên,Mamostên, Xortên û Jinên
K U R D İ S T A N

"Q E L S O K"

Qelsok! ji bo çi hinde tu tirsok û newêrî?
Hingavt dilê te tirseke xurt çavdayê jêrî!
Gava hinekî teng dibe dinya li ser te,
Tête guhartin ji reya rûmetê berê te,
Hercar felatê tu di revê de dibînî,
Teqez reben î, bêzirav î, kêmê zemîn î..
Tirsîn di cîhan ne reya gîhan û felat in,
Xurtî, mêranî, her gavê dermanê xebat in,
Tirsê tucaran kes negîhand warê azadî,
Bizdok bêzirav tê nagêhin ka çi ye şadî.
Herdem dilê wan lêdide bêhemdî ditirsin
Dikin şayîşan çarmedor ew pê de dipirsin,
"Filan ji bo me çawa ye? bêvan dê çawa be?
Gava têkevin tengiyê ew dê bi me şa be.."
Tucar nikarin baweriyê bi kesî bînin
Di her kira yar û neyaran tirsê dibînin,
Her behnê belake nediyar tînin bala xwe
Destê neyaran ew dibînin di nav mala xwe
Nema dikarin tev bigerin serî hilînin
Di nav siya xwe durvê neyarekî dibînin
Ev e di cîhan felsefa qelsokên belengaz
Raman û xwedî ne hêjan e qaşikê pîvaz,
Lê gava dinê xweş dibe tirs namîne yekcar
Hînga dide xwe radibe qelsok dibe keftar
Qîma xwe nîne bi min û te ne jî bi çendan
Wek Ristemê Zal nayê girêdan bi kemendan
Nayê bîra Wî ka berî çendekê çi mêr bû
Yê ku nedîbe wê bêje:"Ew tim hole şêr bû".

"L A B Û T"

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

# H Ê V Î

Gava ku min ev gotina han li jor danî, dilê min lerzî û çavên min tije hêstirk bûn. Jiber ku tiştekî nola wê xweştir û dîsa tiştekî wek wê xapînok û dikare merov berbend bike, nehatiye rûyê erdê.

Herkesek li gor jiyan û daxwazên xwe xwadan hêviyekê ye. Di zarokên berşîr de bigre heya ên kal, bi şîn (qudret)û hêza wê gotinê dikarin di wê jiyana xwe a ku pê ne xweş in de, heya dawiya emrê xwe bijîn û li dijî wê têkoşînê bikin. Di navbera merovan de henik henin ku jiyana xwe bi tevayî dane ber hêviyên xwe. Ewana jî ên ramangîr û xwadandoz in. Jiber ku ewana bo xwe tenê xebatê nakin, barê ku li ser milên wan, barekî pir giran û pêwestiyên wan jî gelekî dijwar in. Mafê wan tune ye ku li der wê reya ku dane ber xwe xebatê bikin. Gava ku ewana li reya ku pê girtine têne der, dikevin bin gunehekî mezin. Ew kesên ku bi wan ve hatibûn girêdan dibin goriyê xelit û şaşiyên wan. Bo vê yeka han ew merovên bargiran gava ku hêviyên xwe wenda dikin, wek êzingên avgirtî û masiyên ku av li ser tên birrîn, qels dibin, giraniya xwe wenda dikin û nema dikarin bijîn. Kes çawa ku bê av, ba û xwarin nikarin bijîn, bê hêvî jî giringiya jiyana wan namîne û li mirinê bêtir û qirêjtir dibe.

Xwendevanên delal, li dû vê pêşgotinê dixwazim hinekî li ser hêviyên welatan, nemaze ên bindest binivîsim û ligor têgihêştina xwe ji we re bidim xûyanîkirin. Gava ku merov li ser welatan dipeyive, li ber her tiştî ew jiyana gelên ku di wan welatan de rûdinin tên ber çavan. Li gor vê yekê merov (bi dîtina min) dikare welatên cîhanê bike çar bendan:

1- Welatên bi her awayî pêşveçûyî

2- Welatên ku di rûnê xwe de têne qewirandin (birajtin)

3- Welatên paşdemayî

4- Welatên bindest û bê maf dijîn.

Welatên pêşveçûyî-mîna USA û Sovyet- hêviya wan ew e ku bi pêşveçûna xwe ser ji ên din bistînin û welatên paşvemayî jî bi xwe ve girêdin. Welatên dudyan ku "di rûnê xwe de diqewirin", hêvîdar in ku wê bêdengiya di nav gelê xwe de wenda nekin û di wî nîrê xwe de bijîn. Welatên sisiyan jî (Tirk û Ereb h.p.) têkoşînê dikin ku bi alîkariya ên pêşveçûyî bigêhin jiyaneke xweştir. Lê belê ên çaran ku bindest û reben, ne wek wan welatên

jor ku bi kurtî hatin gotinin. Hêviya wan bi ramanek bilind a niştimanî û serxwebûnê a ku bikaribin wek kesên din bijînve hatiye girêdan. Ew gelê wî welatî ji hemû mafên xweyî merovtî bêpar in (nola me Kurdan). Yek ji wan mafên tewr bi çûk ku bi zimanê xweyî zikmakî peyîvîn û nivisîn e, mixabin ewana ji vê jî ê bêpar in.

Xwendevanên hêja, carekê bidin ber çavên xwe, di sedsalên bîstan de merov di bin destê merovan de, ji hemû mafên xwe ên tebiî bêpar be! Nizanim tiştek lê dijwartir û pîstir he ye ku MEROV bi koliyê MEROVAN be!!.. Nemaze ku kolîdarê merovan jî wek ên me Kurdan "KOLİYÊ KOLÎ" be!!!....

H.Reşo

---

Tika li Xwendevanan,

Xwendevanên delal!

Em hêvîdar in hu HÛN li şaşî û kêmaniyên me bibhorin. Ji me re rexne û pêşneyarên xwe binivsînin ji bo pêşvebirina kovarê.

Komîte

---

## Ş Ê R Ê  N E Z A N

Qels bû şêrê mêk, ber êşa zayîn,
Hat, bû ew roja mirin û mayîn.
Qêjîn pê ket û pê girte nalîn,
Çêle dinê ket,dengê dê hat birrîn!

Şêrê sêwi û çûk, ma bê hêvî,
Wir derket bizinek, lê bû xwedî.
Şîrê wê gir bû, ew şêrê xizan,
Bi çêr û kalîn, bê hêz û nezan!

Demeke dirêj derbas bû serda,
Bê xem û keder, her ken di çêvda.
Ew dijî, di nav keriyê pêzdá,
Mezin bû lê, çavpayî û xewda!

Rojêk lê derket, şerê nêçîrvan,
Ji birçî, çavsorî navkêl kivan.
Dixwest têr bike wî zikê mêvan!
Di nav kêrida dît şêrê nezan!!

Demekê da serhev, derdê zik bîrkir,
Pê re bû ecêw, nikar bifikir.
Neket serê wî, ew pê re bû sir,
Ar ket kezewê, carê axîn kir!

Nikar xwe bigre, êriş bire ser,
Milê wî girt û rawestî li ber.
Bi hêrs dilerzî ew şêrê ZER,
Ber awira wî, ê nezan bû Ker!

Çavan de hêstirk, qurf di piştêda,
Bê kalîn nikar bersîv bi şêrda.
Şêrê serbilind, dît golek çêmda,
Kişand ber avê, serê wî hilda!

Got "binêr avê, va çi Ẍeflet e!
Ser û laşê te, dest û piyên te,
Lêv û devê te, gurz û lepên te,
Gişt şêr in, bê xwarin û peyvên te!"

Gava ku negirt bersîv, bê kalîn,
Bire şikeftê, bi dilê sarîn.
Hinek goşt mabû,pê re pêşkeş kir,
Lê şêrê nezan ew hemû red kir!

Şêrê serfiraz, gelek bergerrî,
Turê lê nedît, lê girte derî.
Bi destezorî, devê wî vekir,
Ew goştê bi xwûn,li wî kir şekir!

Ew zikê goştxwur, derbekê hevket,
Bi çavên şevtarî, hiş çûn û veket.
Xwûna şêran lîst, dilê wî lêket,
Tezî kişandin, GOREGOR pêket!!

Ew şêrê nezan, nema bû xizan,
Şîna goşt û xwûn,ewa kir hêzan.
Ji ên dû xwe re,ewa bû serdar,
Cin û cenawer, hemû li ber xar!

Divê ev çîrok, bo me Kurdan be,
Ên serpêhatî, ligel xortan be.
Xebat pî li pî, destûr wekhevî,
Bîr û bawerî, raman her tevî!

Şêx û mela, aẍa û cotkarî,
Şagirt û karker,bi alîkarî,
Derxin kolîdar,vêxin vî arî!
Nola şêrê ZER,berdin wî parî!!.

H.Reşo

---

Pirçemêk û Silêman

Dibêjin, gava Silêman Pêxember Belkîs ji xwe re anî bû,Belkîs jê xwest ku ji pûrta teyran jê re nivînekê çêke. Silêman ferman da hemû teyran û got:"Divê hûn xwe birûçikînin!" Hînga pirçemêk li wir bû û xwe ranegirt, zûka pûrta xwe rûçikand û çû. Lê teyrên mayî ew ferman ne li rê dîtin û gotin:"Silêman Pêxember ma ne guneh e ku ji bona jina xwe tu me gişkan ha didî rûçikandin? Ew pûrta han canê me ji serma diparêze."
Silêman Pêxember gotina wan rast dît û dest ji wan berda. Lê pirçemêkê xwe niva rûçikandibû. Ji wê rojê de şerm dike ku bi ro derkeve nav heval û hogiran, ji lew re bi şev dertê.

Osman Sebrî

Pirçemêk ji hezkirin û dilpakiya xwe pûrta xwe rûçikand. Li ser vê heta roja îro ro û ronahî nabîne, tarî bû ye hevalê wê. Bê şik û eşkere ye ku pirçemêk niha bi vê kirina xwe pir poşman e û dizane ji azadî û heqên xwe mehrûm e, pûrta wê nayê cî. Vî tiştî her tim xevna xwe tenê de dibîne, ev jî ziyana we hemû ye. Kirina me netewê Kurd re bû ye li vî corî ye. Lê em ne pirçemêk in û perên me hatibûne rûçikandin derketine. Pêwîste ku em bilin bibin bo firandin ne ku "Pêxemberên" me dîsa wan jêkin. Em jî bi lindayî û rindiya çiyayên xwe bibînin, perên xwe li hevxin bira tarî ji ser me derê, dengê me têkeve newal û kendalên me,hezni-

tî bibe.

Serdar Grîdaxî

---

Hevalê S.Grîdaxî!
Mizgîna min li te, dema me ne dema Pêxembera ye. Ev dema me dema azadî ye, serxwebûnê û vegerandina mafeyan ji bo xwediyên wan, ger ew bixwazin. Pêxemberên me jî hinera meyî mezin a veşartî ditirse, dilerize. Ew dizanin ku ew hinera han lehyeke mezin e ber naye girtin, dê wana û Belkîsên wan ji ber xwe termen wan rakêşîne.
Bera dilê te xweş be, emê di nava deşt û çiyayên xwe de govendê bibînin. Xweşî wê têkeve nava welêt.

Soro

---

## D A X Û Y A N Î

Ho Şagirtino! Ho Hevreyên Têkoşer!

Silaveke têkoşerî, piştre.
Rêxistinên siyasî, karkerî û ên din ji rêxistinên gelêr ne bi tenha xwe têkoşînê ji bo xizmeta miletê xwe dikin,lê belê rêxistinên şagirtan jî bi kar û barên hêja di warê têkoşîna welatî de radibin. Em dibînin di nava hemû miletên cihanê de ên azad û ên ne azad rêxistinên şagirtan piştgirtina rêxistinên siyasî û gelêrî ên têkoşer digrin ji bo alîkarîkirina têkoşîna welatî.
Ên hemû dizanin sebeba bingehî ji bo derketina şoreşên miletê me ên berê ji ber ewana ne li ser bingehkirina rêxistinan bû. Şoreşa Kurd a niha li Kurdistana Iraqê vêketiye li ber hinerên kolîdariyê, kevneperestiyê û şovînîstiyê rawestiya ye,ev bi xwe vedigerê ser bingehkirina wê li ser rêxistinên ku qenciya wan şoreş dikare li ser tehta wan a xurt tevaya wan hêz û hinerên pîsên har li ser wê perçe perçe bike.
Zor û sitema unsûrî a li ser miletê Kurd dibe li çar kenarên Kurdistan, bêparbûna wî ji biçûktirîn mafên mirovan ê tebiî,her weha ji tiştên ku tên serê şagirtên Kurdan bi taybetî di tevaya dibistanan de ji girtinê, li dû wan gerandin, hiştina wanî bê guneh, berdana wan ji dibistanan bê sebeb û dan û standina nebaş bi wan re hetanî ji aliyê mamostên wan... Ev tev de pêwîst dikin hebûna girêdaneke ku ew ji nîrên miletê Kurd li ser me datînin, da wê siyaseta unsûrî a li ser miletê me bikartînin bi rengekî tevayî û li ser şagirtên me bi rengekî taybetî bidin

eşkerekirin li ber miletên cîhanê û di nav wan de jî miletê Ereb.
Girêdana şagirtên Kurdên Sûrî nêweriya hemû hiner û hêzên şagirtan dike. Ewaya weke nola hemû rêxistinên şagirtan ên millî yan jî ên cîhanî nikarin bijî û bi pêşkeve ger ku pişta wê naye girtin bi manewî û diravî. Li ser ên çûyî her şagirtek xweser berpirsiyar e ji bo pêşketin û geşbûna vê girêdanê, her weha jî li ser wiya ji ku ew bîr, raman û pêşneyarên xwe jê re pêşkeş bike da karibin bi hev re ji binî tanî serî bête kirin. Girêdan ger kar û alîkariyê ji şagirtan dixwaze pêre jî ji wan re soz dide li çûyina têkoşînê ji bo niştimaniya Kurd a serfiraz.
Bijî têkoşîna miletê Kurd ji bo pirsiyariya wî a adîl.
Bijî biratiya Ereb û Kurd.
Bijî girêdana me pêşrewên şagirtên li Suriyê.

Dawiya Têmuzê

---

## Ş Î R Î N   W E L A T

Megrî welatê şîrîn, tu tim di bîra me de yî.
Tucar tu bîra nabî, tim di dilê me de yî.
Dijîn em herwext bi hesret û nalîn bo te.
Menale şîrîn welat menale.

Li dûr im dengê min nayê te,
Milê min kurt in naghên te,
Bi dil bawer im ko rojek bêm ba te.
Menale şîrîn welat menale.

Hêvîdar im ku nêzîkayîda bêm ba te.
Çiqa baş e jiyan li ser sînga te.
Çiqa rind in deşt û çiyayên te.
Menale şîrîn welat menale.

Tu Xem revîna Xemgîr û dil bi kulan î,
Tu welatê şîrîn ê me Kurdan î.
Dayîna te tunî ne qet bo kesan.
Menale şîrîn welat menale.

Em herwext li pişta te ne,
Xem me ke em hemû ji bo te ne.
Hatina meyî cîhanê ji bo te ye.
Menale şîrîn welat menale,
Tu ne bê xwedî û bê kes î.
Azad Hêvîdar

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

---

Pêwestiya Pêşvebirina Zimên

wendevanên delal!
Weke ku hûn dizanin pêşvebirina zimanekî ji zimanan pêweatiye ji bona pêşvebirina netewekî. Netewek nikare bi başî bi pêşkeve di warên aborî, civakî û siyasî beyî pêşvebirina zimanê xwe. Weha em dikarin bêjin: Ziman bi dewlemendiya xwe ve ji me re pêşveçûna wî milletê ku bi wî tê peyîvandin dide xûyanîkirin. Ger niha ji xwe re li zaravayê kurmancî binêrin, dê emê tê de gelek kêmaniyan bibînin, Ev ji gunehên bav û kalên me bûn. Ger wana xwe di vî warê handa biêşanda bê gotin bû niha zaravayê kurmancî ne di vê rewşa hande ba. Her weha jî rewşa milletê me a aborî, civakî û siyasî wê ne wek a niha ba. Lê mixabin ku zana û şehrezayên me ji nezaniyên xwe, xwe nediêşandin ji bona pêşvebirina zimanê bav û kalên xwe. Lê belê wana xebat dikirin ji bona pêşvebirina zimanên beyaniyan. Gerek ev nede ber çavên me ku hemû zana û şehrezayên me dabûn ser reya xebatkirina pêşvebirina zimanên beyaniyan hineka ji wana li gor karîna xwe kar û xebatên biçûk di vî warî de kirin. Lê tev li wê jî karên wan mezin bûn ji bo pêşvebirina zimên. Wan kesên ji nifşên li dû xwe re, reyeke rast û durûst danîn, da nifşên li dû wan bên xwe bêtir di warê zimên de û pêşvebirina wîna bêşînin. Ji ber vê yeka han berî çend salan hin ji wan ciwanmêrên welatperwer bi hemû hiner û hêzên xwe ve warê pêşvebirina zimên de karkirin.Wana civatên çand pêk anîn, kovar û rojname derxistin. Wan civatan bi kovar û rojnamên xwe ve xebatên mezin ku nayên ji bîrkirin di dîroka pêşvebirina zaravayê kurmancî de li dû xwe hiştin.Îro em dizanin bê çiqasî ji me Kurdan re divê pêşvebirina zimên, da em şiyarbûnê di nava milletê xwe de belavbikin. Em baş dizanin bê çiqasî şiyarbûn ji me Kurdan re divê. Kesek nala me di jêrbûnê de najî. Ji ber vê yeka han pêwestiyeke dîrokî ye di vê dema me de ku em zaravayê xwe bidin bi pêş de. Li ser zana û şeh-

rezayên me ye ku hemû hêz û hinerên xwe di warên pêşvebirina zimên de bi karbînin. Bi vê yeka han, dê emê ji alîkî de zaravayê xwe û pê re jî wêjeyê xwe bidin bi pêş de, ji aliyê din jiyanê ji milletê xwe re bidin naskirin.
Dujminên me, zorkerên ku xêr û bêrên me dibin baş dizanin ku pêşvebirina zimanê me dawiya wana nêzîk dike. Ji ber vê yeka han wana em ji nivîsandinê bêpar kirine. Lê di sedsalên bîstande kes nema dikare reya pêşvebirina zimanê`me li me bigre,gava ku em bixwazin wî bi p§ve bibin.
Pêşvebirina zimanê me,me dighîne azadiyê, serxwebûn û jiyaneke xweştir.

Soro

---

Zanayekî me gotiye:
"Kurdîno ger hûn dixwazin xwe nas bikin, zimanê xwe bixwûnin, ger hûn DİXWAZİN xwe bi XELKê bidin naskirin careke din jî ZİMANê xwe bixwûnin."

---

Mafir mirov tenê carekê dimre, divê ew mirin di reya rastiyê de bi rûmet û meranî be.
Ji bo gihana mirineke hêja û bi rûmet gelek west û xebat divê. Carna bê dijwarî dergehê mirinek holê li pêş hinekan vedibe,heke xwe jê bidin paş bê şik qels û bizdok in.

Osman Sebrî

Derdên Me,rûpel 19

---

Xwendevanên Delal!
Ev helbesta jêr ji bo kovara "Dicle-Firat diyarî bû, lê ji bextê reş ne ev helbesta hate belavkirin û pê re jî kovara "Dicle-Firat nema derket. Karbidestên Enqera kovar gırtin, xwedî, berpirsiyar û nivîskarên wê jî xistin girtîgehên leşkerî!
Ji bo cîanîna daxwaza nivîskarê helbestê û ji wê bêparnehiştina xwendevanên kovara "Dicle-Firat" em niha vê helbesta hêja belav dikine, dê ev wek diyarî were naskirin.

Berpirsiyar

## D İ C L E - F İ R A T

Nizam bû çiqas bê dilê xwe dûrî welêt im
Ji dil û kezeb evîndarê Dîcle- Firat im
Ev çem ji bakur dadikevin wek du rehên jîn
Yek ta Bîrecik, yê dî diçe nav diyarê Zîn
Melê Cezîrî îlhama xwe ji wî çemî distand
Gelek mirarî di peravên Dîcle de civand
Ehmedê Xanî jî serekî ava wî vexwar
Li ber nivîsî serencama Memê birîndar
Feqiyê Teyran, Melê Batu pirr şairên çak
Hespên xwe bezandin di saxa vî çemê çalak
Ger Dîcle bi xwe kaniya zanîn û evîn bû
Firat pêgerra gelek şêrên pençe bi xwûn bû
Di qada rûmet û mêranî her bê hempa bûn
Herdem ji bo her pesnekê hêja û seza bûn
Min hêvî he ye Dîcle-Firat barê me rake
Di warê ziman li rojhelat xelkê me çake
Zimanê me yê paşde mayî çîçkî bide pêş,
Va ye ji bo wî sipasên xwe ez dikim pêşkeş.

Osman Sebrî

## "D U R Û"

Ho reha çepel!.tev girêk û xar
Ji rûçikên çak hemiyan bêpar
Ola te qelsî, bawerî, derew,
Dilê te qirêj bes ziman bedew,
Ramanek ne rast bû rêberê te,
Naşî bibêje tu gotina rast,
Dikarî bêjî:"Re şe rengê mast".
Dikî, dibêjî her tiştê kirêt
Xwe jê didî paş bê şerm û fihêt
Ji bo demekê teye veşartin
Ji te re pirr tişt têne spartin
Lê dawî a rast wek royê tê der
Ew dibî rûreş her serî di ber
Hînga tê zanîn tu çi hesan î
Di durvê mirov ji rengê sa nî

Zûka bigeşe her ji pêş me
Em bêhnteng dibin bi dîtina te
Rûyê te yê çil navên bibînin
Ji ber kirên te tev dilbirîn in
Sed hezar xwelî li nav çavên te
Ji hinde pirrtir para bavê te
Ku li pê xwe hişt kurrekî durû
Bi şermisarî cîhan berda çû.

Osman Sabrî

---

**Bersîva** "G a z i n ji X w ê d ê" Ji Faîq Bucaq re

Xarzê divê zanibî ji Xwedê nabin gazin
Li ser reya gazinan em çi karin bixwazin?
Gazin karê qelsa nin,tu ne qels î dizanim
He ye ku bîra bibî bo çi li te dibanim
Va em werin ser Xwedê,ew Xudayê gişan e,
Bê kir tiştekî nake, tevî xurt e dikane,
Xwedê em jî wek xelkê afirandin jîr û xurt
Xelkên mayî xebitîn pişta xwe dane Yezdan
Me pişta xwe da xebat berî guhazte ezman
Li ezmanan çi he ye? tev valayî û stêr
Bi hêvî û lavayî zikê birçî nebû têr
Cihê Xwedê dilê me em li ezman lêgerrîn
Bi sedsalan her doşbûn,lê destvala vegerîn
Bav û kalên malkambax,ne bawer bûn bi xebat
Reya Rastî nenasîn ji lewre man gêj û mat
Ev bû demek hinekan reya xebat bîrbirin
Serê me yê nizm û mest çîçkî hildan rakirin
Heke ne ji wan bûya rewşa me pirr bê mirês
Nizam heya çi gavê ji bona me dihat keys
Niha dê bême ser te di xebatê tu şeng bû
Di nav dost û hevalan camêr,bi nav û deng bû
Di vê reya rûmet tu jî hinekî westî
Bê dijwarî ma kînga dibît welatperestî?
Di kirên xwe tu mêr bû, bê tirs wekî kalê xwe
Di nav xelkê te hilda serê xalê xalê xwe
Bixebite da bibe rohilat wek rojava
Ez ji te pir dilxweş im, xarzê mala te ava.

Osman Sabrî

Xwendevanên delal!
Ev şîira jor jî diyarîbû bo kovara "Deng". Mixabin ku ev jî ket atara rojnameya "Dicle-Firat". Lê em hêvîdar in ku bi derxistina "Hêviya Welêt" valabûna wê dagrinî.

---

## G o t i n a  W e l a t

Welatê min digote min: birazî
Li nezmê guh bidêre ger dixwazî
Cegerxwûn î, kurrê min tu ji derdan
Silavan zû ji min bighîne Kurdan
Bibêje ez keçik bûm, ta ku bûm pîr
Nedî min xwe wekî vê salê esîr
Serê min bû sipî, pûş û pelax e
Li jêrê min çû nîn e xeyrî ax e
Ji çavên min diçin sed av û sed co
Ji min îdî dikin gazinde zaro
Xerab bûn e ji min sed xan û qûnax
Nema ye bo perîşanan dusê max
Nikarin bêne cem min yek du rêwî
Di bin desta de man e tevde sêwî
Kurrên min pir ji xuşkên xo re pak in
Belê pirsê li dapîra xwe nakin
Cizîr û Şehrezor û Gor û Loran
Hemî qîzê min in pîrê bi qurban
Ciwan in surperî ne serbilind in
Gelek naz û delal û gewr û rind in
Biçûk in pirr şepal in berzewac in
Gelek pak in welakîn bê rewac in
Ji te hêvî dikim ey xortê Kurdî
Tu van xuşkên ciwan, hêja neberdî
Ji hersêkan tu kîjanê dixwazî
Tu nasnakî ji bil navê mecazî
Qelen, yektî û xwûn û xwendega ye
Tu kîjanê bibî bo te seza ye
Ne pir ma ye kurê min ey Cegerxwûn
Hûnê serbest bibin mizgîn û mizgîn...

C e g e r x w û n
"Sewra Azadî" dîwan 2, rûpel 8

# N ê ç î r

Dîroka nêçîrê jî wek a merovan gelekî kevn e û bi wê re destpêdike. Gava ku merov hatin afirandin, li hember xwe jiyanek dijwar dîtin: Birçîbûn, sar-germ û cenawirên çolê. Jiber her tiştî ewna hewceyê xwarin û kincan bûn, divyabû ku xwe li cenawerên çolê jî piparêzin. Jiber ku bê destlepiyê tiştekî wan tunne bû, kevir ji xwe re kirin çek û bi wan kevirana. cenawer dikuştin. Goştên wan dixwarin û çêrmên wan jî ji xwe re dikirin serseke.

Demek hat ku ew kevirana bi hevdin dan, sûn û tûj kirin. Dîroka nêçîrê jî di wê demê de bi rengekî zanistî destpêkir. Heya ku baqir dûre jî qilê hate dîtin, nêçîr bi vî tonî dihate kirin. Lê belê gava ku bi tevlehevkirina bêqir û qilê tûnc pêkanîn û dûre jî hesin hate dîtin, merova çekên baştir çêkirin û bi gengazî karîn xwe biparêzin û nêçîrê jî bikin. Di vê demê de heya ku merov hînî çandiniyê bûn û agir jî dîtin, jiyana wan di nêçîrvaniyê de derbas bû. Gava ku dest bi çandiniyê bû, hinek cenawerên çolê (ên hov) jî kedî kirin. Weke hûn jî dizanin, çêkirina gundan û bajartî jî di vê demê de dest pê dike ku nema merov wê azadiya xwe a ku bi xweser dibîne! Hevdin nekişandin û li dijî hevdin xebat kirin jî dest pê dike. Songî jî li ber çavan e ku ên pêt,bi hêz, ên qels kirin bin destên xwe û dema Derebegan û Kolîdariyê jî bi vî awayî dest pê dike. Jiber ku hikmê zînatê bi serket, nêçîr jî di destên wana de ma. Ên dewlemend, car li caran, bo keyfê diçin nêçîrê û bi kuştina cenawêr dilê xwe xweş dikirin û hewniya xwe pê tanîn. Bê şik xûya ye ku di vê demê de nêçîrê giringiya xwe wenda kir û dîroka wê jî heya demên nêzîk bi vî awayî dom kir. Di vî nîrê ku em tê de dijîn de: Nêçîr dîsa li keyfê derket û bû piyek li dewlemendiya welatan. Gelek welat he nin ku bazirganiya xwe a pir dane ser nêçîrvaniyê.

Bi vê gîezgeha jor bawer im ku minê karibe dîroka nêçîrê a gelemper bi kurtî dabe ber çavan. Lê niha dixwazim hinekî li a tevayî derkevim û tenê li ser nêçîrê û nêçîrvanên me Kurdan binivîsim. Ka nêçîrvaniya me çi havil da ye!

A rast û li ber çavan ew e ku nêçîvanên me hîn di ciyê xwe de dijmêrine û pêşveçûnê li wir berde her ku diçê bi paşve diçine. Jiber ku nêçîr bo me Kurdan hîn di dema keyfê de dijî û wek nexweşiyekê ketiye laşên me. Gava ku dema nêçîrê tê û disekine, nêçîrvanên me hemû kar û barên xwe li ser piştê dihêlin û wek ferzên nimêjê wê pêwestiya xwe tînin cî!! A ku jê bêtir jî dema berê de ên dewlemend diçûn nêçîrê, mixabin ku îro

belengazên me jî xwe jê bêpar nehiştine!!
Xwendevanên delal, weke hûn dizanin gelek rengên nêçîrê he nin. Di nêçîra masiyan de bigre heya ên şêran. Jiber vê yeka han ne hewce ye ku serê we bi van jî biêşînim. Lê di nav me Kurdan de nêçîra kewan gelekî bi deng e. Lewre ez rast dibînim ku hinekî jî li ser wê bisekinim. Gelo dixwazim pirsekê li we bikim, ka heya niha kesî li we serê xwe pêre êşandiye ku ka bo çi em Kurd ewqas li nêçîra kewan hezdikînî? Ez bi xwe di navbera nêçîrvanên me û kewan de, di aliyê gelnasiyê de, wekheviyekê dibînim. Çawa ku kew bi dengê xwe kewên din li ber şefaqê di xewa wan a şêrîn de radike, dixapîne û tîne ber kozikê an jî bi torên nêçîrvên dêxîne û "bi destên xwe pergala xwe bela dike", dibe xenîm gelê xwe!. Ger ku hûn dîroka me Kurdan bibînin û bînin ber çavên xwe û mîna şerîtek sînemê lê binêrin, hûnê bibînin ku Kurdan jî di dîroka xwe de her dem li gelê xwe xistine û bi aliyê neyarên xwe girtine, bûn e namûskeşê wanan!!. Îro di sedsalên bîstan de dîsa em dibînine ku gelek xiniz,noker û caşik ji me Kurdan dertêne. Berê jî gotin e "Ger ku destiyê bivir ne ji darê bûya, nedikarî darê bibire". Mixabin ku em Kurd jî bo gelê xwe him bivir û him jî kurmê darê nin!!.
Xwendevanên hêja weke ku hûn dibînin, birîna me Kurdan bi wekheviyê, xwendinê, tevger û li hev hezkirinek germ dê bête kewandin.

H.Reşo

---

## R e ş bo A z a d î

Gazî dikim, bi qêrîn,
Êdî xoybe ji me re.
Şoreş dibê li jêrîn,
Bes e, evya ji te re.

Nexweş im bo azadî
Dereng mekev, bike lez.
Goştim helî, man hestî,
Em ji te re bûn e pez.

Me bidoş, şîr bike gol,
Dawet he ye, bo Kurdan.
Çêrmên me jî bike dol,
Govend bigre, bi xortan.

Navên me girêdan reş,
Bûn, Hemreş-Reşo û Reşxan!
Sebrim nema, êdî bes!
Nazîn mebe Ey "Sultan"!!..

H.Reşo

---

## F e d e k a r î

Bi çav min ji fedekariyê re sê pêpiling he nin ku ev in:

1- Di reya daxwaz, raman an baweriyê de canê xwe dayîn. Vê fedekariyê gelek camêr dikin, ne ewçend dijwar û mezin e.

2- Di wan reyan yekê de bi awakî mintezem bê west û kiz bûn ji mal û dema xwe hinek hergav dayîn. Ev celeb camêr ji ên berê pirr hindiktir in ku mirov dikare bêje ew bi heqî camêr in.

3- Di wan reyan yekê de bi dilxweşî sitem û belengazî qebûl kirin û dev ji ramana xwe bernedan. Ev celeb kes bê şik boke û mêrxas in, ku di cîhanê de hîmê hemî kirên mezin, evên paşin datînin.

Osman Sabrî
"Derdên me",rûpel 27

---

Di sala 1962 de Dr.Bedirxan ji rojnama "Morgenpost" re got:
"Es ist ein schwerer Beruf, Kurde zu sein, aber wir wollen nicht anderes sein als Kurden. Das ist alles."
Ji Kurd bûnê dijwartir karek nîne, lê em bê wê jî tiştekî din naxwazin. Bi tenê ev e.

---

## Ş a m   Ş e k i r e
## W e l a t   Ş ê r î n t i r e

Welatê min tubûy bûka cihanî
Hemî bax û bihişk û mêrg û kanî
Şepal û şeng û şox û naz û gewr î
Gelek şêrîn û rind û pir ciwan î

Serî taca Seladdînê Kurdî
Enî roj e, di birca asîmanî
Du birhên te kevanê Rịstemê Zal
Du zulfên te ji tîrên qehremanî
Riwê te agirê Zerdeşt û Mezdik
Ji te hêstir şeraba Kamîranî
Du çavên te wekî deryayê Hurmiz
Kepû elmas e karê mûş û Wanî
Du lêvên te kitêba Hecî Qadir
Zimanê te ji benda şêxê Xanî
Çena te gohê Cûd û Şax û Hebler
Qirik eywan û teqa kesrewanî
Di sînga te kitêba Zendewîsta
Memik ferfûr e tê de neqşê Manî
Du destên te tixubên Tirk û îran
Hero ceng e bi tîrên zerveşanî
Ji sînga te bi jêr de gelyê Laleş
Ziyaretgah e bo me her zemanî
Bi nîşan û bi nan û xwîn rijandin
Me dest girt û qelen da û tu anî
Ser û pa zend û bazin tev bi hinne
Hemî sor in ji rengê erxewanî
Bi te em şa nebûn ev bû sed sal
Ji me dengê tivinga çûye banî
Bira û law û bav û ap û pismam
Li ser te hev di kuştin Pehlewanî
Ji Loran ta bi Zazan tev bi xençer
Dihatin hev li meydanê beranî
Bi talan û bi kuştin,hem bi sotin
Me konê şer li ser sînga te danî
Emîr û begler û paşa û axa
Kirin wêran sera û birc û xanî
Li alîkî sedayê xewsê sanî
Hamî bûn e mirûd û şêx û sofî
Bihişt î ne çikin nav û nîşanî
Li axur radizin lê şêx diçî jor
Berî nîvro ji banî tê giranî
Ser û pa tev dikî gulav û ember
Dibê nûr e kero ma tu çi zanî?!

Bi van xapan dixwarin xwarinên xweş
Wekî şêx û melayên vî zemanî
Du derdên me hebûn dijwar û xeddar
Xizanî yek, ewê dî her nezanî
Weke şêr û pilingan em diçin hev
Penîr rovî li meydanê hilanî
Me ew rojên ciwanî tev bi derdan
Bi zîvarî, belengazî, şivanî
Herê bûka pepûkê jar û mestê
Li ser sînga te zava man biyanî
Te reş da ye serê xwe ber li ser me
Li te rokê dibî pîroz kitanî
Cegerxwîn e kurê te her dinalî
Ji ber jana nezanî û xizanî...

C e g e r x w î n

"Sewra Azadî",dîwan 2,rûpel 42

---

Xwendevanên delal!
Ev helbesta jêrî diyarî bû bo hêviya me a bilind ku di Turkiyê de bi navê "Kovara Deng" vêketibû, lê emrê wê kurt bû. Her weha jî ew di dilê me de bi germî diliye û ev jîna ê herhe be jî.

K o v a r a   D e n g

Ew Kurd bûn netewê bê deng,
Têkoşîna wan bi zanistî.
Her yek ji wana mêrê bi şeng,
Îro ê hişyar in bi rastî.

Belav be wêjeyî û bi reng,
Veke guhên me yên qilêrî.
"Dicle-Firat" û "Kovara Deng"
Hûn bijîn bi zimanê kurdî!

H. R e ş o

---

Z i m a n  di  J î n a  M i l e t a n  de

Ziman, ew tiştê ku mirov ji dehban vediqetîne. Mirov bi ziman

serwextî derd, daxwaz û kamên hev dibe. Dîsa bi zimanê ku mirov havila dîroka xwe ji wendabûnê diparêze û kit kit dinivîse û ji çêlî û neviyên xwe re dihêle. Warê bîrbirina milletekî dîsa ji kitêbên ku bi zimanê wî hatine nivîsandin xuya dike.Ji lewre zanan gotine ku: "Bihayê gel, ji pêşveçûna zimanê wî dixwewîne. Pêşveçûna zimanê milletekî, nşana xurtî û rûmeta wî ye".

Dema em Kurd van gotinan ji rûmet û serbilindiyê re bikin pîvan û li halê zimanê xwe hûrbin, dê bizanin ku em çikas bi şûn de mane.

Îro di cîhanê de tu gel bi qasî gelê Kurd ji zimanê xwe re bîgane nemane. Mana vê, ne ew e ku di gelê Kurd de kesên zana ranebûne. Lê mixabin ku hemî zanayên Kurd, ji xeynî çend camêrên bi rûmet, bi zimanên biyaniyan xwendine û bi wan zimanan kitêb çêkirine û emrê xwe di xizmeta wan zimanan de borandine.Dema di Kurdistanê de xwendin û nivîsandin ne bi zimanê kurdî bûye,Kurdan nexwendine û qîma xwe bi zimanên biyanî ne anîne û nezan mane.

Di pêşin de bi zimanê kurdî nexwendin û pê kitêb çênekirin zaravayên kurdî gelekî ji hev bi dûrxistine, ku îro ji yekitiya wan zaravan re xebatine pirr mezin û dijwar divê. Di vê yeka han de bi qasî em xisirîne kolîdarên me ewçend kar kirine. Jiber ku nedixwestin em tucaran serê xwe li ber wan hildin û doza azadî û serxwebûna xwe bikin, zimanê xwe bi me dan xwendin û reya xwendina zimanê me li pêş me bi hezar awayî dadane.Îro jî bi zora ço nahêlin ku em bi zimanê xwe di dibistanan de bixwînin.

Dema em vegerin dewrên berî Islamiyetê, dê bibînin ku gelê Kurd zimanê xwe bi tîpên kurdî dinivîsand û yekitiya çak di navbera zaravayên wî de hebû. Lê îro piştî hezar û pêncsed sal, ji xeynî çend nivîsarên ku li dora Sileymanî û Şehrezorê di nav xirbeyên kevn de hatine dîtin, şopek ji wî zimanê xurt û dewlemend û wan tîpên delal û hêja nemaye.

Gelên kolîdarên ku ji hîngêve ji bindestmayîna Kurdan destkewtî bi gelek wesîle nehiştine ku Kurd bi zimanê xwe bixwîne. Heya mikûn bûye xwestine wan ji ramana welatî bidûrxin û bi ziman û ramanên xwe wan têxin nav qewmiyetên xwe. Di vî warî de rast û derew çi hatiye bîra wan bê fihêt kirine, û ya kirêttir pirrên van kirana bi navê olê bû ne.

Ji şopên vê tevdîra bêbav, yek ku bi ramanek olewerî navên hemî Kurdan dane guharandin, di bin navên îslaman de navên Ereb û Cihuyan li wan kirine. Ji lewre îro di nav gelê Kurd de sed hezar navî navekî kurdî nayête dîtin!.

Dema vê paşiyê Tirkan xwest Kurdên di bin destê xwe de ji kurdîtiyê bi dûrxin û di nav xwe de wenda kin, berî her tiştî navên malbatên wan guhartin. Ji wê rojê de min şopa navan di jîna miletan de bîrbir û navê kurrê xwe yê heyşt salî guharte kurdî.

Ji wê bi şûnde min hemî zarrokên xwe bi navên kurdî navandin û ev yeka han ji hemî dost û hevalan hêvî kir.Îro ez çiqas dilxweş û serbilind dibim gava pirraniya Kurdên xwende,bîrbir û bi rûmet, navên kurdî li zarrokên xwe dikin. Bi çav min ji bo wenda nebûna Kurdan ev yek gava pêşîn e.

Îro çiqas ku kolîdarên me nahêlin em Kurd zimanê xwe di dibistanan de bixwînin kî, şewq û hezkirina ku ji bo hînbûna ziman ji dilên xortên me ên welatparêz diyare hêviya mirov gelekî xurt dike. He ye ku ev hal serekî bajo û nehêlin ku em zimanê xwe di dibistanan de bidin xwendin, lê ronahiya di çavên xortên Kurd de ji min re hêviyek mezin dide ku her kes ji wan xwendin û nivîsandina zimanê xwe baş hîn bibe û bi hin birayên xwe ên Kurd jî bide hînkirin. Ji bo îro ya ku me ji wendabûnê bifiltîne hînbûna xwendin û nivîsandinê bi zarê yê şêrîn û delal e.

Osman S a b r î

"Derdên me" rûpel 6

---

## S ê r o û p î v a z

Dibêjin ku carekê du zilam birayê hev bûn. Navê yekî Sêro û yê ê dî Pîvaz bû. Pîvaz gote Sêro:

- Bira, min divêt ez biçim xulamiyê. Tu çi dibêjî?

Sêro got:

- Tu bi dilê xwe yî, lê tu bi ya min bikî, naçî, tu nikarî xulamiyê bikî. Tebîetê te nexweş e.

Pîvaz got:

- Nabit, ezê biçim!

Sêro got:

- Bila be, tu bi dilê xwe yî.

Sibehî Pîvaz rabû, çû, bû mêvanê keşekî. Keşe gotê:

- Pîvaz, tu li çi digerihî?

Pîvaz got:
- Ez ji bo xwe li xulamî digerihim.
Keşe Got:
- Were, bibe xulamê min!
Pîvaz got:
- Qenc e, sala min bi çi ye?
Keşe got:
- Qewlê min û tu ne bi sala ye, belkî qewlê min û te heza pepûk bixwînî, ezê hevqas bidim te. Bi wî şertê ku heçî ji min û te biênirît, emê zolekî çerm ji pişta stoyê wî rakin heta ser dûka wî.
Pîvaz got:
- Qenc e.
Sibehî rabûn ji xew. Keşe got Pîvaz:
- Here cot, seyê min li kû rûnişt, li wê derê cot bike, êvarê barek darên bêtovil digel xwe bîne! Ezê taştiya te rêkim.
Dema Pîvaz çû çolê, seyê Keşe çû, geriha, li ser berekî mexel hat. Pîvaz gayê xwe girêda, li ser tatê cot kir. Dema taştê, Keşe taştê da keşa xwe û gotê:
- Bêje Pîvaz, bila nan neşkênit, tokê mast jî neşkênit, fehît nekê têr bixwit. Êvarê, dema mal hat, bila ga li derî de neêxit mal de, dîwar jî xirab nekê.
Keça Keşe çû nik Pîvaz, herwekî bavê wê gotê, ewê jî welê got Pîvaz. Pîvaz enirî, nan nexwar, ma heta êvarê. Êvarê hat, got Keşe:
- Mala te ne ava, ezê biçim mala xwe!
Keşe gotê:
- Ma tu enirî?
Pîvaz Got:
- Erê, ez enirîm!
Keşe got Pîvaz:
- Me qewlê xwe kiriye, ezê zolekî çerm ji pişta te vekim.
Keşe rabû, zolekî çerm ji pişta Pîvaz vekir. Pîvaz tevlî wê xwînê çû nik Sêro.
Sêro got:
- Bira te li ser min lazim kir, ez biçim heyfa te.
Sibehî Sêro rabû, berê xwe da mala Keşe, bû mêhvanê wî. Sêro bû xulamê Keşe. Keşe tiştên gotî Pîvaz welê gote Sêro jî. Sêro jî qebûl kirin.
Sibehî Sêro rabû, çû cot. Se jî bi xwe re bir. Se dîsa çû, li

ser tehteke mexel hat. Sêro dest avêt berekî, li bin guhê seyê Keşe da, li erdekî xweş cot kir.
Dema taştê keça Keşê taştiya Sêro anî,wek gotî Pîvaz, welê got Sêro jî.
Sêro got:
- Qenc e!
Sêro rabû, ji nava nan xwar, dora wî neşkand. Binê dîzikê qul kir, tokê wî neşkand. Dema têr xwar, binê keçikê jî qul kir. Keçik vegerîha, got bavê xwe.
Dema bû êvar, Sêro rabû, Nîr û halet şikandin, li kerê kirin,anîn mal. Dema Sêro hat pişta xanî, her du ga jî serjêkirin, qet qet kirin li kulekê re avêtin û hat nik Keşe.
Keşe got:
- Xwedê qeweta te bidit, kanê seyê min?
Sêro got:
- Min seyê te kuşt, min keça te jî xirab kir, min nîr û helat jî şikênandin, min gayên te jî serjê kirin, qet qet kirin, li kulekê re avêtin. Ma tu enirî?
Keşe got:
- Ne xêr, ez ne enirîm!
Keşe û jina xwe li hev şêwirîn, gotin:
- Emê îro kadê ji xwe re çêkî, esîdekê çêkî, emê birevin, Sêro bihîlî xew de.
Pêkanîna xwe kirin, kada xwe, esîda xwe kirin çiwalekî û danîn wê derê. Dema Keşe û jina xwe nivistin, Sêro rabû, tiştên ha ji çiwal derêxistin û xwe kir çiwêl de.Berî sibehê Keşe rabû, çiwal hilgirt, jina wî kete pêş, çûn. Nîzîkî sibehê mîza Sêro hat, di çiwêl de mîst, Keşe got jina xwe:
- Keşê, esîda te çiqas têr-dihin e!
Jinikê got:
- Wê bima ji Sêro re, min hemî êxist esîdê.
Dema çûn nîzîkî gundekî, seh hatin wa. Keşe got jina xwe:
- Xwezî Sêro li hir bûya, da seh ji me vekirina.
Sêro got:
- Mamê Keşe, min dane ezê ji we se vekim. Keşe Sêro danî. Dîsa Keşe û jina xwe li hev şêwirîn ko "emê biçî, şev li ser pirê razî." Jinikê got Keşe:
- Tu li nav de razê, ezê li rexê te ê rastê razim, bila Sêro li rexê çepê razê. Dema bibit nîvê şevê, emê rabin, Sêro bavêjin avê, jê rahet bibin!

Dema bû nîvê şevê, Sêro çû cihê Keşê, Keşe anî cihê xwe, demekê ma û bakir jinikê:

- Rabe, em Sêro bavêjin avê!

Jinik rabû, destên Keşe girtin, Sêro lingên wî girtin, avêtin avê. Keşe li avê de çû. Sêro jina Keşe jî ji bo xwe anî. Heyfa birayê xwe jî ji erdê rakir.

Çîrok çû deştê, dê û bavê min çûn bihûştê.

R o n a h î
18 (1943),2-3


---

Xwendevanên delal,

Wek ku hûn jî dibînin ev çîrok bîst salan li ber vê hatiye nivîsandin. Ger hûn rind bala xwe bidinê, hûnê bibînin ku zimanê me gelekî pêşve çû ye û paqijtir jî dibê.

H. R e ş o

# HÊVIYA WELÊT



Dengê Komeley Xwêndikaranî Kurd le Ewropa

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

Sal : 1
Jimar : 2

Gulan 1964

# Erke Pîrozekanî Hêviya Welêt

Kamal Fuad
Berlin, 21.5.1964

Brayanî berêz: Berêweberanî govarî Hêviya Welêt î xoşewîst!
Silawêkî germî têkoşantan pêşkeş bê,
Jimarey yekemî govareketanim xwêndewe, zorim pê xoş bû, çûnke be rastî kelênekî gewrey bo pir kirdînewe, nek tenha bo êmey xwendikaranî Kurd le Ewropa belkû bo hemû ew kesaney ke hez be fêrbûnî zimanî Kurdî eken. Hêviya Welêt be şêweyekî taybetî kelk û sûdekî zorî heye bo bira Kurdekanî Sûriya w Turkiyaman ke hemû rêgayekî aşkirayan lê bestirawe bo fêrbûnî zimanekeyan û geşe pê kirdinî. Raste Hêviya Welêt natwanêt ew kelêne gewreye pir bikatewe ke le encamî nebûnî mafî siyasî w netewayetî Kurdewe hatuwe lewaneş mafî xwêndin û nûsîn be zimanî Kurdî ke emro le hemû beşe dagîrkirawekanî wilatî xoşewîstman Kurdistan berbest kirawe. Belam hîç gumanî tiya niye derçûnî Hêviya Welêt kelk û sûdêkî zorî heye be taybetî le rojêkî wada ke netewekeman nek tenya bê beşe le hemû mafêkî siyasî w dêmokratî e netewayetî w mirovayetî belkû berengarî hêrişêkî narewaw dirindane ebê le beşêkî wilatekeman wate le Kurdistanî Iraq ke gelî Kurdman be pileyekî sextî têkoşanya tê eperê le pênawî hênane dî mafe netewayetî w dêmokratêkanî le otonomî bo Kurdistan û rijîmekî dêmokratî perlemanî bo Iraq. Êstaş paş dû sal û nîw bombarduman û kuştin û birîn û girtin û giranî w azar û çewsanewe w paş ewey sê mang ziyatir tê perî be ser şerr westandina le nêwanî supay Iraqî w şoreşgêranî Kurdistan ta êsta hîç mafêk be gelekeman nedrawe w hikûmetî Iraq nek her tenya le belênekanî xoy peşîman ebêtewe w bes belkû be şêweyekî zor namerdane hewl eda bo towî nakokî çandin le naw serkirdekanî gelî Karda.
Le Sûriya hemû rojêk çetekanî Baath hêriş ebene ser gelî Kurdman û be deyan kesyan lê egrin û lê birindar eken û lê ekujin bê ewey hîç gunahêkyan hebê belkû tenya leber ewey Kurdin û eyanewê be Kurdî bijîn û be Kurdî bimrin.
Le Turkiya girtin û lêdanî gelî Kurd her berdewame w ta êsta gelê Kurdî bê guneh le bendîxanekanî Enqere w Estemûl da mawnewe w azar û siza eçêjin.
Le Êranîş sereray nebûnî hîç mafêkî netewayetî w zanyarî Kurd wek hemû beşekanî key Kurdistan, taqe rojnameyekî Kurdî ke le Taran le layen hikûmetewe be nawî (Kurdistan) ewe dereçû daxira. Sereray ewe maweyeke hikûmetî Êran destî kirdowe be girtinî Kurd.

Ca le katêkî wada ke gelî Kurdman le hemû beşekanî Kurdistan le halêkî wa naxoş da ejî sereray eweş berengarî hêrişî nareway duşminanî ebê çend erkêkî gewre w pîroz ekewête ser şanî govarî Hêviya Welêt:

1- Erkî geyandinî dengî beşekanî Kurdistan be yektirî w be xwêndikaranî Kurd le Ewropa.

2- Erkî geşe pêdan û pêşxistinî ziman û edebî Kurdî w nizîkkirdinewey diyalêkte ciyawazekanî zimanekeman.

3- Erkî rûnkirdinewey meseley niştimanîman ke yekêke le amance pîrozekanî komeley xoşewîstman.

Komîtey berêweberî giştî komele le katêka silawî germ û pîrozbayî pêşkeş be govarî Hêviya Welêt û destey nûseranî ekat, amadeyî xoy pêşan edat her wek le seretawe pîşanî da bo hemû yarmetî w komekêk be gwêrey tuwaney pêşkeş bikat bo derkirdinî govareke be rêk û pêkî w pêşxistinî.

Govarî Hêviya Welêt ke be taybetî be diyalêktî kirmancî enûsê pê wîste car û barîş be soranî witar bilaw bikatewe ta zorbey bira Kurdekenman le Êran û Iraq ke be dialêktî soranî edwên le xwêndinewey govareke bê beş nebin û bitwanin witarî xoyanî tiya bilaw bikenewe.

Le dwayî da xoşî w serkewtintan hîwamane w ûmêdî pşkewtinî govaretan ekeyin û hemîşe bextiyarîtan awatmane.

---

Agir be nextê aw kujayewe
Gul be bay payîz serî nayewe
Belam jilemoy têkoşanî Kurd
Dway hezaran aw helgîrsayewe
Gulale sûrey baxî a z a d î
Dway xezanî zerd her geşayewe

Ewî mêjoy Kurd bixwênêtewe
Elqey jincîrey bihonêtewe
Tê ega hergiz ser nanêtewe
Hîç hêzêk niye biytwênêtewe
Ew çerxe nema dirêxtî regez
Rîşey der hênin hî êmey nebez..

Kameran Silêmanî

# P î r o z î

Hêviya Welêt, çi navekî xweş, ji bo kovareke nû ku bi zarê kurmancî li Ewropa bi destên xortên Kurd derdikeve.

Derxistina vê kovarê, bi vî navê xweş û şîrîn ji bo xortên me yên li Ewropa lêhatineke gelekî hêja ye. Çawan ku xortên me yên li Ewropa di vê kovara han de hêviya welatê xwe dibînin, xelkên welêt jî di wan xortan de hêviya gelê xwe dibînin.

Kovara me ya nû îro hêviya welat e,
Armanca weya Serbestî, Azadî, Felat e.
Dê wek royê ronak bike dinya me ya tarî,
Bi peyv û nivîsarên hêja wekî mirarî.
Dilê meyî kul,rûyê bêmad her dê bike geş,
Li pêş me veke reya xebateke gelek xweş.
Cihanê ji bo me bike ronak û bihuştîn,
Zimanê me yê paşvemayî zar bike zengîn.
Pêşkeş dikim sipasên xwe û dost û hevalan,
Bo xortên ku di vî warî de wekî şepalan.
Xebatê bikin,pê biwestin ew bi şev û roj,
Bêşik ew in welatparêzên hêja û dilsoz.
Di vê reya han gelê me dê zûka şiyarbe,
Wê hînga hezar xwelî li nav çavên neyarbe.

Hezar carî pîroz kovara Hêviya Welêt, her bijîn xortên ku pê rabûne.

Osman Sabrî

---

Xwendevanên delal û hêja!

Em li we hçeviya lêbihurandinê dikin ji bo kêmanî û şaşbûnên me ên hûn dibînin. Ji me re rexne û pêşneyarên xwe bişînin ji bo başkirina kovarê û pêşxistina wêna. Her weha jî ji me re gotaran binivisînin da em ji we re wan belav bikin.

Bi van kirên we, bêgotin e, dê emê gelekî dilşa bibin. Heta ji me bê emê karbikin ji bo bi cî anîna daxwazên we, jiber kovara me kovara her welatperwerekî Kurd e û armanca wêna nala armanca gelê Kurd a mezin: Azadî, Serxwebûn, Jîneke xweştir û Dostaniya milletê Kurd bi tevaya milleten cîhanê re.

# Bi Hatina C ê j n a N e w r o z

Xwendevanên delal û hêja!

Bi hatina Cêjna Newroz, cêjna miiletê Kurd a mezin, kovara Hêviya Welêt xwendevanên xwe û milletê Kurd pîroz dike.

Newroz, weke ku em dizanin bûyîneke mezin e di dîroka welat û milletê me de. Newroz tîne bîra me Kurdan bê çawan milletê me şoreş kir dijî xwînmijên xwe û ew ji ser textê keyatiyê avêtin. Millet azad û serbest ji zor û sitemê dest bi jîneke xweştir kir.

Ev bûyîna mezin di dîroka welat û milletê me, ji me re xweş dide xûyanîkirin bê çi dermanê hilanîna zor, sitem, xwûnmijî û koletiya îro ku welatê me û milletê me tê de dijî. Xwûnmijên, hovên û faşîştên Ereb, Tirk û Ecem wana em ji hemû mafên mirovan bêpar kirine. Li valî û walî em dibînin bê çawan Tirkan bi hovitî hemû şoreşên miletê me vemirandin û heta îro her û her dixwazin Kurdan ji dunya biqelînin.

Li îranê, Eceman jî her xwestiye Kurdan ji xwe re bindest, reben, perîşan û nexweş bihêlin.

Li Kurdistana Nîvro va ji du sal û nîvan de milletê me şoreşa xwe dike ji bo parastina hebûna xwe ji destên Erebên hov, xwûnmêj û faşîst ên bi hovitî dixwazin milletê me wêran bikin. Ew hovana bi sedan, bi hezaran Zarok, pîr, kal, jin û mêr dikujin dişewitînin jiber ew Kurd hatine dinê û dixwazin Kurd jî bimînin. Lê Kurd natewe, serê xwe li ber hovên Ereban hew datîne jiber ew li ber hebûna xwe dide.

Li Suriyê bi sedan ji welatperwerên Kurd di tariyên zindanan de dijîn. Li wir jî Hovên faşîstên Ereban li Kurdan bi hovitî dêxin. Ew hovana weha bawerdikin ku bi van kirên xwe ên xwûnmêjî ê bikaribin berê miletê me ji doza mafên wî ên millî bidin alî û wî her û her ji xwe re bihêlin kole. Bi girtina ji sedan ji xortên Kurd, bi lêxistina jinên Kurd û pîskirina wan, hov û faşîst nagihên miradê xwe. Kurd roj bi roj xurttir dibe û hovên Ereban ber bi goristanê de diçin.

Em bi hatina Cêjna Newroz ji xwendevanên xwe re vê xweşxuwana O.Sebrî diyarî dikin.

## N E W R O Z

Newroz çiqas delal î
Her dem û gav di balî
Her sal di vê çaxê de
Bi kêf û lîz û govend
Gul û kulîlk û çîçek
Çem û cobar tijî tên
Berf li çiyan dihele
Wekî çînên reşbelek
Rûyê erdê ji rûkî
Nêrgiz,gupik û çîçek
Di van rojên şîrîn de
Çi keç û xort û mendal
Dikin cêjin sê rojan
Derdikevin ji malan
Ew hildigrin digel xwe
Hinek bi saz û sowet
Cih cih li hev dicivin
Hinek ji wan genimgûn
Hinekên wan çavreşîn
Gihêştina destên wan
Li ber çem û çîmenan
Dirrevin û dikenin
Li ser gul çîçekan
Her dadinin radibin
Dema ji wan diyarbin
Dibe pîrkepîka wan
Dawî li hev dibanin
Hinek dibên dîlokan
Bisk û zilfên zeriyan
Li ser dêm û rûyên gewr
Dilê xortan ji evîn
Bi nêhrîna zeriyan
Kal û pîrên qermiçî
Demên borî dibîrin
Lê çi fêde nayê dest
Wekî gula çilmisî
Dilê xwe ê perritî
Wê birîna bê derman
Dijwariyek mezin e

vedikujînî derdan ,
tu yî cêjna me Kurdan,
bîst û yekê avdarê
me dighînî biharê
dibişkivin di baxan
heya perav û saxan
bes dimînin belekî
dilgeş dikin gelekî
giya dertê kesk û şîn
ji her alî didin bîn
Welatê Kurd ser û bin
kal û pîr û bûk û jin
bi xweşî û ken û hang
bi xirroşme qîr û bang
nan û dan û şîranî
hinek bi ser giranî
keçên xweşik û dîlber
hinek jê çûrr gulîzer
kezî dirêj gewr û boz
divê gelek daw û doz
di nava bax û bustan
cîhan dibe gulistan
ew surperî weke hing
têk re dikin vingeving
xortên çeleng û şepal
didin çiman wek xezal
vedigerin çend bi çend
dibe dîlan û govend
ji dûzanê bi dertên
dipengizin terrin tên
tijî dibe dike coş
tev dinin gêj û serxoş
ew her didin keseran
dixwazînin dîlberan
emrê çûyî carek din
belkê wê dikevin bin
bi hezrîngan dax dikin
bi xeyalan sax dikin
qelsiya xwe bîrbirin

Bizan gelek kirêt e pirr jê xweştir e mirin
Hersê rojên cêjna xwe derbas dikin bi başî
Tev kêf û saz û sowet reqs û dîlan û xweşî
Divya bû tiştkî bêjim çend gotinan di Newroz
Zanîna min hinde bû gelo cêjna we pîroz.

Şam,21.3.1957

---

## Bîrweriya Cêjna Newrozê

Ji kevnarê de, ji Kurdan re bû ye adet ku her sal di rojên Newrozê de, mêr û jin, kal û ciwan cilên xwe yên nuh wergin, derkevin çol û banan, bi şadî û kêfxweşî, bi govend û dîlan rojên xwe biqedînin. Şevê bi pozê çiyayên bilind agiran pêxînin, bi gundan, bi bajaran, bi her deverê mirovên aqilmend civînan pêkbînin li dor serborî û serpêhatiyên xwe biaxivin, kar û zirarên xwe di ber çavan re bibîrînin, bi vî awayî dîroka jîna milletê xwe di navbera Newroza berê û Newroza nuh de bi bîrbînin û jibo xebateke çaktir ji pêşende re xwe likarxin.

Jiber ku milletên din destê dijminê dilreş de ma ye, her gav rê nakeve wî ku bi serbestî bîrweriya cêjna xwe a Newrozê vejîne û şadimaniya xwe eşkere bike. Sal nîne ku pirraniya milletê me bi dizî li çolan an di kûraniya zindanan de rojên cêjnê neqedînin. Va ye em dibînin çawan milletê me li Sûriyê ji bo vejandina bîrweriya vê cêjna pîroz bi destên hikumetê tête qelandin û êşandin. Holê bi vî awayî ne tenê li Sûriyê, lê belê li herçar perçên Kurdistanê bi destê dijminê hov û xwûnxwar ve milletê me tête êşandin û sotin.

Ji Newroza parde milletê me ji destên dijminê xwûnmêj zilm û zînatên rengareng dîtiye!.. Li Kurdistana Îranê, Turkiyê û Sûriyê bi sedan xebatkarên Kurd di binê zîndanan de cih girtine û bi sedan ji wan dev ji malên xwe berdane li çol û banan jîneke tehl û dijwar diqedînin. Lê belê li Kurdistana Îraqê wî şerê giran ku dijminê hov û faşîst ji du sal û nîvan de bi ser milletê Kurd de girtiye dengê wî di herçar koşeyên cihanê ve werbûye. Di vî şerê xwûnavî de bi hezaran mal hatine şewitandin, bi hezaran mêr, jin pîr û zarok bi agirê tang û top û bombên napalm hatine sotin û qelandin. Lê digel vî qasî jî tevgera rizgariya Kurd a millî di zikhev de ji Newroza par û virde bi gavên fireh ber bi pêşve çûye, nemaze di her du perçeyên Kurdistana Îraqê û Sûriyê de. Her kes vê pêşveçûnê bi çav dibînê. Va ye nşanên serkewtina Şoreşa

pîroz li Iraqê bi xurtî xwe hildavêjin der û tevgera rizgariya Kurd li Sûriyê jî roj bi roj bilindtir dibê.
Di vî warî de rastiyek dikeve ber çavên me ku çi perçeyê Kurdistan ku tê de lîwana tevgerê di destên partiyên şoreşîn de ye li wir tevger gihaştiye warekî bilind û pêşveçûyî û çi deverên ku tê de van celeb partî qels mane, tevgera millî jî li wir li şûn ma ye û pêşve neçûye. Ji lewra, dijmin bi her endizeyekê şerê van saziyên şoreşîn kiriye û hemî giraniyên xwe daye ser stoyên wan, lebatên wan ji her kesî bêtir cefayên giran dikşînin, li ber roniya vê rastiya han ji me re dixuyane ku çi kesê kamgiriya gelsiya van sazî û partiyên şoreşîn bike, ew rast bi rast kamgiriya paşvehiştina tevgera millî dike, an rast arîkariya dijminê millet dike. Digel heyîna gelek zehmet û reyên dijwar li ber milletê me em bawermend in ku digel wê jî dê di têkoşîna xwe ya neştimanî de serkewtî bibe û di kêfereta xwe de serfiraz bibe.
Em ji milletê xwe yî qehreman re vê cejna bi rûmet pîroz dikin û heya cejna bê pêşketin û xweşiyê dixwazin.

"Dengê Kurd",jimar:8,avdar 1964

---

N e w r o z be xoş hatî,we her bî rojî serxwebûn!!!

Xwendevanên delal!
Ev e salek e ku xwendekarên Kurd li Ewropa piştî borîna Newrza sala borî xwe kardikin û li hemû Ewropa, çi li Ewropa Rohilat, çi li Rojava bi dilekî germ û geş ji bo Newroza salî a 1964 kardikin. Ne tenê li Ewropa, bêguman ev hal û rewş li hemî Kurdistan li herçar perçeyên wî ên delal û şîrîn de. Bêguman e ku bîranîna vê roja ha qedreke xwe ya zor mezin û hêja di dilê her Kurdekî de he ye,nemaze di dilên welatparêz û niştimanperwer de kesên ku di Newroz de hezbûna hêviyên milletê Kurd diînin. Me got ku Newroz qedreka xwe ya zor mezin û hêja di dilê milletê Kurd de he ye, jiber hucetên tên:
1- Jiber ku Newroz ne tenê cejna jîna Kurdistan e, lê di Newroz de yekemîn carbû ku têde milletê Kurd bi mêranî û nebezbûna xwe dikarî xelekên zincîrên koledariyê biçirrîne, piştî sedan sal ji xebat û têkoşîneke germ û zehmet, jiber vê yeka han bîranîna vê rojê, bîranîna zehmetkêşiya milletê me û ji hêla din çirrandina zincîrên koledarî bi serkewtina qehremanê milletê Kurd Kawe yê gernaz û nebez, ji hêvî û daxwazên gelê Kurd re bû dergehên aza-

dî û serfirazî ye. Eva ye ku gelê Kurd piştî bi sedan sal dide ser wê şopa ku tê serbest û aza jî.
Eva ye îro gelê Kurd sitewandina fêkiyên xebat û têkoşîna van salên xwe di Şoreşa Kurdistana Iraqê de berz û bilind bi çavên serê xwe dibîne. Ev e Şoreşa Kurdistan dikevê sala xwe a sêhemîn, lê roj bi roj xurttir û germtir û zanatir xwe dide hildan û xwe li hemî cihan. Şoreşger û Pêşmergeyên Kurdistan ên gernaz û nebez bi mêraniya sereketiya qiyada wê ya têgihêştî û zana dikarîbûn bi mêranî û baweriyên xwe yên kûr bi daxwazên milletê xwe bi demeke zor kurt, dengê Kurd li nava hemî cihan belavbikin û wê bi rastbûna daxwazên milletê xwe di jiyan û mayîn de têbigêhin û lê hûrbinêrin û Şoreşa xwe têxin ser besteka cihanê.

2- Newroz, roja jiyana Kurdistan e, jiber ku li Kurdistan di meha avdar bi kurdî bi av ango çiloya jiyanê a şîn dikin ber xwe gul û susin çavên xwe dipişkivin û serê xwe ji temara çar mehên zivistan ên sar û befrîn rakin. Şivan bi pezên xwe ji paşiyên şikeftan derdiçin çiyan û baniyên Kurdistan dikevin û berve zozanên bilind, cigehên giya û nefel de diçin.
Xwendevanên delal!
Gava Newroz bi vî awayî li Kurdistan dibe mêvan ew bi mêvandariya xwe dergehê xêr û bêrê li xelkê Kurdistan vedike û jiyaneke nuh destpê dike, xweşî û şadiyê dixe dilên wan. Ez bi xwe hîç dûr nabînim ku milletê Kurd û xelkê Kurdistan rojekê ji va meh pîroz bi cejinkin û têde şadî û xoşiyên xwe bidin xuyakirin,ji lewre "21" Avdar kirin cejneka tevahî beramber rojî ku tê Kewayê nemir zincîrên koledar çirandin û milletê Kurd bi serfirazî jiya. Eva ye ku milletê Kurd bi hezaran sal e ku van herdu cejnan bi hevre dike kêf û şahiyên xwe divê rojê de dide diyarkirin
Li ser bîranîna van tiştên ha û ji ber pêwistiya ev nîrên ku di ser milletê Kurdistan re diborin, nemaze di van roja de, bareka zor mezin hildide ser milên Xwendekarên Kurd ên ku li Ewropa dixwînin ku dengê milletê Kurd di nava cîhanê de berz bikin,lewre meha avdarê meheke zor bi xebat bû bi nisbet Xwendekarên Kurd li hemû Ewropa. Gotin, lahan, govend û dîlan di bêtirîn bajarên Ewropa de hatin girêdan û girtin. Gelek rojnamevan û acansê televizyon û pêlweşan di van lahangnada hatin dîn û gelek tişt li ser Newroz û xebata milletê Kurd belavkirin.
Hêdî xwendevanên delal,hûn qedra Newrozê, li gor van tiştên jorîn ku me dane xuyakirin nasbikin. Her bijî cejnî Newroz Cejnî milletê Kurd û Kurdistan. Cejnî we pîroz.

Ş i v a n

# P E R Î Ş A N Î

Xwendevanên delal!

Gava ez li ser perîşaniyê ji we re dinivîsim, dixwazim bidim xuyanîkirin bê ev maka nexweşiya mezin a ku ji sedsalan de roj bi roj reh û şaxên xwe di nava milletê me de berdaye, bê em çiqasî li paş hiştine.

Weke ku em dizanin perîşaniya mirovan ne wek berê ku bav û kalên me pê bawer dikirin, ku ew bi xwe ji Xwedê bû. Mirov nikare wê hilînê bide alî beyî ku Xwedan nevê. Weha mirovan xwe li ber vê malkambaxiya han a mezin a ku destana wan tê de dihat dîtin, xwe bê hiner û hêz didîtin. Pir caran bi hezaran, bi mîlyonan ji mirovan ji birçîbûna dimirin, careke din ên mayî aqilê xwe nedigirtin û xwe tê nedigihandin, ji ber ramana efyûnê-olweha xistibû serê wan.

Milletê me ê reben ê hejar bi xwe ji vê nexweşiya han ne bêparbû û hêjî ne bêpar e. Ji sedsalan de ew di perîşaniyê de dijî. Ji sedsalan de ew roj bi roj dibêje sal bi sal xwezî bi par,milletê me ger bizanibûya ku ew xwedanê xwe ye dikare jîna xwe, jîna civaka xwe bughêre, pêkbîne weke ku ew dixwaze, bê gotinbû heta niha milletê me li vê kambaxiya han de, di vê destana han de nedima reben, jar, bindest, bê maf ji jînê nala kolan li bin destên karbidestên hovên, xwûnmijên faşistên Ereb,Turk û Ecem. Lê jiber milletê me di vê yeka han de neghabû ji alîkî û ji aliyên din ve girtina ji destên dijminên me ên hov û xwûnmij ku wan her û her xwestine û niha jî hêjî dixwazin ku milletê Kurd di perîşaniyê de bihêlin bi darê kotek û zorê, Kurd ji wan hov û xwûnmijan re her û her kole bimînin. Ji ber ew hov û xwûnmij baş dizanin ku perîşanî rê nade milletekî ji bo pêşketinê.

Li vî alî û li wî alî nexweşiyên wî ên civakî pir dibin û wî ber bi jêrbûnê de her û her dikşînin. Ji ber perîşanî maka nexweşiyên civakî nin.

Lê gava em ji xwe re hûr û kûr li dîroka mirovan bi tevayî binêrin, dê emê bibînin ku aqilmendan her û her xwestine ji tiştên neqenc, nepak tiştên qenc û pak jê derxînin, ango wan bikin ji bona xweşkirina jîna mirovan.

Rast ku perîşanî pîstirî nexweşiya civakî ye, çi civaka me be yan jî civakên mirovên din bin. Jiber vê yeka han divê em milletê xwe hişyar bikin li ser vê perîşaniya malkambax a ku ew tê de dijî. Bi hişyarbûna milletê me di perîşaniya xwe de, bê gotin e hovên, xwûnmijên, faşistên vegirvanên Kurdistan ên Ereb, Turk û Ecem bi leztir û beztir ji nav xakê Kurdistan tên avêtin,yan jî

li wir tên gorkirin.
Em dibînin, bê îro perîşanî li çarkenarên cîhanê çiroleke mezin di nava civakên mirovan de dilîze ji bo kûrkirina Şoreşa civakî li ser hov û xêrxwarên xêr û bêrên welêt û dewlemendiya wî a welatî.
Milletê Kurd, weke ku em tev dibînin ku ew bi vê perîşaniya xwe hesyaye û lê hişyar bû ye li tevaya Kurdistanê.
Ev hişyarbûna han bûyîneke mezin e di dîroka milletê me de a sedsalan. Ji alîkî canê derxistinê, canê azadiyê, canê serxwebûnê û canê derketinê di nava çarkenarên Kurdistan de tê belavkirin hew dijminên hovber, xwûnmij û faşistên Ereb, Turk û Ecem dikarin vegirtina xwe li nava Kurdistanê de bihêlin. Ji aliyê din ramana dadimendiya civakî bi belavbûneke rast û dirust di dewlemendbûna welatê me de, nemaze ji bo kara Şivan, gavan, karker û cotkarên Kurdistan. Bi kurtî ji bona perîşanên me, ewên ji hezar sal bawî di civakê de mabûn. Bi belavbûna hilanîna perîşaniyê ji nava Kurdistan, bi vê ramana han, dê gelemperiya Kurdan bi can û dil, bê veger hemû hiner û hêzên xwe bi karbînin, ew hiner û hêzên mezin ên heta niha veşartî, tawî û bawî mabûn, ji bona azadî û serxwebûna Kurd û Kurdistan.
Weha, em dibînin di perîşaniya Kurd û Kurdistan de azadî û serxwebûna xwe, ger em wê bi zanebûn û hişyarbûn dijî hov, xwûnmij, faşistên Ereb, Turk û Eceman bi karbînin.

S o r o

---

## N e x w e ş i y a   m e   X w e ş i y a   N e y a r a n   e

Di gotara xwe a berî vê (Nêçîr) de bi nimandina wekheviyê di navbera kew û Kurdan de, min pêçiya (tilî) xwe dabû ser nexweşiyek me û derxistina kurmên wê jî ji xwendevanên xwe re berdabû. Îro dixwazim li ser çend nexweşiyên me ên cankuj binivîsim.

Ji bo derxistina van nexweşî û kurman pêwîst e ku mirov xwe zêde bêşîne. A ku tê xwestin tenê dîroka me Kurdan vekirin û hûr lê kolan. Di her pel û rûpelên wê de ev nexweşiyên me pêçiyên dêxin çavên merov û heryêk ji wan bang dike û dibêje:"Kurdino hûnê kûr in ezî li vir im."
Ev nexweşiyên me welê derketine ronahiyê ku mîna xwediyê malê

û dizê ku ketî mala wî bûn e. Rojekê dizek dikeve malekê û xwediyê malê pê dihese û digre. Wa lê tê ku xwediyê malê dixwaze diz berde, lê diz wî bernade. Nexweşiyên me jî hinde ji me xeyîdîne ku nema me berdidin. Nemaze ev nexweşiyên me di navbera birayên me ên ku di Kurdistana Bakur de dijîn, gelekî belav in.Wek ku hûn jî dizanin piraniya birayên me ên ku di perçeyên Kurdistan ên din de dijîn bi rêberiya Partî Demokratî Kurdistan xwe ji gelek nexweşiyên xwe filitandine û berve serxwebûnê de diçin.Hêvî ev e ku ev piraniya sedî sed be û ên Kurdistana Bakur jî rojekê pêşde bi xwe bihesin û van nexweşiyan ji xwe dûr bixin. Li ber çavên min nexweşiya me a mezin dilpaqijî, ezitî, bê bawerî û oletiy e. Ev nexweşiyên jorî bû ne "boblat" li ser serên me. Di rojên dîrokê ên kevn de bigre heya niha em her dem hatine xapandin, nebûn e yek û me bi wekheviyê bawer nekiriye û qîma xwe bi yekitiyê naniye. Yek ji van xapandinan ên giring di sala 1514 de bû ye. Heya wê salê 45 beg di Kurdistanê de aza dijiyan. Di wê demê de ceng di navbera Îraniyên Safewî û Tirkên Osmanî de hebû. Welatê me bû bû qada ceng. Sultan Selîm bi alîkariya Îdrîsê Betlîsî hemû beglerên Kurdistanê anîn serhev û li wana re dostaniyek pêk anî. Ew dostaniya han bi van çar şirûtên jêrî ve hatibûn girêdan:

1) Beg dê di welatê xwe de mîna berê aza bin,
2) Gava cengek dijî Osmaniyan bibe dê hemû begên Kurd tev leşkerên xwe di bin serektiya paşayê Osmanî de şer bikin.
3) Gava ku dijî Kurdan cengek bû dê Osmanî jî bi hemû hêzên xwe alîkariya Kurdan bikin.
4) Ev hevhatin û dostaniya dê herhe be.

Lê gelek mixabin ku ev dostaniya bi serketina Osmaniyan û bi mirina Sultan Selîm re tev çû axa sar û Tirkan nerindî xiste navbera began, ewana berdan hev, hergav pişta yekî girtin û ên din qels kirin. Ev dilpaqijiya me bo wan bû dermanek û bi hêsanî hemû Kurdistan kirin bin destên xwe. Dîsa di sala 1937 de Kurdan doza serxwebûna xwe kirin, lê ev dilpaqijiya me bû navê olê û dîsa bû xenîm me û bi destên Tirkan û Kurdên bêvac 170 000 Kurd hatin kuştin. Ev arê azadiyê jî hate vemirandin û heya niha Kurdan li Bakur nikârîn ku careke din serê xwe rakin.

Vê dilpaqijiyê gelek caran serê me xwarî ye û bi mîlyonan birayên me di şoreşa axa Zîlan û ên din de hatine kuştin.Bi vê Xwûnrijandina han jî neyarên me têr nedibûn û tirsa wan her ku diçê bêtir bû ye. Vê tirsê xwe li ber çavên wan mezin kiriye, xewa şevan li wan herimandiye û nizanin çi bikin. Niha jî geh bi na-

vê axatiyê û partiyê dudilî xistine nava me û bi vê siyaseta han daxwazên xwe tînin cî. Siyaseta Tirkan a mezin ew e ku qasî ji destê wan tê Kurdan bikin du şîpan û wek dîkan berdin hev û hêlekê ji wan bi destên ên din qels bikin ku nema bikaribin bê rewşa xweyî ku tê de dijîn bifikirin. Gava ku hêlek bi vî awayî xistin, qîma xwe pê nayênin û vê carê bi destê ê ketî digrin û berdidin ser yê din û vê carê ê din dikin qermelax (wek kewên di berfê de qels dibin û dikevin nav gundan) û li ên berê bêtir pîsitiyê pê dikin. Ev nerindiya han rikdariyê dêxe nava wan û bi navê heyf- (tolestandinê)hilanînê demeke dirêj domdike. Zarokên wan jî di bin barê wê dijminiyê de dimînin heta demeke dirêj. Zorkerên me qîma xwe bi vê yeka han jî nayênin, reya xwendinê jî li lawên Kurd digrin. Di dibistanan de zimanê me qedexeye. Ji roja siftê de zimanê wana tirkî ye. Herroj bi her û her berî her tiştî bi zarokan goraniyên tirkitiyê didin gotin("Ez Tirk im,ezî rast im, bav û deya min Tirk in"). Ev zarokana bi riçperestiya Tirkan ji 5-11 salan dixwînin û bi rastî jî ji wan gelek dibin Turanî. Gava ku dixwazin têkevin zanîngehan reya wana tê girtin jiber zanîngeh wê wana şiyar bikin û ji ber her tiştî zanîngeh di Kurdistanê de tunene û Kurd jî neçar in, nikarin lawên xwe bişînin diyarên Rom. Hîn ji vê giringtir jî ew w ku mamosteyên wana bi çakî wana hîn nakin. Her dibistaneke Kurdistanê ên gundan mamostayekî xwe he ye, ê bajaran jî bi ser çar-pêncan nakevin. Lê yek ji bajarên Tirkan de 60-70 mamosta he nin. Ev kêmaniya mamostan jî xortên Kurd qels dihêlin. Gava ku yek her tiştî dide ber çavên xwe û diçe zanîngehekê divê ku imtîhanekê tev xwendekarên din bide, ger ku bi serket,dibe ku bikaribe bixwîne!

Wek hûn jî dibînin divê em bi lez xwe ji van nexweşiyên ku me bi hevdin pîsdikin bifiltînin û biparêzin. Eva jî bi yekitiya xebata bi hevre dibe. Yekitiya ji bo bi rêxistinekê (sazî,organîzasyon) bi nav dibe. Nik vê rêxistinê jî bi hevdin û doza xwe bawerbûn divê. Divê êdî em bi yekitiyê, Wekheviyê bawerbin û qîma xwe pê bînin.

H. R e ş o

---

K e ç i k a   K i b r î t f i r o ş

Çiqas sar bû... şevine hişkesahiyê... Berf dadiket, pê re jî tariya şevê... Şeva salê a paşîn bû. Sibetirê sersal...Di vê

şeva han de keçikeke piçûk di nav kûçê û kolanan de digeriya... pêxwas û serqot. Gava terka mala xwe da, şekalin bi pê bûn: Lê bi kêrî wê nehatin. Ew pêlavên diya wê bûn, pêlavine kevin û lê fireh. Gava keçikê bi lez û bez ji ber erebekê xwe dida alî, ew winda kiribûn. Keçik li wan geriya, lê ew peyda nekirin. Sêwlekekî fereke wan peyda kir û ew ji erdê hilanî. Lê temaşa kir,kenî û got: "Gava ji min re zaro çêbûn, ezê ji wan re bi vê şekalê landikekê çêkim."

Keçika kibrîtfiroş bi peyên xwe ên werimî û morbûyî di nav berfê de diçû: Li rizqê xwe digeriya. Di berwanga wê de pakêtine kibrîtan hebûn û elbibek bi destî ve bûn. Lê bûbû şev û hêj tiştek nefiroti bû. Birçî bû, diranên wê dirikrikîn, ji xurtiya sermayê rûyê wê diqermiçî.

Kuliyên berfê diketin ser keziyên wê ên şeh û di pora wê a gungilî û hûrgurpik re diçûn. Lê tê de nediheliyan, û li ser diqerisîn. Heçko xwîna keçikê jî cemidî bû.

Ji pencereyên xaniyan ronîke şîne li kuçan diherikî û bihina qazên biraştî şîva sersalê li hewayê belav dibû. Belê, şeva sersalê bû. Keçikê dida eqilê xwe, nizani bû çi bikira. Vegere mal? Newêrî bû. Hêj tiştek nefirotibû. Çawan destvala wê vegeriya mal. Ma ji bavê xwe re wê çi bigota? Dizanîbû ku bavê wê dê jê bipirse, te çiqas firotin? Gava jê re bigota " min tiştek nefirot",kalo dê li wê bidaya.

Bi van reman û texmînan keçik ket navbera du xaniyan û xwe bi talda xanîkî bilind girt. Heçko ew der talde bû û xurtiya sermê lê dişkiya. Ma xaniyê wan ji derve ji talda wî xaniyê mezin û depdepe girtir bû? Ma xaniyê wan çi bû? Koxikek, ji her derê qulêr, qulên koxikê bi ka û kicikan girtî bûn.Lê bayê kanûnan tê re dihat û carina ew ji qulan derdixistin, tavêtin erdê û baranê jî bi xwe re dixiste hundurê koxikê. Keçikê li destên xwe ên bêgoşt û terikî dinihêrt. Heatiyokên destên wê di çermê wê re xuya dikirin. Qey çerm ji ser de ketibû.

Tiştek hate bîra keçikê. Kibrîtek vêxist û di rivîniya wê de xwe germ bikira, çi dibû... Lê piştî midekî, bê ku bide eqilê xwe. kibrîtek ji qûtîkê kişand û ew li tenişta xwe, a elbikê şidand... çi ronahîke geş, çi germeke şêrîn! Destên xwe ên qerisî li pêta kibrîtê gerand. Di germiya wê kibrîtê de canê wê ê mirî qey vejiya.

Şehwirîn didîtin. Digot qey li ber sobeke çînî û li ser doşekan rûniştiye. Çiqas lê germ bû bû! Kir ku/~~xwe~~ lingên ji bêxe ber wê sobê,

wan jî germ bike. Lê sobe nişkekêve winda bû. Li destên xwe nihêrt. Tiştekî di nav tiliyên wê de reş dikir... bizotê kibrîtê.
Keçikê kibrîteke din vêxist. Diwarê xaniyê mezin di ber çavên wê de, di ber ronahiya wê de qey bû bû pîpoqek. Bînahiya mirov tê re diçû: digihêşte heta saloneke biheşmet. Di orta salonê de masake xwarinê xuya dikir. Li ser masê, di nav lengereke isfehanî de qazeke biraştî hebû: kêr li pişta wî daciqandî bûn. Niho wê bihatana, bi kêrê ew perçe bikirina û li mêvanan lêk vekirana.Lê welê nebû. Qaz xwe ji masê derkir, daket erdê û berê xwe da keçikê... Kibrît vemirî. Di pêşiya keçikê de ji dîwarekî stûr pêve tu tişt nema bû.
Keçikê kibrîteke din vêxist. Nihêrtinên keçikê dîsan di dîwêr re çûn. Ma ne şeva sersalê bû? Qirdikek çêkiri bûn û li dorê diyariyan danî bûn. Bi sedan find vêketî bûn. Çi temaşeke cazibar! Keçikê kir ku destên xwe dirêj wan bike... Kibrît vemirî, dîwarê stûr ket ber çavên keçikê. Bi tenê find bi hewa diketin û qesta ezmên dikirin. Gava gihaştinê dibûn stêrik. Yek ji wan ket û wek stêrkeke pepûk sînga ezmên xeteke sor kişand û wenda bû. Yek dimire. Belê, dapîra wê jê re digot: "Gava stêrkek dikeve, canekî ber bi Xwedê de dibe." Ax, ew dapîra delal, mirova tekane, ya ku jê re qenc bû. Heyhat stêrka wê jî ketî bû. Keçikê kibrîteke din vêxist û ew da ber qîran û got: "Dapîra min,dadika min, min zûka bi xwe re bibe! Ez dizanim, heke kibrît vemirî, ez te jî wek soba çînî û qazê biraştî û qirdikê sersalê, te dapîra xwe jî dê winda bikim." Keçikê pey hev kibrîtên elbikê hemî vêdixistin ku dapîra xwe winda nekit. Dapîra xwe tucaran evçend spehî û dilovan nedîti bû.
Di ronahiya pêtên kibrîtê de dapîrê neviya xwe kir himbêza xwe; her du bi perwaza milyaketan ber bi ezmên ê jorîn firîn. Ewçend bi hewa ketin ku nema bi serma û birçîtiyê dihesiyan. Gihaştibûn nik Xwedê.
Sibetirê emeleyên belediyê, gava kuçe û kolan rêş dikirin, di navbera du xaniyan de keçikek dîtin. Keçik li erdê rûniştî bû: Hinarkên wê sor dikirin, kenekî zîvariyê di ser lêvên wê re diqeliqî. Keçik mirîbû; ji sermayê qufilî... di şeva sersalê de emirê Xwedê kiri bû.
Dema ku tavika roja sersalê dida cendekê wê ê hûr, xelk lê diciviyan û ew seh dikirin.
Di nav tiliyên wê de darikê kibrîteke vemirî reş dikir. Elbikeke vala li rex cendekê keçikê bû. Xelkê digot: "Dixwest xwe bi kibrîtê germ bike, lê....."

Lê ew tiştên spehî, yên ku keçikê şevê dî dîtibûn, nedihate bîra tukesî. Dîsan kesî nedizanî, çawan û bi çi awayî, di himbêza dapîra xwe de pê li roja salê a pêşîn kiri bû.

Bişarê S e g m a n

Dihok: 8 îlon 1943, Ronahî,hêj. 19, 1943

---

Xwendevanên delal!
Azadî, Serbestî û S e r x w e b û na milletan nehatine heta îro carekê ji caran dîrokê de diyarîkirin. Her û her ew hatine standin bi darê kotek û zorê ji zorkeran, ji faşistan, ji hovberan piştî goriyên mezin ku ji bona wan hatine gorîkirin.

---

## S e r p ê h a t i y ê n   D î r o k ê

Xwendevanên delal û hêja!
Piraniya me dizanin paşvemayîn, perîşanî û jêrbûna milletê me di îro de, di sedsalên bîstan de, lê kêm ji me dizanin reyên derxistina wî ji wê paşvemayînê, perîşaniyê û jêrbûnê.
Ger em xwe bêşînin, hûr û kûr li dîroka tevgera milletan û netewan binêrin, dê tê de emê gelek serpêhatiyên hêja û giranbiha bibînin ji bona derxistina milletê xwe ji wê paşvemayîn,perîşanî û jêrbûna malkambax a ku milletê me ji sedsalan de hê jî tê de dijî.
Gelek millet û netewên berî me di tevgera azadiya xwe de pir goriyên mezin ji bona azadiya xwe gorî kirin. Hêviya wan ew bû ku piştî derxistina zorkerên welatên xwe, gihandina azadiyê û hildana ala xwe, dê welatên wan bibin buhuştek yan jî nîv buhuşt li ser rûyê zemîn. Bi taybetî ev xuyaniya han di nava tevgerên milletên li paşvemayî ên Asya, Afrîka û Amerîka Latînî xweş dide xuyanîkirin. Em Kurd bi xwe jî ji vê xuyaniya han ne bêpar in.
Gava ew milletên li paşvemayî xebata azadiyê û serxwebûnê dikin ew azad û serxwe dibin. Hinekî bi pêşve diçin, piştre bi derengî xwe ber bi pêşve dikşînin. Lê pir caran karbidestên wan welatan welatên xwe ji milletên xwe re dikin zîndan, cihgirtinê, cihpîskirinê û golek ji xwûnê, ji dêlve ku wan ew ji wan re bikirina welatekî xweş ji bona jîneke xweştir. Karbidestên wan welatan soz û hêviyên têkoşerên azadiya welêt bi cî nayênin. Ewana dixwazin ku ew bi xwe û çîna xwe ve bibin xwedanê xêr û bêrên dew-

lemendbûna welêt. Millet bi xwe careke din nala berê dadikeve ber bi paşvemayînê, perîşaniyê û jêrbûnê dûrî bajartiyê û jîritiyê. Ew hêviyên bilind ên bi azadî û serxwebûna siyasîve girêdayîbûn pirên wan bi cî nayên. Wê demê rastiyeke dijwar nala zirav tê ber çavên zana û şehrezayên welatperwer ku divê li ser wan xebateke deha dijwartir û bi ziravtir di nava welatê xwe bi karbidestên xwe re ên kevneperest, dûvik û nokerên imperyaliyê re bikin, da ew bikaribin dadimendiya civakî, siyasî û aborî di nava welatê xwe de bi cî bînin. Ew reman û armancên han pêk nayên, ger ku belavbûneke dadimendî di dewlemendbûna welêt de neyê kirin.

Ev kar û barên han ji bo me Kurdan ne karekî hêsaniye. Ew bi xwe reya şoreşa remanê dide ber çavên me dijî pêkanîna civaka me çînî. Evaya bi xwe li ser me datîne ku em her û her merovên remangîrên şoreşvan têkoşîn û xebatê bikin, ji bona xweşbûna jînê a gelemperiya millet di nava welêt de û ne wek nala merovên siyasî ên ku xwe li gor dorhêla xwe û pêkanîna çîniyên civaka xwe, xwe bi rêk û pêk dixin.

Milletê Kurd di vê paşvemayîn, perîşaniyê û jêrbûnê de, a ku îro tê de tê dîtin deryeke mezin jê re di dîroka rojhilata navîn de hatiye vekirin, ger ku em yan jî nifşên ku li dû me tên têkoşîna azadiyê û serxwebûnê dikin, bi hişyarî û zanebûn wêna bidin bi pêşde. Jiber vê yeka han, divê em xweş ji serpêhatiyên dîrokê serpêhatiyên xwe bigrin, ger ku em bixwazin jîneke deha xweştir di nava milletê xwe de bi cî bînin.

S o r o

---

## R e y a  S e r b e s t i y ê  Tenê di Y e k b û n ê  de  ye

Milletê Kurd îro di her perçeyê Kurdistanê de ji bo azadî û serfiraziya xwe, ji bo jîneke bi rûmet û hêja daye ser reya têkoşîneke germ û xebateke dijwar. Di vê keyfereta han de ew ji destê dijmin kuştin, talan, zilm û zînatên giran dibîne û pê tê sotin û qelandin. Lê bi saya mêranî û fedekariya xwe ew dizane di reya azadî û serxwebûna xwe de çawan xwe bide kuştin û tevgera xwe ya millî pêşve bide.

Li îraqê piştî dernxwûnbûna hikmê beesiyan, Kurd hêvîdarbûn ku karbidestên nuh dê bikaribin daxwaza wan nasbikin, heqê wan di hikmê zatî (Ewtonomî) di nava komareke iraqî demoqratî de bidi-

nê û agirê vê şerê xwûnrêj ku ji du sal û nîvan de dest pêkiriye vemrînin. Lê mixabin ku van karbidestan jî nikarîbûn ji dongiya hikmê Qasim û Beesiyan destkewtî bibûyana. Va ye em dibînin ku hîn wek berê şer li Kurdistanê dom dike, mal û gund tên şewitandin, jin, mêr û zarok têne kuştin.

Li Sûriyê jî ji roja ku Beesiyan lîwana hikim di welêt de xistine destên xwe û virde reya neyartiya Kurdan dane ber xwe û bi her endizeyekê şerê wan dikin. Wan dane ber çavên xwe ku birekê ji Kurdên Cizîrê ji ciyên wan derxînin heya ku di wê êrdiman de wan bikin hindikayî, ji bo vê yekê wan vê dawiyê rê li ber şêxên Şemeran vekirine ku Kurdan ji gundan derxênin û Ereban ên koçer di şûna wan de bi cih bikin. Heya mesele gihişte warekî holê ku li ber çavên peyayên hikumetê Kurdan bidin ber gulan û bikujin, bê ku ji kirên xwe berpirsiyarbin.

Herçend li Tirkiyê jî hikumetê reya pêşketinê yekcar li ber Kurdan girtiye, ji hemî maf û hiquqên millî bêpar hiştine her çi kesê doza wan heqan bike an tê kuştin an jî di binê zindanan de dirize. Berî çendakî ajensa xeberbêjên İstanbulê rageyand ku middeumumê Tirk darvekirina bîst û sê niştimanperwerên Kurd xwestiye. Gunehê wan ew bû ye ku alîkariya şoreşa Kurdên İraqê kirine.

Bi vî awayî em dibînin ku her çi tevgera me ya millî di warên hundur û derve de serdest dibe, her diçe dijmin hartir dibe û hovîtî êrişî wê dike. Jiber ku lîwana tevgera millî di destê partî û saziyên kurdî de ne ji lewre lebat û endamên wan ji kesî bêtir dikevin ber êrişên dijminên hov û tên êşandin. Ji ber vê rastiya han heya ku Kurd di vî şerê serxwebûnê de serdest bibin divê ew berpirsiyariya dîrokê bîra bibin û rê li pîlanên dijmin bigrin. Ji bo vê yekê divê ew bi dilgermî xwe li dora saziyên xwe yên şoreşîn bidin hev û yekdest û yekcan li pêş dijmin rawestin.

"Dengê Kurd",jimar 7,sal 1964

---

KURDÎNO !

Doza azadî û serxwebûna we divê her û her li ber çavên we bin, ger ku hûn bixwazin mîna mirovan bi rûmet jiyaneke xweştir di welatê xwe de bijîn.

# J A N

Hela jan!
Jana kirêt,
Jana zirav!..
Peritand
Te ji min her,
Cerg û hinav.
Tu ketî
Nava serê
Milletê min,
Nexweş bûn
Girs û biçûk
Tev mêr û jin.
Te berdan
Şaxên di xwe
Heya bi dil,
Te gerand
Canê di wan
Tev rîş û kul...
Tu jana giranî,
Navê te nezanî,
Bê şik tu neyar î
Bi hogir û yar î
Yarên te neyar in
Bo min wekî mar in
Jahra wan a cankuj
Lêvên wan ên xwûnmij
Millet kirin sermest
Nezan, dîl û bindest
Qelsok, reben û jar
Bin destê kolîdar
Ev bû ne hezar sal
Bê rûmet û bê al
Bê gazin
Bê deng
Bê gilî
Bê ceng
Millet xwe sipart
Bê hêvî ji jîn
Bin destên neyar
Li ser wî kom bûn
Qirrakên leşxwar
Cendek rakêşan
Wekî seg û gur
Melan bi nivişt
Şêxan jî bi xiştan
Axayên diz
Begên xiniz
Bûn bav û diyên te
Him dest û piyên te
Bin darê kolîdar
Em hêlane zîvar
Ji mal,
Ji can,
Ji vîn,
Û reman,
Zorkerên xwûnmij
Sofiyên porgij
Ji bo te piştmêr
Da ku bibin têr
Riça te avdan
Di canê millet
Tu bû ji bo wan
Heyîn û dewlet
Holê li me dan
Ew tîra cankuj
Wan gurên bêbav
Zûriyên xwûnmij
Ew gur
Veşirîn
Di kavilê berx
Li me
Badan
Wan felek û çerx
Holê
Hela jan!
Jana teres
Jana qirêj
Dinasim
Tu yî ji mêj
Piştî me nasî
Em bû ne hişyar
Karker û cotkar
Belengaz, zîvar
Gundî, bajarî
Zana, cewêlek
Ji bo şerê te
Hemî bû ne yek
Îro
Millet
Çîçkî pizivî
Zana
Mêrxas
Cih, cih dilivî
Rêzan
Komel
Civîn û civan
Yekitî
Tevger
Bû armanca wan
Dawî
Nasîn
Ku tu yî dijmin
Berî
Dan te
Ji reyeke din
Ew dê
Jêkin
Dest û piyên te
Bikujin
Bigurên
Bav û diyên te

Dost û yarên te
Nivist kete xew
Di nav warên te
Xeweke kambax
Xeweke dijwar

Em bûn
Dîl û belengaz
Ji bo
Rovî
Her tewz û tinaz..

Te cih
Nema
Di nava Kurdan
Bimir
Biqeş
Hẹre nik Şeytan..

Osman Sebrî,Bahoz,rûp.31, 1956

---

## G Î S Î N

Rojekê dibên dixebitî yekî Hesinkar
Horsek wî li pêş çakûç bi dest bervanek di ber
Di nava hesin rabû bijart gîsinekî kevnar
Da şagirtê xwe gotê:bibe bavêje nav ar
Serekî hêla ew di kûrê sor dibû pir germ
Bi zar giriya gîsin gotê: hosteyê dilreş
Min çi bi te kir, ku min dixî nav agirê geş
Holê bi çakûç li min didî bê dilovanî
Te dil naêşe bi halê min ma ne însanî
Hesinker gotê: bes bi zar e belê mirov im
Wekî dibîrî ne ewçendî dilreş û hov im
Tu perçek hesin, ne hêjayî deh qurûşan bû
Bi vî halê han ne di çavên malfiroşan bû
Dê çêkim ji te şûrekî tûj da yekî mêrxas
Mafê xwe bi te bistîne, ew pê bibe gernas
Rûmet ji te re çêbibe ji ber ku dibî çek
Rewşa te bi suhn dê rahêje dijminê pir lek
Bi agir nebe naçe qirêj ji gehwerê te
Kînga bê lê lêdan tûj dibe xweş dev û berê te
Dengê xwe birî gîsin îdî nema digazî
Ji dil xwe dabû ber êrişên çakûçê tazî
Zanî ku bê west, êş û kuvan nabe tucaran
Çekekî hêja jê bitirse çavên neyaran
... ... ... ... ...
... ... ... ... ...
Em Kurd jî welê wekî gîsin jeng û gemar bûn
Lewra di nava gelê Cîhan hinde rûsar bûn
Çiqas ketîbûn,gewherê me bi xwe hesin bûn
Di jîna civakî de bi durvê xwe gîsin bûn

Tenê bi kêrî cot dihatin serî di nav ax
Rûmet me ne bû, di ber lingên qels û malkambax
Ger destê felek lêneketa li nav çavên me
Li pêşî Cîhan kêm neketa deng û navê me
Çavên me bi zor venekirana wan neyarên ker
Li me nedana bi dilreşî tev caş û laşker
Bi top û tifing, tang û napalm sarûxên şeşper
Çiya û newal, gund û bajar giş nedana ber
Welat bi agir nesûtana kambax û wêran
Şîrmij nebûna armanc ji bo xençer û kêran
Çi pîr û ciwan, keçên zerî, zarok û mendal
Wek wehş û hovan nekuştana rîspiyên kal
Kînga me karî bavêje wê remana kevnar
Ew remana ku bû hezar sal em pê birîndar
Remana biratiya derew, ew girêka reş
Ji kêngî ve em em pê xapîne ji me birin heş
Ji azadî û serxwebûnê hêlane bêpar
Bi me nehiştin reng û rûmet,ne ziman û zar
Biratiya ku sînorê wê Efleq xirake
Destên Ereban bîne gewriya Kurdan ke
Dev bavêjin me her demê ew wekî segên har
Em bêne kuştin di ber a qenc herwekî sîmar
Ev reng biratî pîsî ye me navê tucaran
Kesên bi rûmet xwe nakin ber destên xedaran

Osman S e b r î

---

## K E R Û A Z A D Î

Nêrîkî kovî hilmiştî û şeng
Di derşagekê diçêrî bêdeng
Hate wî pêjna zirrîna kerê
Dengê wer pîs nedîbû berê
Serê xwe hilda li dor xwe nêrî
Dixwest bizane ka kî dizirî
Hew dît kerê reş dike qoreqor
Dide tîzikan wî bêvil li jor
Li ser pişta wî kurtanê kevnar
Di histu zengil,di serî hefsar

Nabim pelîse ji bo gurê zer
Dibê wî xwarin gelek pez û ker."
Kovî dikenî digot: " ne wa ye
Tirsa di dilê te de bê ra ye
Gur jî wekî te gelek tirsok e
He ye hîn pirtir qels û bizdoke
Xurt e çi dema qelsan bibîne
Qels e çi gava xurtan dibîne
Tirsê di dilê xwe de gerde
Vê remana pîs bavêje berde."

Hate nik kovî gelek sergiran
Doxhefsar di ling dihat rapêçan
Digote kovî: " tu çi teba yî?
Bêkes wa li çolan serberdayî!.
Bo çi bernadî van rêl û govan
Were te bibim nava mirovan
Ne heyf e holê bê xwedî û yar
Bimînî sêser bê afir û war!"
Kovî digotê: " ho birakê ker!
Peyva te biyan bo min seraser
Ev çiya hemî cih û warê min
Çi kesê dilçak dost û yarê min
Min navê afir ne divê xwedî
Ji roja ku bûm min xwest azadî
Ev şîreta te bêfesa û şaş
Tê de nabînim tuya rast û baş."
Gelek xeyîdî kerê guhdirêj
Got:"a bi ser û ber nepeyivîm hêj
Min he ye xwedî,ji bo min axur
Avakiriye tê he ne afir
Tucar nakêşim xema xwarinê
Heya ku hebim li rûyû dinê
Xwarin, vexwarin bê jimare pir
Dema bixwazim dikim zirezir
Bo sermê negrim da min ev kurtan
Nadim bi eba kefxayê Botan
Xiste serê min reşme û sergoş
Bi dengê zengil her dibim serxoş
Min li mal hene du qeyd û merbend
Pê têm girêdan bi kapok û zend
Kerê digot wî: "ne bê zirav im
Lê wek biçûkê bê dê û bav im
Çawan dê vê kêfê hemî berdim
Kurtan û hefsar, afir bi derdim
Kêfa xwe dikim wek mîr û paşan
Navêm bigerim li gaz û kaşan.'
Kovî digotê: " tu guhdirêj î
Totik vala yî mêjî qirêj î
Hê tu nizanî çawan bû yî dîl
Pişta te cedew,hemî girêk û qîl
Te çi ji xwedî, divê azadî
Şerm e ku wa bi dîlî şabî
Bavêje tu hefsar,kurtan, zengil
Ma qey te nîn in mêjî û aqil?
Hefsar ji bona te pê girêde
Merbend û qeydê bi ser de lêde
Kurtan ne ji bo sermê negirî
Pişta xwe li ber barê wî vegrî
Bibî xulamok li ber derê wî
Heya ku hebî her tim kerê wî
Kesê bi rûmet qîma xwe nîne
Vê kêmiya han bi xwe de bîne
Wer digel min zozan û çolan
Şarge bin li dor mêrgan û golan
Dê hîn bizanî azadî çi ye,
Kesê te xwedî dinasî kî ye."
........ ......... ......
........ ......... ......
Guh bi xwe de girt pêl bû kerê reş
Dihat bîra wî tolik kerbeş

Dora gund tijî sê hehên bihar
Payîzî bê tirs nepakî dixwar
Çawan vê xêrê dikare berde
He ye ku canê şêrîn bi serde
Ji bo azadî nefel û giya
Nexwest gund berde derkeve çiya
Digot:" ez naşêm bijîm bê hefsar
Bê axur nabim dema bû êvar
Azadî çi ye? digel tirsa can...
Bê tirs min divê bixum parîk nan."
Gava bihîstin kovî ev xeber
Digotê:" rast e aza nabin ker."

Osman S e b r î

## Evîntiya Min

Gava te teyî bîra min,
Kin dibin saet.
Xem dûrdikev;
Xeyalek hênik dora min de badikeve...
Gava tu teyî bîra min,
Hestiyên min dilerizin
Ji evîniyê.
Çavên te gola mirad e,dengê te opera
Lê bedewê!
Lê bedewê! Gava teyî bîra min
Bejna tîtal, hîngê sewda teze teze
Dikeve serê min.
Te xar, xilaskir hişê min.
Bejna tîtal dernakevê ji bîra min.
Ez li Ewropa, tu li Asya:
Mina kirine, em nikarin bighên hev;
Mina kirine bi arîkariya top û tifingan!
Ez li welatekî azad serfiraz im;
Tu li welatekî zelûl î- li Kurdistan,
Ê ku dijî bin hikmê faşîstan...
Lê sûretê te cêgera minve zeliqiye,
Xeyalan dibarînî... ...
Porê kej
Mîna zeviya genimê zelalî
giştî
Badikevin ber çavên min de:
Ez orta agirê te de,lê ji te
dûr
Lê dîlberê!
Min gişt zincîrê dijmintiyê
Min gişt zincîrê miftexuriyê,
Şikandin...
Lê,lê tenê nikarim zincîrê
evîntiyê,
Zincîrê dostiyê bişkênînim.
Gava tu teyî bîra min,
Ez mîna teyra dixwazim bifi-
rim;
Sînor nasnakim;
Bîra dikim zeman û mekan.
Tu omiga min.

M. Bor

---

## BAWERÎ

### Di Warê Xebata Welêt de

Ez dikarim bêjim ku bawerî di warê xebata welêt de çeka xurtir û hêjatir e. Çi xebata ku li ser hîmê baweriyê nehatiye danîn neçûye serî û hafil nedaye. Çi xebatên ku hafil dane û çûne serî, dema em lê hûrbibin, dê bibînin ku hîmê wê li ser baweriyek xurt û têkuz hatiye danîn.

Îro, em Kurd ji her tiştî pirtir hewceyî baweriyek xurt û têkuzin, ji lewre min divê goreyî nasîna xwe ji bira û hevalên xwe ên xebatkar re salixdana baweriyê bikim.

Baweriya ku em Kurd ji xebata xwe re bikin bingeh di çav min de wek kursiyek li sê lingan e, çi gava lingek ji wan kêm be li ser xwe namîne û dê bikeve. Eger mirov aliyê bê ling hilpesêre cihê-

kî din, an tiştekî deyne bin, ew kursî nikare giraniyên mezin hilgire ser xwe.

Ev in hersê lingên baweriya têkuz û xurt:

1- Divê em bi rastî û dadimendiya daxwaza xwe bawer bin.

2- Divê em bawer bin ku çi dema gelê Kurd ji xew hişyar be, dê bibe hinerek mezin ku tiştek xwe li ber xurtiya wê nikare bigre.

3- Divê baweriya me bi me hebe ku emê bikarin gelê xwe ê nezan û paşvemayî ji vê xewa malkambax hişyar bikin û bixin ser reya xebat û têkoşînê.

Ji van hersê lingan kîjan ji baweriya Kurdekî kêm be, divê bizane ku baweriya wî qels e, ji lewre divê derbasî qora têkoşînê ya pêşîn nebe. Tevî ku baweriyek kêm û qels nabe dermanê xebateke mezin, gelek caran dibe ûşta pir ziraran jî.

Osman S e b r î

---

KURDİNO !

Hinera we a mezin a veşartî ji bona azadiyê, serxwebûnê û jîneke xweştir di hinera Ş i v a n, G a v a n, K a r k e r û C o t k a rên we de ye.

Ger ku hinera we a mezin di perîşanên we de tên xuyanîkirin,ger ku A z a d î û S e r x w e b û n a Kurd û Kurdistan di wê hinerê bi xwe de tê dîtin, bizanibin ku Çiyayên we ên bilind ên asê parêzgerê we bûn di demên kevnar de ji ber windekirinê. Ew di dema niha de û a tê de jî paşmêrê çaktir û paktir ji bona azadî û serxwebûna weye. Jiber vê yeka han, divê ev herdu hinerên han bi baştir û çaktir bikarbînin, da em bi leztir û beztir bighên mafên xwe ên ku ji me hatine talankirin û mîna milletên din jînek xweştir di nava welatê xwe de bijîn.

---

## Ji Rewşên Şoreşa Me

Di vî warî de, ev warê bê bihur ku mirov dikare bi dûr û dirêj li ser bipeyive, ez dixwazim hinekî bi kurtî li ser hin tiştên bingehîn, ku bûne paşmêr ji destpêkirin, man û xurtbûna vê şore-

şa me a pîroz, bipeyivim.
Pir rast û durûst bû ku milletperwerên Kurd bi milletperwerên Ereb re ketin cenga biratî a paraztina komara 14 tîrmehê, ev komara ku bi ser yekitiya xebata herdu milletan ê Kurd û Ereb hate dinê. Ji bo cihkirin û pevebirina mafên xwe ên millî. Lê heyf û mixabin ku Qasim zû, ne bes bi paş de vegeriya, lê bi bê mirovitî êriş berda ser gung û malên Kurdan, piştî şikandina wan hêzên ku di dû xapandinê pir bi wan xweş dibe û xweş dikirin bi dengekî bilind,li ser bigrîn. Ji lewre milletê me ê nebez, bi dil û can dest bi şoreşa xwe a bi pîrozî kir û sond û peyman xar ku ewê ji bo bi cihkirina daxwazên xwe her tiştî canbêzar bike. Ji lewre, bê tirs em dikarin bêjin ku ev tişt yek ji esbabên xurtbûn û hebûna Qasim bi leztir anî dawiyê.
Niha û piştî ku bi mîratxwarên Qasim werê ku şerê bi Kurdan re seyraneke xweş e, dawî dikarin bi serbestî û bê tirs armancên xwe ên qirêj, ew armancên ku bi destên kolîdar hatine danîn, bibin serî. Lê wer xuya dike ku seyran di çiyê de, ne ewqas rihete û ew seyrana ku di (di rîsaleta Xalid) de tiştekî din e.
Eger em bên û li van bûyerên han ku vê şoreşa me a pîroz re dibin heval û digel wê de em şoreşên ku Kurd ta niha pê rabûne, em xweş tê de mijûl bibin emê xweş bikaribin bizanibin ku çine rewşên van şoreşan, gelo çire ev şoreşa ya ji ên buhirîn cidaye, di warê rewş û çûnityê de.
Bi min ku em piştî hin esbabên wext û cigah bînin ber çavên xwe emê xweş û bêdil û dîn karibin bibêjin ku: Hişyarbûna millet û têgihaştina wî di qezyeta wî de, dawî civîna her milletperwerekî li dora vê şoreşê û di serketina wê de serfiraziya xwe dibînin.
Hebûna partî û civatên kurdî ên pêşverû ku bi rengekî rast û durûst karibûn xweş berê millet bidin reya rast û wî di qezyeta wî de bighînin.
Ev bûn hin ji rewşên vê şoreşa me a ku bê şik wê daxwazên millet ev milletê ku bi tevayî dike qîrîn: YAN KURDİSTAN YAN JÎ NEMAN bi cih bîne.

Ş e f o

---

## B İ L Û R V A N
(APO)

Serxweş im bi ava çiyan
Rê vekin,ezî bi lez im!
Bi girîna xwûçk û deyan
Dîn bûm e,berjêr dibezim.
Lêxe bilûra xwe,bilûrvan
Belav e pez,nema ye Şivan!

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

Divê bo kêrê be,berxê nêr
Min berdin gurên bêbav!
Ev e hat roja xortên mêr
Nema dixapin bi şorên xav.
Lêxe bilûra xwe,bilûrvan
Belav e pez,nema ye Şivan!

Tika ye Şivanê delal
Berde vê banga lorikî
Mij û avê bike zelal
Daxwaza min e, ronakî!
Lêxe bilûra xwe, bilûrvan
Belav e pez, nema ye Şivan!

Min bibore,ket im derengî
Rêberê hêja, ez b e n î
Nema diqetim, li kêrî
Dest bi xiroşmêke,ez gorî!
Lêxe bilûra xwe, Bilûrvan
Me dilxweş bike, tu yî Şivan!

Hemreş R e ş o

---

## L i p ê X e l k ê Mayîn Ş e r m k a r î ye

Bê guman e, ku her mirovekî, milletekî an welatekî adetên xwe ên xweser he ne, ji milletên din vediqetînin. Ew mirov an ew millet li gor wan adetin xebat, îş û karên xwe dimeşînin.Şerm û kirêt e ku kirên mirov ne li gor adet û baweriyêm milletê wî bin û rewşa gelekî ne wek gelên li dorhêla wî bin; jiber ku tevî her milletek an mirovek adetên xwe ên xweser he ne jî,lê ji hêla din ve ji bona teva adetên tevayî jî he nin.
Gava em bêne ser pêkanîna Cîhanê û carekê lê hûrbibin, dê emê tê de bibînin ku her milletekî dewletek xwe he ye. Ew dewleta

han miletê xwe bi miletên Cîhanê dide naskirin, bi navê wî civat û kongrêsên cîhanî nêwertiyê dike, ji şerê zorker û kolîdaran diparêze, wî dide xwendin û hişyarkirin, dike û dixebite ku her û her wî bi pêşve bibe û bi jîneke hêja û qenc bighîne.
Herçî miletên mayî jî qîma xwe bi wan tiştên jorî anîne ew jî bi wan bawerkirine û ji dil û giyan dane ser wê reya hêja û bi rûmet. Ji bo gihandina wan armancên giranbiha gelek west, xebat û xwe êşandin, xwûn dayîn bi comerdî. Loma wek em dibînin roj bi roj milet dighên doz, daxwaz û mafên xwe ên millî û niştimanî. Jiber vê, merov kare bêje: Rojê dewletek teze derdikeve û dikeve koma Miletan. Loma jî jimara dewletan ji heftê piştî cenga cîhanê a dudyan gihişt dora sedûdehan. Ji vê jimara han çi reş in, zer û gewr in ji Afrîka, Asya û Amerîka Latînî nin.
Dema em vegerin ser miletê Kurd, dê emê bibînin ku tevî di rojhilata navîn de dijî û di sedsalên bîstan de ye jî hîn bindest, ji dewletê bêpar û welatê wî perçe kirî ma ye. Ma gelo mayîna Kurd wisa bindest, dîl û kole di sedsalên bîstan de, sedsalên azadî û rizgariya miletan, ne tiştekî derî adet û rewşa miletê cîhanê ye û xelkê teva ye? Ma mayîna Kurd derî adet û van rewşan di çavên alemê ji wî re şermeke giran û nebaşiyek kirêt e? Heya em Kurd van şermiya han ji eniya xwe bişon, divê em jî xwe wek xelkê bikin, ango em jî bi rizgarî, serxwebûn û yekitiya Kurdistanê bighên. Lê em dikarin bighên wan armancên delal û hêja piştî west, xebat û xwûn rijandinê. Loma barê gihandina jîneke bi rûmet û rizgariyeke çak hinekî giran e, lê ne gelekî dijwar e. Jiber ku ji Kurd re jîneke hêja û bi rûmet divya ye, divê bi mêranî û xurtî bide ser reya xebatê. Lê ger bi awakî tevayî Kurd giş divên ji bo van armancan ên bilind karbikin, lê bi awakî xweser û pirtir divê xortên Kurd li ber van barên han rabin. Nemaze xortên xwendekar bîrwer û zana divê para wan zortir be.
Rabin destên xwe vemalin û têxin destên hev, bi yek dil, yek dest ji bo armanca rizgariya Kurdan û yekitiya Kurdistanê bi dilekî xurt, baweriyek têkuz û vînek polayî dest bi hişyarkirina milet û vejandina ziman û dîroka wî bikin, paşê bidin ser reya gihandina mafên xwe bi dilxweşî an bi zor.
Tevî vê divê em ji bîra nekin ku piraniya xortên Kurd di armancên miletê xwe gihîştine û baş bîrbirine. Ji lewre bi mêranî wekî şêra xwe ji bo xebatê amade kirine û di vî warî de roj bi roj bi gavine fereh ber bi cî anîna armancên xwe ên bilind di-

çin. Vê yeka han hêviya merov gelekî xurt dike ku roja azadiya Kurd pir nêzîk bû ye. Va ye şoreşa gelê Kurd li Kurdistana Îraqê mizgîniya vê roja delal tîne ber çavan.
Herçî xortên mayî jî, em gelekî hêvîdar in ku ew jî vê rastiya han bînin ber şavên xwe. Bindestiya gel û welatê xwe heya îro bi xwe giran bibînin, dest ji destkewtiyên xweser û xizaniyê berdin, baweriya xwe bi rêxistin û saziyên niştimaniyên demokratî ên rizgariya Kurd û yekitiya Kurdistanê ji xwe re kirine pergal, bînin qelsiyê, dîlitiyê û bindestiyê ji xwe daweşînin. Weke şêran destên xwe di destên birayên xwe yên niştimanperwer û welatparêz xînin û tev de xwe ji eftileftek û têkoşîneke çaktir re pêkbînin.
Ji bona azadî û serbestiya Kurd û rizgarî, serxwebûn û yekitiya Kurdistanê em pêşketinê dixwazin.

G ê n c o

---

## H e y   Q e h r e m a n   M i l l e t ê   K u r d

Hey qehreman milletê Kurd şerm e tu razî
Meydan didî dijmin û li qada te bibazî
Herçar terefan cîgehê tehqîr û tinazî
Ger heq tu nexwazî kî ye heqê te bixwazî
    Heyf e tu kurê Rustem û Guhderz û Silahî
    Îro tu di gundê beg û axa de felahî
Şerm û esef e,ger tu zarê xwe nxwênî
Raborî û şopa xwe li tarîxê nebînî
Bê qîmet û teqdîr çi ji ijmin re biçênî
Ta kêngî her û her bi vî rengî tu bimênî
    Heyf e tu kurê Rustem û Guhderz û Silahî
    Îro tu di gundê beg û axa de felah î
Deh sal e li ser hev hemî diljar û bê êş in
Sed Xanî û Hacı û Hejar wa ne li pêş in
Yekser weko Bêkes ku meraqa te dikêşin
Dora xwe nexwazin kî dizanî ku li êş in
    Heyf e tu kurê Rustem û Guhderz û Silahî
    Îro tu di gundê beg û axa de felah î

Destên xwe bidin hev, bikşin şax û diyara
Qêrîn bikin pişta xwe bidin lat û zinara
Lek lek bikevin Sehed û sînor û kenara
Lerzîn bikevî nav dilê xwû xwar û neyara
Heyf e tu kurê Rustem û Guhderz û Silah î
Îro tu di gundê beg û axa de felah î
Şerm e ji me re her wehe em di minê hev bin
Bindestê neyar her wehe bê gotin û dev bin
Ta kêngî wisa girtî û bin tarî û şev bin
Ta kengî şikestî û di nav leşk rê rev bin
Şerm e tu kurê Rustem û Guhderz û Silah î
Îro tu di gundê beg û axa de felah î
Bermayê Med û Sobar û kurê Nayrî û Sîtî
Roja şerê Hettin û Kerek xoş me tu dîtî
Tarîx ji me re dayiye zanîn tu egîtî
Îro tu metirs herdem û hemxakê Sovîtî
Şerm e tu kurê Rustem û Guhderz û Silah î
Îro tu di gundê beg û axa de felah î
Hêrzan bide destan tu li ser hev veweşîne
Qeydan bişikîne weko bendan biqetîne
Ev Dêwê sipî dijmin e, mêrane derîne
Wek Rustemê qellaş bi xwe heyfa xwe hilîne
Şerm e tu kurê Rustem û Guhderz û Silah î
Îro tu di gundê beg û axa de Felah î
Navdar e welatê te hemî merkezê ceng e
Herkes bi me zanî bi xwe Kurd Şêr û Piling e
Hawêr xwe temaşeke binêr gazî û deng e
Hey, hey qehreman milletê Kurd rabe dereng e
Şerm e tu kurê Rustem û Guhderz û Silah î
Îro tu di gundê beg û axa de Felah î.

C e g e r x w î n, Sewra Azadî, Şam 1954, rûpel 13

---

T a K e n g î E m ê K a r k e r û Cotkarê B e g a bin

Ev rengê biratî me navê ger timî wa bi
Hevsar me girêdayî bi kurtanê kera bin

Ew begler û axa û emê jar û geda bin
Ew renberê dijmin û emê rencberê wa bin
Ey Karker û Cotkar bes e dem hatiye rabin
Ta kengî emê karkerê axa û bega bin
Ta kengî emê hestiyê ber lingê sega bin

Ta kengî emê kole û riswa û ebîd bin
Bin destê mirovên wekî Bayar û Seîd bin
Ta kengî ji sînora wekî birc û kilîd bin
Ta kengî ji hev re hemî mêrxas û egîd bin
Ey Karker û Cotkar bes e dem hatiye rabin
Ta kengî emê karkerê axa û bega bin
Ta kengî emê hestiyê ber lingê sega bin

Çawa ku dizanin tu timî şerker û mer î
Deng da ye di şerqê de bi xwe fêris û şêr î
Îro tu çima wer biwe tirsok û newêrî
Perda gidiya ser xwe ve da, da xwe veşêrî
Ey Karker û Cotkar bes e dem hatiye rabin
Ta kengî emê karkerê axa û bega bin
Ta kengî emê hestiyê ber lingê sega bin

Perda gidiya carekê xweş rake hilîne
Çavê xwe veke guh bide hawar û qîrîne
Lingê teresan zû tu ji axa xwe derîne
Îdî tu metirs hemdemê cebarê te Çîn e
Ey Karker û Cotkar bes e dem hatiye rabin
Ta kengê emê karkerê axa û bega bin
Ta kengî emê hestiyê ber lingê sega bin

Pir şerm e ku em deh serî mîlyon nifûs in
Pir şerm e ku em abidê dînar û filos in
Pir şerm e ku em birçî û bê mad û mirûs in
Heyf e ji me re hemdem û hemxakê Uris in
Ey Karker û Cotkar bes e dem hatiye rabin
Ta kengî emê karkerê axa û bega bin
Ta kengî emê hestiyê ber lingê sega bin

Ta kengî bin zindana bibin hebsî û girtî
Dara li ser lingê mexin begçî û şirtî
Ta kengî bixun ev beg û axa me bi sirtî
Ey Karker û Cotkar bes e dem hatiye rabin.
Ta kengî emê karkerê axa û bega bin
Ta kengî emê hestiyê ber lingê sega bin

C e g e r x w î n, Sewra Azadî, Şam, 1954 , rûpel 40

# Diçim Hec


Nîveka tîrmeh çilê havînê dinê qijil bû kelkela germê,
Lebatên me sist alî hev nakin, gêj û şerpeze wek bayê termê,
Li bende tiram li pêş Bereda min xwe da sersî û tê rawestîm,
Dît komek zîvar bi pot û pertal li hev dicivîn ez lê dawestîm,
Bi şal û şapik û kum û destmal çi kal û ciwan riha wan dirêj,
Ser û çavên wan, dest û lingên wan,çek û cilên wan tev bûne qirêj,
Dema min guha da peyv û şora wan, kesm û durvê wan min zanî kî ne.
Diçûm nik wan welatnenas in heye ku hin jê bixwazin rêber,
Min çû silav kir halê wan pirsî,wan vedigerand bi kul û keser.
Berî her tiştî zînata neyar bi kul û hezrîng digotine min,
Ji peyva wana baş têgihêştim, ku welat çawan bûye ser û bin.
Min digote wan: Pismamên delal! ma hûn ji bo çi serî datînin?
Di welatê xwe bûn e sitemkêş vê bindestiya giran nabînin ...
Kesê bi rûmet ma qet dikêşî, bê ceng û lêdan vê zînata han,
Gelek bi tewat we divê xebat bi şev û bi roj ji bo Kurdistan.
Yekî rîtilxir bi ser û seke di nav wan de bû gote min: Pismam!
Te çi ji welêt hinde dipirsî, waye em hatin gihan erdê Şam,
Welat ma li wir em diçine Hec, da ferza Xwedê em bikin eda,
Me pez û dewar, hêstira bin bar, bazin û guhar di vê de da,
Niha em divê ji kerema xwe me bigerînî li hin ziyaret,
Heya ku Xwedê ji me bê rehmê em tev bi hev re biçine cinet,
Min lê vegerand bi dilekî kul û dengekî xurt: ho kalê xirfaz,
Ma tu dizanî bi çi awayî, ji bo çi mayî, qels û belengaz!
Te xwe bîra kir nema dizanî azahî çi ye, rûmet û namûs,
Neman li nik te rehên mêranî, te serî di ber koleyî papûs,
Te çavên xwe dan jiyînek teres dixwazî hemî pîs bijîn,
Vê kêmiya han ji bona însan pê razî nabin ne Xwedê û dîn.
Te diwazde mîlyon Kurdên belengaz li pişt xwe hiştin va ye diçî Hec.
Ne bi meqeresî, lê bi biratî divê digel te bikim şer û lec
Ma tu dizanî, kalê buhiştxwaz! Her salê çiqas di vê reya han,
Bi ramanek xar, xwe dikin zîvar malê xwe didin nezanê Kurdan,
Ji bo çi dewar, hêstira bin bar, bazin û guhar te hemî firot.
Xwe kir belengaz, zav û zêçên xwe te birçî hiştin kezeba wan sot.
Ev malkambaxî, west û dijwarî tev hemî ji bo ku bên Hecî ye,
Çûye Hîcazê û mala Xwedê gora Pêxember pev re dîtiye.
Ma çûna Hîcaz û mala Xwedê kînga dikarin te bikin aza,
Tu maye bindest, jar û gêj û mest wekî pepûkan nêçîra baza,
Ew diravê ku di vê didî, tu pê dikarî gelê xwe yê jar,
Ku ji nezanî hate girêdan bû ye pelîse ji bo kolîdar.
Ji nezaniyê, ji bindestiyê, ji rebeniyê bidî derxistin.

Divê şiyarbin ji vê xewa pîs, ji bo we şerm e îdî nivistin.
Te divê buhişt lê tu nizanî, di kû re diçin Buhişta rengîn,
Ji min bizane reya Buhiştê bi xebata rast xwe bike zengîn.
Keç û kurên xwe baş bi xwedîke wan bide xwendin da bibin camêr,
Li pêş neyaran serê xwe hildin doza xwe bikin wek piling û şêr.
Dema aza bûn di welatê xwe Buhişta dinê dikeve dest wan,
Bi serfirazî dikarin bijîn wek gelên aza bi şeref û şan.
Neyê bîra te pismamê delal ku Yezdanê çak kesên bi rûmet,
Bêpar bihêle ji Buhişta xwe ji teralan re bimîne Cenet.
Kesê nikare niştimanê xwe ji destê neyar bi derxîne,
Bê şik teres e divê bizanî, mirovê teres bawerî nîne.
éHezkirina welêt ji bawerî ye" holê dibêje Pêxemberê me,
Reya rûmetê ew pêş me dike dixwaze bilind bibe serê me.
"Her serbilindî ji bona Yezdan, ji bo Pêxember,kesê Bawermend",
Quran dibêje vê gotina han, bide bala xwe birayê lewend.
Çi gava aza bûn hîngê dikarin wê ferza Xwedê em bikin eda,
Bi dilekî geş, rûyekî sipî herin Hîcazê bo mala Xuda...

------- ------ -------

Vê gotina min cihê xwe digirt li ser çavên wan şopa wê diyar,
Serekî dirê ew kûr diramîn, serê xwe hildan tev dibûn şiyar.
Yekî ji wan digot: "Mala te ava derdê me nasî te xêra me xwest,
Roniyek hêja êxist serê me, çavê me vekir bi gotina rast.
Piştî peyva te hinekî ramîn ez şaşiyên xwe tev de dibînim,
Roma teresbav, bavê min kuştin, ji wê hîngê ve ez dilbirînim.
Lê ez çi bikim her şev li odê şîret dikirin Melayê Zirçol,
Buhişt û Dûjeh dida ber çavan, wî ji min şikand dest û ling û pol.
Holê ez şaş bûm xwe ji bîra kir tola bavê xwe, welatê bindest.
Lê ez son dixixwum bi rûmeta xwe ji îro pêve ji bîra nakim,
Divê vegerim ser şopa xwe de tola bavê xwe û welêt rakim.
Di nava welêt, dê raweşînim bi van destên xwe riça Kolîdar,
Divê bimire û bête kuştin, bête pelaxtin wekî serê mar."
Hevalên wî tev, bê kalê xirfaz sonda wî xwarin ku tev vegerin,
Ji bo azahî, ji bo serxwebûn xebatê bikin li pê bigerin.
Dema holê bû ji nav wan derket bi dilekî kul kalê rîtilxir
Pirtalên xwe girt dikir polepol, ji bo Hîcazê diçû balafir.
Digel ên mayî ez çûm garacê me bilêt birîn bi şahiya can.
Da bi rêkevin sibetira wê berê xwe bidin alî KURDİSTAN.

Osman S e b r î
"Derdên me", rûpel 9




Sal : 1

Jimar : 3

Salname : Newroz 1965

Biha : 2 D. M. ên Rojava

## Şoreşa Kurd û Daxwaza Awtonomî bo Kurdistana Nîvro (Îraq)

Xwendevanên delal!

Ev bû nêzîka sê salan ku milletê me ê reben, perîşan û bindest cenga azadiya welatî dike. Belê cenga li berxwedanê ji bona hebûna xwe li Kurdistana Nîvro bi hovberên karbidestên Îraqê re ên xwûnmij û keleş re. Di van hersê salên han de bi hezaran biçûk, mezin, pîr û xurt ji milletê me xwûna wan bi destên xwûnmijên karbidestên Îraqê hatin rijandin. Bi sedan gund û bajarên Kurdistan hatin şewitandin. Bi hezaran mal û xanî hatin sotandin. Bi tank, top, balafir û napalm Kurdistan qirçik bi qirçik hate wêrankirin. Hovberan weha bawerdikir bi van hovberiyên han şoreşa milletê Kurd tarûmarî hev bikin û ew careke din Kurdan têxin bin koletiya xwe lê belê hovberan xwe xapandin milletê Kurd bi Pêşmergeyên xwe ve bi mêranî nala pola li ber hovberên karbidestên Îraqê re rawestiyan. Li çarkenarên Kurdistan wana li vî alî li wî alî leşkerên dijmin dane revandin tirs û lerzîn xistin dilên wan.

Milletê Kurd her û her amade bû ku vê cenga han bîne dawî, gava ku karbidestên Îraqê di reya aşitiyê re daxwazên milletê Kurd bi cî bînin, ew jî ev bûn: Awtonomî Bo Kurdistan û Demokratî Bo Îraq bi Tevayî. Gava Baas hatin ser hukim wana soz dan ku ew van daxwazên han bi cî bînin. Wana bi vê yeka han dixwestin xwe bi rengekî xurtir amadeyî cengê bikin. Di dehê pûşperê (hezîran) de sala 1963 Baasiyan êrişeke hovberî bire ser Kurdistan û bi hemû rengekî wan dixwest Kurdan tevan qir bikin û wan ji rûyê dinê hilînin, ji ber ku ewana tenê Kurd in. Careke din gurîna cengê li Kurdistan destpêkir, careke din Kurdistan Bû qada ceng û şer. Careke din Kurdistan bû pilingekî ji pilingên agir. Kurdan serê xwe netewandin ji dijminê hovber re. Wan her û her sond û peyman xwarin ku ew her û her dê li ber hebûna xwe û mafên xwe ên millî. Durişmê qehremanê û pehlewan Pêşmerge bû:" Kurdistan Yan Jî Neman."

Emrê Baasiyan ên hovber ji ser hukim û hatina Selam quçeke nû di nava şoreşvanên Kurd û hukimetê dest pê kir. Careke din ceng hate rawestandin. Dan û standin di nava Kurdan û hukimetê destpê kir. Ev bû nêzîka salekê ku ev dan û standina han dirêj dike, lê hîn jî herdu negîhan tu vekirinê. Ne hukimet daxwaza Kurdan a Awtonomî bi cî tîne û ne jî Kurd ji daxwaza xwe dadikevin.

Ma gelo Kurd wê çawan ji daxwazên xwe dakevin, ew daxwazên ku bi hezaran goriyên mezin ji bo wan gorî kirine. Îro daxwaza Awtonomî ji bo Kurdistan û demokratî ji bona Iraq ji her rojeke din bêtir pêwîsttir bû jiber milletê Kurd beyî van herdu daxwazên han nikare mafên xwe bi rengekî bi rêk û pêk bi karbîne. Her mirovekî welatperwer hêvîdar e ku hukimeta Iraqê a niha bi hukmê Awtonomî û bi demokratiyê rûne, da dawiya vê cenga malmêrat bê. Lê gava ku hukimet bi van herdu daxwazên han rûnenê,bê gotin e careke din dê ceng destpê bike û hukimet bi destên xwe gora xwe dikole û ew dikeve goreke kûrtir û tektir ji a ku hovê Qasim û hovberên Baasî ketinê. Weha naskirina demê ji me re dibêje ku Kurdistan bû ye ji bo hovberan goristan, li şiyarbûna hêza niştimaniya Kurd û yekbûna wan.

S o r o

---

## K u r d i s t a n  û  S e r x w e b û n

Divê xwendevan, zana û welatparêzên Kurd li Ewropa û ên ku li welêt çak zanibin ku pêwestiyên (wezîfe) wanan ên mezin û giring hişyarkirin û têgihandina gelê Kurd bi doza serxwabûnê ye. Jiber her tiştî divê gelê Kurd baş têbighê ku bi her awayî hêjayî azadî û serxwebûnê ye û bi daxwazên xwe bawer bike. Di xebata gelêrî de bawerî ser li hemû reyên din distîne. Dema ku kesên gel an jî neteweki bi hevdin û doza xwe bawerbin; têkoşîn, yekitî û wekhevî dibe ramana wan û xebata wan bi reyek navkirî pêşve diçe. Dema ku kesên gel bi vî awayî hev ve hatin girêdan, nema hêz û êrişên neyarên wan dikarin vê girêdana niştimanî qels bikin û biqetînin.

Di sedsalên bîstan de merov bi çi baweriya xwe tîne? Divê em vê yekê gellekî xweş zanibin. Wek em dizanin, her demekê li gor çand û jîna xwe baweriyên xwe henin. Demên ber dîrokê (li ber bûyîna hezretî Isa) de ta vî sedsalê ku em tê de dijîn, bi hezaran bawerî hatine, çûn û diçin. Di her demekê de jî merovan di ber wan baweriyên xwe de xwûn rijandine û hewldane ku bighên dozên xwe.

Di sedsalên me de nema kes bi galgalan, baweriyên bê zanistî û tarî bawer û di berda xebat û têkoşînê dike. Ev sedsal dema rastî û şiyarbûna gelan e. Jiber vê yekê divê em jî her rasti-

yekê bi çavekî zanistî bibînin û bidin ber çavên gelê xwe û wan tê bighînin.

Herwekî ku gêtî (dinê) bû ye sê keriyan jî (kerîyê Yekitiya Sowyet, USA û ên bê hêl), di nava hemûyan de bo serxwebûna gelan yek rê he ye. Ev reya jî bi yekbûna gotinên zanayên cîhanê hatiye vekirin û mercên wê hatine danîn. Bi biryara pêşengên welatan: Divê di gelekî de mercên gelbûnê hebin û dewlemendiya welatê wî gelî besê bike.

Em werin ser mercên gelbûnê ( çawa gelek dikare bi navê netewe were naskirin): Di sedsalên kevn de gel bi yekbûna zimên, xwûn û ol dihate naskirin. Lê niha ev mercên kevnar hatine berdan û ên pir hêsan (gengaz) têne xwestin. Di vî sedsalê me de, divê bi tenê ew gelekê ku di welatekî de dijî, bi dîrokek kevn bi hev ve hatibin girêdan, yekitiya çand û ew kesên wî gelî bi dilsozî bixwazin bi hev re bijîn û pêşve biçin. Gava ev mercên jorî di gelekî de hate dîtin wek gelekî tê naskirin û gava ku dewlemendiya welêt jî têrî wan kir, bê gotin serxwebûn dibe mafê wan.

Gava ku em Kurdistanê tev gelê wê bidin ber çavan û hûr û kûr lê binêrin; emê bikaribin bi gengazî gelên din tev neyar û gelê xwe qana bikin ku nema gelê Kurdistan bê serxwebûn û girtina mafên xwe dikare bêdeng bisekine û destên xwe li ber neyar û gelên din mîna parsokan vegre.

Gelê Kurdistan mercên gelbûnê deq bi deq aniye cî, ger bixwazin mercên kevnar an jî ên pêşveçûyî bidin ber destan, em dîsa nikarin kêmaniyekê tê de bibînin. Yekitiya xwûn, zimên û ol bi tevayî nava wan de he ye. Wekî din jî bi dîrokek kevn bi hev ve hatine girêdan, di rojên kevn de ta îro herdem ji bo azadî û serxwebûnê li dijî neyarên xwe lec (şer) kirine û bi hezaran xortên xwe kirine gorî û şandine dilovaniya Xwedê (Şoreşa Agirî, Dêrsim, Mahabad û ên din û niha jî li Kurdistana Nîvro sê sal in ku xwûna xwe dirijînin). Ehmedê Xanê, Feqiyê Teyran, Goran û pir nivîskarên sergevaz li her alî Kurdistan çanda kurdî bi karanîne û derxistine, her waha "Komela Xwendekarên Kurd li Ewropa" jî dide xûyanîkirin ku Kurdên herçar alî Kurdistan dixwazin tev bijîn û xebata azadî pî li pî bikin. Gava ev rastiyên jor hatin ber çavan, gelbûna gelê Kurdistan bêguman dê bête naskirin.

Gava ku em bala xwe berdin dewlemendiya Kurdistan, emê bibînin ku ew li hemû cîranên xwe dewlemendtir e. Ne ew e ku bi sedan sal in ku welatê Kurdan Kurdistan bû ye kada şer û cengan û ta

îro nikariye xwe li êrişên XWAROKAN biparêze!!!... Ger em dewlemendiya Kurdistan û belengaziya gelê wê dibînin, em dilreşiya neyarên xwe derbekêra dibînin ku çawa welatê me li xwe re kirine korm (ciyê ku seg tê de dixwun) û sifre!
Ew Kurdistan ku bi rûnê (petrol) xwe sê gelan (Tirk,Ereb û Ecem) têr dike, ew welat ku tê de madenên pir biha wek baqir, fosfor, fosfat, antîmoan û ên din ku hîna veşartî di sînga xwe de diparêze, ew dayika bedew ku bi mêrgeyên xwe ên bêjimar dewar li ser sînga xwe xadî dike, ew can ku bi avên xwe ên sar û zozanên xwe merovan li ser çiyayên xwe dilşa dike û dîsa ew Kurdistan ku dikare her tiştî li ser xwe hêşin bike çawa nikare gelê Kurd gelê ku wê li hemû heyînên xwe bêtir û zêdetir hez dike nikare xadî bike û dewlemendiya xwe têrî wan neke?!... Paşê ev rastiyek seda sed e ku Kurdistan li gor rûniştvanên xwe pir mezin û fireh e. Gelo lê hûnê li herdu çemên (Dicle_Firat) ku di dîrokê de bi sedan dewlet li ser hatiye çêkirin, bajar hatine avakirin û bi bêrên wê dewlemend bû ne û niha jî neyarên me li ser leca çêkirina bend û tapanan re bêjin çi?... Bi kurtî merov bi êrişên XWAROKAN ku li ser welatên din ve derbas dibin, radiwirin û ta welatê me tên (İnglîz li Nîvro) dikare dewlemendiya welatê KURDİSTAN bide ber çavan.
Em dibînine ku Kurdistan tev gelê xwe Kurdan hemû mercên azadbûn û serxwebûnê aniye cî û Kurd û Kurdistan nema tên girtin û daxwaza wan a azadî û serxwebûn hatiye ber ḑerî û wek jinek ducanî ku êşa zarokanînê pê girtî bû ye, nema pêşiya zayina zarok dikare were girtin. Bîstina dengê zarokekî serbilind û hêja li ser destsivikiya xweşker(doktor) ma ye!!!...

Hemreş R e ş o

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

---

Serpêhatî Ş e r ê M ê ş a

Di mala vî camêrî de, piraniya wextê xwe yê panzde rojan, min bi mêşkuştin û bi mêşqewirandinê derbaz kir. Ez derewa nakim gava ez van tiştan dinivîsim. Binêrin çawan: Di rojên pêşin de ez di oda piçûk de, di ya nêzîkî dehlîzê de, radizam. Ev... jî, kurê S... yê navîn, hîngê 17 salî, li wê radiket. Di îşê bîleta de kar dikir. Lawikekî hurik, bê laş û gewde û rengne-

xweş bû. Lê di karê xwe de sivik, xortekî çav vekirî, mêr û kurperwer bû. Êvaran, berî ku ez xwe ve herim, ewî bi pirsên xwe û bi şev jî bi xirxira xwe ez gêj dikirim. Dinya Havîn bû û serê sibê, roj gelek zû hildihat. Berî ku roj derkeve, S... ji bo nimêja sibê radibû û nema dihat, Ev.. şiyar dikir ku here ji firnê, nanê taxê yê tenik bikire.

Gava Ev... ji xew radibû, derdiket û diçû, ez jî şiyar dikirim. Bi ser de jî, deriyê ku dikete rojhelat, vekirî dihişt; bi vî awayî bi tirîjên rojê ve tabûreke mêşan jî xwe davête hundir. Ji germiya tavê û vingevinga mêşan xew êdî mimkim nedibû. Ez, hîngê, radibûm, mêşkuja ku, ji êvarê de min xistibû bin doşekê, dikire destê xwe û bi mêşan diketim. Gava min dawiya wan tanî û ode bi laşên wan radixist, saet dibû şeş, şeş û nîv. Hîngê barbar, qîrîn û girîna piçûkên malê destpê dikir. Hinek diçûn dibistanê û hinekan jî li malê pev diketin. Yên hîn di dergûşê de, zarîna xwe digîhandin heya ezmanan.

G..., keça S... ya piçûktir, ne bi tenê bi vizvizî, lê qirêjiya xwe jî, ji xelkê malê re rahetî nedihişt. Du salî bû, lê hîn bi xwe nedikarî û di derpiyê xwe de dikir û paşê pê hev jî dikir. Diya vê ya reben, êdî nedizanî hema xwe pê mijûl bike an kar û şixulên malê rabe. Carna, piştî guharandina wê bi saetekê, gava dê, li metbexê xwarina xwe danîbû ser êgir û nedikarî xwe jê dûr bêxe, G... derpiyê xwe ji nûve dadigirt, paşila xwe bi zor dikişkişand, diçû metbexê û li dora dê û tencera wê ya li ser "papora" pêxistî ya li erdê digeriya. Diya wê dikir, nedikir, ew ji wê derê bi dûr nedixist. Rojekê, li ber çavên min, li metbexê, li kêleka biroşa ya li ser êgir, vê keçika ha, bêtirî saetekê dawa diya xwe girtiye, li wê maye û kûziya ye. Êdî, we bidîta, mêşên ku lê kom bûbûn, li ser siwar dibûn û laşê wê yê piçûk dinûximandin.

Ji bo merovekî ku li ciyekî welê hatiye dinê ku ne bi tenê paqitirê Kurdistanê, lê, yê cihanê ye; ji bo merivekî ku di piçûkahiya xwe de, li ber destê diyeke welê mezin bûye ku, ji ber paqijiyê, nexweşiyeke dil pê re peyda bûbû; ji merivekî ku di mala birayekî diktor de mezin bûye ku ji bo ku wan hînî paqijiyê bike, li nexweşên xwe dixist; ji bo merivekî ku bi salan ve li Swîsrê maye, ji bo merivekî ku ji piçûkiya xwe de, berî ku xwarinekê bibe devê xwe, mîna kûçika, ew bêhn kiriye, ev dêmen (menzere) û ev bêhn ji mirinê dijwartir bûn.

Lê, ji tirsa ku ez wan bixeyidînim, min xwe nedikir tu tişt nedigote wan. Û gava li ser sifrê, xwarin datanîn erdê, û G... şûştî û bi cilên guharandî, di hembêza dê an bavçe xwe de rûdinişt, bi xelkê malê re, bi hevre, bi dilxweşî, min zikê zikê xwe têr dikir.

Lê, berî ku xwarin pêk bê, ez diketim oda navîn, a me tê de dixwar, û bi saetan, min xwe bi kuştina mêşa mijûl dikir. Carna, min ji wan du, sê heb bi derbekê tanîn xwar; hîngê, wek "Pêşmergekî" qehreman, min ji S... an ji jin û zaroyên wî re digot: "Dilê xwe geş bikin, ka ji we re çend Ba'asiyên sekitî!....

Hîngê, li Şamê bi tenê rojnameyek derdiket, ew jî ya Ba'asiyan, Ba'as bi xwe bû. Her ro, piştî nîvro, S... hêjmarek jê min re tanî. Tiştên vê rojnamê yên baş ev bend bûn ku davêtin Cemal Evdinnasir. Nivîsandinên wê yên din nedihatin xwendin. Berî ku paldim û dest bi xwendina wê bikim, mideteke, mideteke ez dîsa bi qîrkirina "Ba'asiyên" xwe radibûm.

F... keça S... ya mezin, xudiya oda navîn, hez dikir ku ez xwûna wan li ser çerşefên textê wê yên spî birijînim. Lê min bi ya wê nedikir. Ji lewre, carna ji min aciz dibû, ji odê derdiket û diçû, li derve, bi dengekî bilind, dilmayîna xwe ji min re dida gihandin. Lê min guh nedidayê, ji ber ku, ji min nedihat ku ez wan berdim, ji destê min bifilitin.

Bi qelandina wan ne bi tenê laş, guh û çavên min rahet dikir, lê welê dihate min ku, ev mêşên ha, li ber çavên min, bi rastî bûne "Ba'asiyên" bi goşt û gewde. Bê hemdê min, bi kuştina wan bêhna min derdiket û dilê min pê geş dibû. Di vê midetê de, di şerê mêşan de, min du mêşkuj şikênandin...

"D e r k e t î"

Dr. N. Z a z a

P.H. : Di sala 1963, meha gulanê de Ba'asî, piştî ku navê min danîn ser "Lîsta reş" hatin ku min bigrin. Ez ji destê wan fifilitîm û berî ku birevim, bêm Libnanê, ez li Şamê du mehan veşartî mam. Di vê midetê de, ez bûm mêvanê 5 malên Kurdên camêr. "Çîroka mêşa " li mala S... derbaz bûye.

---

## K r o n o l o j i y a Nivîskarên Kurd li Kurdistana B a k u r

Weke ku hûn xwendevanên me ên delal dibînin, îro "Hêviya Welêt" bi rengekî nû û çaktir di destên we de ye. Bi biryara Komîteya

wê divê em mezinên Kurdan ên dîrokî bi xwendevanên xwe bidin naskirin. Li ser vê yekê ez jî dixwazim bi kurtî, li gor destkewtiyên xwe nivîskarên Kurd ên Kurdistana Bakur di rojên dîrokê ên kevn de bigrim ta sedsalê 18 bi we bidim naskirin.Herwekî ku di sedsalên 18 de ta îro gellek nivîskarên dengdayî henin jî, pêwîst nabînim ku navên wana di vir de bidim der.Ger hûn rê bidin, emê wana jî ji dîrokê re berdin....

1- Melayê Cizîrî: Di sala 1002 de li Cizîrê hatiye gêtiyê (dinê). Helbestvanekî panteist e. Hevalê Şêrguh,apê Selaheddînî Kurdî, bû. Selaheddînî Kurdî jî pê gellekî şakir bû û lê per hezdikir. Li îran û Rojhelata Navîn geriye. Zimanên erebî,farisî û tirkî xweş dizanî û nivîsarên xwe hemû bi kurdî dinivisî.

2- Elî Herîrî: Di sala 1009 de li gundê Herîrê bû ye. Herîr yek ji gundên Bitlîsê ye. Di dema wî de Merwanî karbidestên welêt bûn û Diyarbekir ji xwe re kiri bûn Serekbajar. Hemû helbestên xwe li ser evînê nivisîne û diwanek xweyî mezin he ye. Di sala 1079 de çû ye dilovaniya Xwedê.

3- Feqiyê Teyra:Di sala 1302 de bû ye û 1375 de jî çû ye dilovaniya Xwedê. Yekemîn helbestvanekî ateist e di dîrokê de. Ta wê demê kesekî mîna wî nehatibû dinê.

4- Melayê Batê: Di sala 1465 de çû ye dilovaniya Xwedê. Bi helbestên xwe ên olî û bi mewlûda xwe deng daye. Di dema derebekan de dijî. Li gundê Batê bû ye.

5- Şerafeddînî Bitlîsî: Di sala 1542 de hatiye dinê. Bi nivîsandina "Şerefnamê" deng daye. Di sala 1594 de dest bi nivîsandina wê kiriye û 5 Newroz 1597 de dawî aniye. "Şerefname" 5 keri nin û di sala 1862 de li Petersburg bi destê endamekî Çarî hatiye wergerandinî frensî. 3 pirtûk in û 2500 rûpel in. Keriyê yekemîn, çêla dewletên Kurd ên serbixwe dike. A dudyan,çêla dewletên ewtonom û a sisyan, qala begligan û ên 4-5 jî bi dirêjayî qala jîna eşîret û rewşên Kurdan dike.

6- Ehmedê Xanî: Di sala 1591 de li gundê Basîtê bû ye.Basît di navbera Bitlîs û Cizîrê de ye. Gava çel salî bû "Mem û Zîn" nivisî ku di dinê de deng da ye. Ew pirtûka hemû helbestî hatiye nivisîn. Her waha ferhengek kurdî-erebî jî pêk aniye ku 2000 gotin tê de hebûn. 10 salan di Seraya îran de ma ye û tasawufa wan çak hîn bû bû. Bi xwe hezkarê mizgeftan bû û gava ku vegeriya Basîtê bi perên xwe dibistanek vekir û bû mamostayê wê. Xwediyê rihekî welatparêz bû. Bi hêla olê ve jî

helbestên lîrîzm dinivisî û bi hêla tasawufê jî pir kûr û pêşve çûbû.

7- İsmaîlê Basîtî: Di sala 1642 de li Basîtê bû ye û sala 1707 de çû ye dilovaniya Xwedê. Nivîskar û helbestvanekî gelparêz bû.

Xwendevanên delal!

Ez pir ber xwe dikevim ku min nikarî ji vê bêtir bi firehî binivîsim. Hêvîdar im ku hûn ji me re zanînên xwe binivîsin û ger ku şaşiyên min he nin, divê hûn, bi kerema xwe, me re ronak bikin û me bi alîkariya xwe destkewtî bikin.

Hemreş R e ş o

---

Çend Helbestên Biraderan:

## R o j î  R e ş î  Ş e ş î  E y l û l

Paş cengî cihaniy yekem ta şorişî çardey Temuz 1958, delê Kurd li Kurdistanî xaro (İraq), li pênawî sendinî mafe zewtkirawekanî de, bi gelêk raperîn û şorişî xwênawî helsa.

Yekêk lem raperînane raperînî şeşî Eylul 1930 bû li Silêmanî. Lem roje de gelî Silêmaniy nebez bi gewre û piçûkewe wirûja û ser şeqemekanî şarî girt. Hemû pir bi dem ḥawaryan ekird:"Ême Kurd în, Kurdman ewê".

Belam hikumetî koneperistî İraq bi han û yarmetiy İngilîzekan bi gulley tifeng û reşaş kewte giyanî xelkeke. Bi dehan kujran û birîndar kiran, deha gîran û xirane bendîxanewe.

Kecî paş em kujtare hendêk li noker û bikirêgîrewekanî ew dewre helsan û çûne Bexda, bo kirnûş birdine berdemî Feyselî yekem.

Pîremerdî xwalêxoş bû ke ew deme kurdayetiy ekird, derbarey em wefde bi beriye li Kurd û Kurdistan em helbestey xwarewey wit,

Wefdî Kurdistan, milet firoşan
Herze wekîlî şarî xamoşan

Çepkê li gulî baxekey sera
Ke bi xwênawî lawan awdira

Biybene berdem erşî İraqî
Bilên yar baqî hem suhbet baqî

Perde w taray sûr berin bo Emîr
Bilên diway kuştar hêşta toy dilgîr

Dek xecalet bin li rûy mehşera
Ême xakî xem ekeyn bi sera

Ew e ew erşey bi xwên gulreng e
Sucdey bo eben hîç nalên neng e

Kurd nabrêtewe xeyalî xawe
Biratî necat bi xwên nûsra we

Min rengî sûrim boye xoş ewê
Mijdey şefeqî lê der ekewê.

Kemal F u a d
(di kovara Kurdistan de, 1961)

---

Bi derbederî ya li malî xom
Li xakî Ereb li Îran û Rom

Kok û poşte bim, rût û recal bim
Koşkim de-qat bê, wêrane mal bim

Danîşim li ser textî xunkarî
Ya li kolanan bikem hejarî

Azad û serbest, şadan û xendan
Ya zincîr li mil li suçî zindan

Kurd im û li rey Kurd û Kurdistan
Jiyan li pênaw, giyan li ser destan

Bi kurdî ejîm, bi kurdî emrim
Bi kurdî edem weramî qebrim

Bi kurdî dîsan zînd û eb'mewe
Lew dinyaş bo Kurd têhelec'mewe.

H ê j a r
(K.Fuad di k.Kurdistan de,1961)

---

Xwendevanên delal,
bi biryara komîta kovarê divê em virhada çend rûpelên kovara xwe ji birayên ku zaravayê Soranî dipeyivin veqetînin ku ev jî pêşketinek çak e. Jiber ku birasoranên me bi latînî nizanin binivîsînin, em ji bo nêzîkbûna herdu zaravayên kurdî vê yeka han pir pêwîst dibînin û niha de dilxweşiya xwe pêşkeş dikin.

---

S e w a ş ji X w e d ê re

Hatim dinê, bi kurdî;
gellek s i p a s.
Dijîm, bi kurdî;
berxwudar bî.

Şiyar bûm, bi kurdî;
Sewaş ji TE re!
Dixwum kerşît, bi safî;
Dewê tirş bi tas..
Dimeşim bi lingên xwasî,
Dilxweş im, ya Rebbî.
Paşê bimrim bi kurdî,
Sewaş ji TE re!

Hemreş R e ş o

---

## M a r ş a X o r t ê K u r d a

Rê vekin! Vanê ku tên xortê Kurda nin!
Me mil dane hev mîna çiyayên dûman.
Dengên me mîna çemên xuşa giran nin.
Rê vekin! derket pêşiya ordiya can!
Em davên ji weten emperyalîstan!..

Em pale, gundî, em xwende, em proleter,
Hember dijminê merovan em sîper!
Em hezkarê edlayî, medeniyetê.
Bazdin kedxwur, zalim ji ber lingên Kurdan!
Em davên ji weten wan kolonyalîstan...

Girî, belengazî û koletî bes e,
Xwûna kalikên me li me mêze dike;
Ewê ku nakevin nav şoreşê ne kes e!
Rê vekin, rê derkevin! va şerek tek e.
Ji weten em davên kolonyalîstan!

Dîroka me a birêz herkes dizanî.
Hejar bibin, cî bigrin nik şerên biran!
Ji berê de îşê me bûne mêranî...
Bazdin mustemlekar ji ber lingê Kurdan!
Bavên ji weten van emperyalîstan;..

Hev civîne Mahabad, Erbîl û Bitlîs
Mîna zimagên mêrxas li pişta Sûphan.
Kalîna berxan ket dû dengên şêrên sîs!
Rê vekin, xof bikin, tê ordiya Kurdan!
Em davên ji weten kolonyalîstan!..

M. B o r

---

## N e w r o z

Sibê liviya bajarê Mixribiyan;
Çawa çemê wê biharê digirmiyan,
Usa qûrtîn ket nav taxa,kûça,banî:
Bijî! bijî!.. kî bijî? bijî AZADÎ!

Derê baxçê biharê ve bû hêdîka;
Gul,rihan,newroz dihêcînin bêcika;
Bilbil distrênin cem xezal û berxika...
Bijî! kî bijî? bijî omida daka!

Dewra berê Kawa şoreş saz kir hember
Zaliman û miftexwuran. Mezin bû şer.
Millet pêl pêl ket dû Kawa mîna ordî;
Keniyan kole: Bijî, bijî AZADÎ!

Kewa hesinker, kawa emekdar; na, şer.
Xwêdan ser eniyê de dimeşî nêr e nêr.
Xelk dimeşî bê rim,bê mertal û bê şûr...
Bijî DAS, Çekûc! Bijî xwudana kûr!

Dewra berê, berê; wê roja biharê
Li ezmana qertelek digerî sibê
Û erdê hezaran qertel çûn Serayê!
Hevalno haydê! Bijî xelkê mîna bê!..

Egîtek erdê ket ber kaniyekî:
"Min derbasbin! Guh medin birîndarekî!"
Ket nav, nav ava xwûna germa nerma sor...
Bijî! Bijî daîmî qurban! Bijî dor!

Lanet Sultan Zuhak! Lanet sultanan!..
Millet çilmisand sehf baş text û tacê wan.
Dil, dil nav baxçê biharê de,biharê de...
Bijî rihê Kawa di Kurdistanê de!

Îro çawa berf dihelê serê çiyan,
Usa jî kolonyalîst ji welatan
Tên raqetandin... Torinên Kawa hejarî.
Bijî, bijî her K A W A her milletî!

M. B o r

---

## X W A R O K

Dixwestin bi heval bin
Yek ji wan mîh ê din gur.
Tev bijîn wek bira bin
Wekhevî kirin destûr.

Bi telaqan sond xwarin
Soz û biryar hemû rast
Her awayî bin bar in
Ger ji sozê vegerin...

Mîh diçêrî têr û xweş,
Jibér welat ê xwe bû,
Doş dibû newal û kaş
Ber ku neyar heval bû.

Netewitî dilê gur
Xinizî û bê sinçî,
Bel dikirin çavên sor;
Bû raman nêz û birçî!.

Li ser avê kirê taw,
Got "şêli bû avzelal".
Ew biratî kire kaw!
Jîn bo mîh nebû helal...

Mîhê gotê "ho dilreş!
Tu zanî hustî kurt im,
Bê xistina lingê pêş
Nikarim avê vexwum...

Hêvî dikim kor nebî,
Av dimeşê serberjêr.

Berve te nê şêlitî,
Diranên xwe meke kêr!!."
Gur bersîv da kurtebir.
"rast dibêjî ên berâv
Lê nabînî dûr û sir.
Ger jêr bûma ho bêbav!"
Guhnedayê bê gotin,
Mîh çengand rast û çep;
Dil kezewê wê sotin
Çav ji hev û ling jê rep.
D i v ê em b î r a n e b i n
X w a r o k ê n me gurb i ra!!!....
T u c a r a n rast nameşin,
Ewana G U R, G U R bav in!!!!....

Hemreş R e ş o

---

## A x a W e l a t

Ax,ax! Axa welat, Şîna xebat, Tu bû ye par Bin destê neyar!..
Tu, Evîna me, Evîna giran,
Ji bû ye bar Bo herçar biran!..
Dayika bedew, Li ber çavên me
Dest avêtin te!
Nizm bû serên me,
Em man e bê ar!
Axa welat î, Kada felat î,
Hatî istiran, Bi xwûna lawan!
Niha vedirşî, Nêm û xwûna me, Li Şêlmo û Batman!..
Ew petrola nêm û xwûn
Neyar kirin har û dîn. Pê têr dikirrine,
Tank, çek û balafir.
Li ser lawên te de, Dikine ew zire zirr!..
Daka Kurd! Meçirrîne sîngê gewr, Bitewite wek berê!
Veşartîbe wek cewher,
Em hatine ber Serê!
Me dane hev herçar dest
Tu şa bibe, bigre şert. Bi mîlyonan rûniştvan,
Dijîn ser te pehlewan, Kurê te ê serkevin, Ev rastî ye seda sed...

Hemreş R e ş o

(71)

# Wefda Kurdî

Dibêjin wefdeke kurdî!
Li ser zînat û sitemkariya Ecem
Nivîsareke dûr û dirêj,
Li Parisê daye sekreterê Heyeta Umem!..
Tê de bi ser û ber kiriye
Çêla biserhatiya Kurdên Ciwanrû,
Ku hinde jê hatine kuştin...
Jin û zar û zêç ji ber lingan çû...
Ma kînga heq têtê dayîn.. Ho?!
Heke xwedî heq ne dest bi dar be,
Ola wî kirin û mirin,
Dilpola û gurçikzinar be.
Di navbera daxwaz û daxwaz de,
Ferq heye ji erdê heya bi ezman
Reben û parsek tên qewitandin
Her dem hatiye nasîn heqê xurtan.
Qelsî, reya mirin û wenda bûnê,
Mirinek kirêt, wendabûnek bê doz...
Çi gelê xwestiye aza bijî,
Xwe daye nasîn bi zaravayê Bahoz...
Heke we divê heqê xwe bigrin,
Zûka destê millet bighînin dar.
An na, dengê nayête bihîstin,
Dê bimînin şerpeze, bindest û bêwar...
Agirê serxwebûna milletan,
Divê xebateke xurt û gelêr û yekrû.
Tenê bi pifkirinê vênakeve,
Jê re dixwaze gellek êzing û ardû..
Ardûyê vî agirê han,
Divê em bin, ho.. Kurdên camêr û bi rûmet!
Mirin û heps û birçîbûn..
Divê ji me re bibin wek cejn û dawet.
Gava me xwe ji vê da paş,
Dê çawa dengê me bighê cihan?
Bê şerr û gelş û qirrên û lêdan,
Lingê me naçe nav axa Kurdistan.
Cihê ku îro em Kurd
Ji bo Ciwanrû bibin piştmêr û gazî,

Bi ser Ecemên guhpêl de bigrin
Bi top û tifing û şûrê tazî.
Ne herwekî qels û rebenan,
Tenê çav bidin peyv û gilî û gazin..
Mehder û alîkarî û piştmêriyê!..
Biçin ji zorker û rêbirran bixwazin!..
Ma kî ye ew civata milletan?
Ew in şandiyên çend dewletên kolîdar,
Wan li dora xwe civandine
Peyayên milletên qels û reben û jar.
Herwekî ew dixwazin
Ji xwe re hin qanûn û rêzan danîne,
Naxwazin rastiyê binasin
Ola wan, zor û zînat û pêkarîn e.
Rê û doliwa cîhanê,
Goreyî kar û daxwaza xwe digerrînin!
Çi rast be, çi derew be,
Milletên biçûk li pê xwe radikşînin...
Bi navê heq û dadimendî,
Tova şerr û zînat û gelleciyê çandin..
Kesê ku qîma xwe pê nanî
Bi ser de gulle û bombe barandin!..
Heke ew ne welê ye,
Çawan Firensiz bi tank û top û tifingan:
Welatparêzên Cezaîrî
Dikujin û dipelçêqîn di bin lingan!..
Ma ji bo çi ew koma rêbirran,
Dest nade ber darê sitema zorker?
Heke wê qanûn û rêzan hene,
Çima danade dergehê kuştin û şerr?!
Ma ne ew Koma qeşmer bû ku,
Leşkerê xwe dişand şerrê Korya?
Da ku bi zora dar û tifing,
Wan têxin bin destê maldarên Emerîka.
Heke ranebûna Maw-Sî-Tong,
Serdarê Çîna gelêr, ew pilingê zer;
Dê Korya tev bibûna Kolî,
Tê de aza nediman tu cih û dever...
Ji hêla din Hind-Çînî,
Dema xwest bibe serxwe û aza;

Bê ku bazgûrî kesî be
Ajote ser kolîdar wekî Baza.
Qet nedihate bîra wan
Ku tu rojan bi lavayî û bergerr û gazin,
Ji wê koma rêbirr û nemerdan
Serxwebûn û azadiya xwe bixwazin.
Bi şerrê Diyan-Biyan-Fû,
Û berî wî bi gellek şerrên xwûnrij û giran..
Şikandin serê kolîdarê pîs,
Bê nav û rûmet kirin di nav cihan.
Ji hemî milletên bindest re
Rave kirin reya serbestî û azadî,
Ku bê kuştin û mirin
Kes nagehê warê rûmet û şadî.
Berî vê bi çar sed salî
Zanayê me Kurdan Ehmedê Xanî,
Reya felat û azadiyê
Ji gernasên îro pirr çêtir dizanî
Dibêje: nedin bîra xwe ku,
Bê ceng û têkoşîn û sergermî..
Ma welat tên standin,
Bi bergerr û lavayî û zarnermî?!..
Şerm e ku em xwe deynin,
Bazgûrî zorkeran bin û bibazin.
Divê me dar bi dest be
Her bi serê ço heqê xwe bixwazin.
Heke em dirêjî mirinê nekin
Wek lokê har û hêc û girgîn,
Çawan dê bikeve destê me?
Welat û rûmet, serbilindî û jîn..

---0---

Ho... xortê Kurd ê hêja!
Hêviya gel û welat û welatiyên min..
Rabe bi merdî serî hilde,
Şerm û fihêt e ji bo te êdî nivistin.
Kurdistan, wa ye gazî te dike,
Bi rû wek şêran biçe hewar û gazî..
Bavê te, dema mirinê
Ji te re hişti bû şûrekî tûj û tazî..
Lê tenê ji ber qelsiya te
Wî şûrî girtiye qirrêj û pasik û jeng!



INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHEQUE

Di nava gelên cihanê de
Tu tenê ma ye bê nav û nîşan û deng..
Wekî mêran dest bibe xwe
Wî şûrî hilde rast û çep daweşîne,
Bend û kemendan di dest û lingên Kurd
Pê bibirre û bi carekê bişkênîne.
Guh mede gotinên qelsan
Dê wek tiryaq laşê te bitevizînin,
Hevaliya wan şermisarî ye
Dê rehên mêraniyê di te de bimirînin...
Derdê te mezin; lê ne bê derman e,
Birîna te bê teş e, gellekî kûr...
Ji min bibhîse şîreta biran
Te nînin derman, bê tifing û şûr.
Heke neyarê me yê zorker
Çiqasî xurt be, xudan keştî û leşker,
Bê şik dê zora wî biçe,
Heke di nav me hebin sergevaz û rêber.
Ez bawer im ku hûn xortên Kurd,
Li benda kêsa xwe mane rawestî...
Dê hemin serê xwe hildin
Qet bi we nakeve ev qelsî û bindestî!.
Ez bi hêviya wê rabûnê,
Bûn sî sal naxwazim darê xwe bavêm;
Heke bi rûmet û azadî ne bû,
Ez vê jîna derbeder û bindest navêm.

Osman S e b r î
"Bahoz û çend nivîsarên din, rûpel 54,1956

---

## H o s i y a   M i n (Wasiyet)

Wê çaxa ez mirim,
Hûn bi dil û gurçikên min li Silêmanî tiştekî bikin;
Ne bigrîn , ne jî bitalin...
Ez hejar im, diravê min tune ye;
Lê kincên min bavên bin lingan;
Rêwî bila pêlî wan bikin û wilo derbas bibin...
Ser binivîsin tenê:
"Vana çekên wî mirovî nin, ê ku geriya dû weten
Bê teresî, bê zalim, bê xwûn, bê girî..."
Meyîtê min bişewitînin ser çiyayê Siphanê;
Xwaliya min bavêjin ber bê, çarmedor:
Ew bila rind bela bibe li vî welatî...
Ne bigrîn, ne bitalin û ne jî biqîjin!
Qatî bikin, cixarekê bikşînin tenê...
Nêzîkiya gihêştina zeviyê,
Ronahiya çavên min bikin bin biyekî
Di LOR de kêleka kaniyekê.
Rojên havînê hêlûna teyra dorê hebin rind e,
Ger tunebin, ez çi bikim, hûn çi bikin?
Gazî Xwedê nebikin!
Ji Îsa hezar û nehsed salî.. şûnve,
Tu tişt nebêjin wê daka min dîn re...

M. B o r

---

Çîrok

## D i z   û   L a w i k

- Gelo ez vî zêrî jî bigrim an na?
Payîza paşin, baran hûrik hûrik dibarî...
Nîvê şevê derbas bû bû. Tariyeke giran û kûr bajar vegirtibû. Tarî sultanê vê gavê bû. Çavan çav nedidît. Ezman û erd gîhabûn hev. Sînor di nav de nemabû. Banî, dîwar, pencere, derî, darên tîpguhaz (telgraf) û dûrbîsk (tilefon), baxçe.. hîç, hîç tiştek nedihatin naskirin. Kolan û şeqem herkes bûn; tenê car li caran dûr ve an dengê dîkekî, an jî qîjîna pîpika payerên kolanan dihatin û di nav xûşîna baranê de diheliyan, wenda dibûn. Ox, xûşîna baranê, çiqas xweş û delal bû!.. Nizanim, gelo we di bin baranê de li deştekê rêwitî kiriye, an na? Baran ça-

wa deştê de , ser pelax, giya, qûm û keviran de xûşîneke kûrî giran derdêxe; Werga jî niha vê demê de ser ban û nav şeqeman de dixebitîn... Ger helbestvanek, xwedî mêjî, li wirderê bûya, wî dê bikarîbûya derbara zulmetê de helbesteke bê mirin biafiranda, ger wênekarekî (resam) anacî mezin bixwesta bedewiya zulmetê bimala, divyabû ew di wê bîstê de li wêderê bûya; ger nivîskarekî bixwesta straneke nemir, dengekî bê hempa biafiran de, divyabû ew di wê gavê de li wê şeqemê bijiya, bigeriya... Bin baranê de, nav xûşîna baranê de, merov dixwaze her derd û kulan bîra bike!.. Ax!..

Di wê demê de, ro, merov û qûrtîn; şev, tarî, bêdengî û xof xwediyê bajarê Diyarbekirê bûn: Êvariyê re pale ji kargehan û îşxanan derdiketin, diçûn qehwexanan, an jî malên xwe. Di dema karberdana kargeran de çerçiyên bazaran jî dev ji xebatê berdidan. Gava mixirbe diket erdê, esnafan dûkanên xwe kîp dikirin û zûka diçûn malên xwe, ta zelalbûna sibê ji xaniyên xwe dernediketin... Saetekî-du saetan dû şîvê re, qehwexane jî dihatin girtin... Êdî dem dibû dema kerhesî û xofê. Di kûriya şevê de carcaran di şeqemada an riwêlek diteqiyan, an jî qîjina dû-sê serxoşan bilind û wenda dibûn. Şevê diz, firar. qaçax û şoreşvan dixebitîn...

Merov çi dikare bike? Dinê bi dor e û bajarê Diyarbekirê jî kevn e, xwediyê van edetan in, ên ku hakimê herkesî nin! Mesela diz dikarî şevê dûkanekê talan bike, lê sibê divê ew biçe mizgeftê; zabit aliyekî segman dikotan, aliyê din digot:" qiymeta merovan bizanin". Tacir li vir:"Pere her derîkî vedike, her tiştî dikare bikire." Li wêderê: "ez mû'mîn im." Mela mizgeftê de pesnê dide namûsê, lê piştî ji mizgeftê derdiket, diçû ba jineke bi mêr. Ev diyarbekir bû, bajarekî din bû! Ew tijî çîrok û efsane bû.

Dengbêj dinaliya; dayîkê dilorand; birçîbûnê û belengaziyê di kolan û şeqeman de hesp dibezand. Ereba, Tirka, Kurda, Ermaniya û Yahudiyan li hevdin dinêrîn. Papaz û keşeyan bi dizî li dijî mela û seyîdan dipeyivîn; mela û seyîdan eşkere dev davêtin keşe û zindiqan. Kîjanî ji wan rastî digot? ev nedihatin nasîn! A rast herdu alî jî bêheq bûn... Rustemê Zal demekê di van şeqeman de geriya bû. Bi gotina pîrikek çîrokvan, Kerem û Eslî jî carekê li ber derê vê "Kerwanseraya mezin" raste hev hatibûn; ewna ji hev din re keniya bûn...

- Apo, gelo vî zêrî jî bistînim, an na?
Apo,bi kilîta inglîzî dûkana zêrfiroş vekiribû;lê nedikarî deriyê dudyan û ê paşiyê vebike. Dixwest ku wî bêdeng bifirîne, lê ew jî nedibû. Bi alîkariya kêreke mezin û tûj navika wî derî, ê darinî, qelaşt. kuneke girs vekir... Lê heyf ku dîsa Apo bi xwe nedikarî têkeve hundir: Laş û givdê wî qelaw bû bû. Jiber vê divyabû Memo di kunikê re derbasî hundir bike...
Niha Memo di hundir de tiştên biha û barsivik berhev dikirin...
Apo li ber dêri dipûnijî û dida serhev: "Ev diziya bêrdar û pir çak nebû, ger ez têketama hundir û lawik li derve bima, minê bikarîbûya bêtir zêz bicivanda serhev..."
Ew çel,Memo heft salî bû. Berî salekê rastî hev hatibûn: Sibekê li kadekê çar-pênc zarokan dora Memo girtibûn û dest bi lêxistina wî kiribûn. Bo çi? Wî jî dixwest tev wan gok bilîzta...Di nava gelecê de,xafilda Apo derket, bêdeng Memo hembêz kir û bire mala xwe. Ji wê gavê virde herdu tim li ba hev man. Herdu jî bê bav, bê dê û bê malbat bûn. Ne hevalên çak û ne jî dostên xwe hebûn. Berê Memo geh bi parsê, carna jî karkirinê dema xwe derbas kiribû, niha bi tevayî ketibû bin destên Apo û bûbû peyayê wî. Apo çawa digot û dixwest, wî jî wilo dikir. Êdî zarokên din ji wî ditirsîn û dest nadavêtinê. Hineka jî dixwestin bibin hevalê wî: Bo ku Apo wan jî biparêze. Ev Apo bû, ne kesekî din bû!..
Apo dizekî dengdayî bû; Bi gotinan bi kêmanî deh salan di girtîgehê de mabû. Fêlbaz, Xwûnsar, zalim bû... 'An jî ew ne wilo bû, lê navê xwe welê derketibû. Wî li delec û danhevan hez nedikir, dûr direvî. Lê gava dikete nav şerekî,bê gotin xwûn dê bihata rijandin. Tim du xençer û şeşarek xwe re digerand. Wî re hinekan "Apo", hinekan jî "Reîs" digotin. Navên wî ên din "Xwûnrêj" û "Şeytanê kûr" bûn.
Kesekî salê wî rind nedizanîn. Carê şênî ew dûrî xwe xistibû,êdî wî divyabû herdem li dijî qanûnan têkoşîna xwe dom bike.
- Çiqas zêr henin, giştika kom bike. Her dolawekê veke. Ew tiji zêr in... Şaş mebe. Metirse. Ez li vira me...
Wî dixwest Memo bike dizekî anac. Carcaran şîret lê dikirin,şert û şirûtên diziyê pê re digotin û dinêtirandin. Kesî nedikarî bêje gelo ewna herdu dost in an na? Wan bi xwe jî nedizanîn. Hevgirtinek nedîtî û mezin di nava wan de hebû.
Apo xwe rind dabû ber deriyê pêşin, ê ku nîv vekirî bû. Carcaran bi tenê baranê devrûyên wî şil dikir.
Baranê zêde dikir. Brûsk vêdiketin; xafilda, nişkeva ronahiyek mezin derdiket. Bejn û balaxa Apo dihatin dîtin. Simbileke girz

û tilxir li ber pozê wî bû. Bê rîş bû. Rûyê rastê de şopa birîneke dirêjî kûr hebû. Pozê wî zêde pehn bû. Eniya wî teng bû. Di bin şewqekî kevn de porê spî û kurt dihate dîtin. Bejneke dirêjî girs di nav saqo, kurtik û delingdirêj de bû... Gimoniya ewran hat. Tariyê dîsa dorhêl vegirt. Bona diza ev şeveke baş bû: Bin baranê de polîs û payer tewr nagerin...
Dilê xwe cixareyek xwest, lê tedbîr divyabû. Difikirî: Nîvê emrê wî ê pir derbas bûbû. Kalitî di bergeh de xûyanî dikir. Ta îro tim nav qilêrî û qevşiliya civakê de, nav tariyê de dixebitî; tiştek dest neketibû. Mana emrê waha çi bû? Pir caran,biryar dida, ji diziyê enirî bû... Kargeh û îmalatxanan de li karekî digerî, lê gava kardaran li nûfûsa wî dinêrîn, kar nedidanê. Wî sond dixwar, "Bawer bi min bikin, ez êdî merovekî rind im. Naxwazim diziyê bikim... Ez peran naxwazim. Tenê ciyekî raketinê û nan. Soz, ezê ji palên din bêtir bixebitim..." Kardaran kin dibirîn: "Kar tunneye."
Hêdîka kuxiya:
- Melezîne, Memik... Gişt zêran kom bike...
- Xwûnsarî û bê xofî, yek, xebat û tendurûstî,didu; Bawerî û...
- Kurro, tu çi dibêjî?
Dengê kenê Memo hat:
- Fêlbazî, sisê...
Apo dixwest zûde îş xilas bike û bi silametî ji vê kolanê derkeve. Dilê wî de giraniyek peyda bû bû. Wî jî nedizanî çima?.. Lê nedixwest ku lêwik re bêje û wî bitirsîne. Bi destê xwe ê rastê ew dilopên baranê rêş kirin, ên ku ser eniya wî kom bû bûn.
Hêdîka şîret kirin:
- Dema û dora galegalan nîne...
Memo guh neda gotina wî; mîna nav lîstikeke xweşî delal de bû; ji dilxweşî nedizanî çi bikira. Ve ne cara yekan bû: Ta niha gellek caran Apo re xebitî bû, tirs û nezaniya wî wenda bû bûn:
- Vana şertên serketinê nin, gotinên te nin... Tara,tara,tîtara!..
Apo, min bazingekî pirr bedew dît. Ger daka min hebûya, minê ev pêşkeşî wê bikira. Tara! tara! çi delal! bi wêneyên gulan hatiye neqişandin. Ox, kêrekî zêrîn... Apo, tu êdî wan kêrên xwe bavêje. Ewna bê biha û bê qiymet in... Vê bigre...ho? Binêre, va çiqas zexm û rind e! Te dît, an na?
- Ez benî, ez li derve me, tu di hundirdayî, çawa dikarim bibînim... Zû bike!
Memo kêra zêrinî di kuna derî re dirêjî Apo kir:
- Hin! hin! bistîne,...

Apo kêr girt, kir beriya xwe. Serê xwe hezand. Ji zarotiya Memo xeyîdî bû. Ger şûna Memo de xortek, an jî kalek bûya, wî niha zûdave şorên nexweş gotibûna... Zarotî û camêriya Memo dest û piyên wî girêdabûn... Aliyekî dilê xwe de difikirî: "Divê min va lawikê camêrî belengaz nekiribûya nav van îşên xwe ên qevçî!.."
Aliyê din de digot:
- Memik, bi lezbe...
- Berî vê te got, melezîne...
Apo tifî erdê kir, simbêla xwe bada. Şeşara xwe derxist.
- Niha divê tu bilezînî!
- Hîn sibe dûr e... Baran jî dibarê...Peyîze. Va dûkana çiqas germ e... Welle, min dixwest li vira razêm... Çi kûrsîkî çak... Divê, em van kûrsiyan jî bibin... Oda me de kûrsî tunene...Tenê qatek cil heye... Van odeyên xelkê çiqas rind in...Heylo hayê... Tara,tara...
Apo ji van şor û henekên Memo zehf şaş û mat bû. Ev cara pêşin bû, dora diziyê de Memo dikeniya û henek dikir: "Va şeytan e,çi ye? Eynî ka diwê dolê şeytên e... Camêr e...Karê min dizî ye,bona wê yekê, min ew kir diz... Tu!.. Heyret, bona vê xwûnsariyê, Heyret... Ecêw? Gelo dîn nebûbe... Ji tirsan? Na bavo, tenê zaro ye, fehm nakê... kurikeke? Em ne di sînemê de nin, em diziyê dikine... Ya rebbî tu me biparêze... Ya rebbî komekiyê bide me..."
Memo dest bi lorandinê kir:
Ax, heylo! Bavo, heylo hayê!...
Li vî welatî sebra min nayê...
Wî welatê hinekî bê derd
Digerim, ê ku tijî ye rez
Û porteqal, dostî û çerez!..
Ax, heylo dayê, heylo dayê!
Ev straneke kevnî dangdayî bedewbû. Dengê Memo jî gellekî **xweş**bû.
Tewata Apo hate birrîn, di ciyê xwe de liviya. Wî dibêjî ka hişê xwe wenda kiribû. Ji tev Memo hatina xwe hezar carî poşmam bûbû... "Qûsûr,qûsûra min e... Çima an tenê, an jî tev camêrekî din nehatim... Na tenêbûn ne rind e... Lê divê tev zilamekî... Ya rebbî alîkariya xwe ji me dûr mexîne."
- Kurro Memik, tu dîn bûye?
- Çima Apo ?
- Tu! çer çima... kûçik... ax, na na... kurro, ez gorî, va dem û şûna stran û evînê nîne... di wexta kar de, merov çawa dikare bistirê ?..
(80)

- Çima merov nikare?
Hember vê bersîvê Apo lal bû. Xwûyek sar li ser eniya wî kom bû.
Memo dirêj kir:
- Dema ez li ba terzî dixebitîm, ewna him dixebitîn û him jî kilam digotin... Dawî, ox... her tişt xelas bû... hinekî din rê bide min, kerem bike... belê... dayê... qet zêr û zîv nema... Min giştik rêj kir... tûrê min î gellekî giran e ha... sê-çar kîlo henin... ho.... tûr bigre... tu dilxweş bûyî, Apo ?
Apo nefesek dirêj kişand; riwêla xwe kire beriya xwe...
- Hele şikur! şikur!
Wî destên Memo girtin û ji kuna derî re kişand derve. Tûr kire bin piyê xwe ê rastê, deriyê pêşin girt, kilît kir û kete rê,dilê xwe de: "Van zêr û zîvana dikarin min û Memo vê zivistanê îdare bikin... Towe be, ta biharê, ta dawiya vana tê diziyê nakim. Xwedê tu şahîdê min î... soz.. ezê Memo bidim ber xwendinê.. hi.. nabe... Çima nabe ? Zarokekî paqij e... bila ji feqîrî û diziyê xilas bibe!... Emrê mi çûrt bû, riziya...bila ê wî nerize... Him destmiza wî jî di vê diziyê de heye..."
Ber dîwaran de herdu bin baranê de dilerizîn. Oda wan gellekî dûr bû; di taxeke belengazan de bû...
Xafilda, koşê şeqemek piçûk de sê dengê hişk û sert bilind bûn:
- Melivin!.. Emê we bikujin! Destên xwe bilind bikin... Devê sê riwêlan rind ketin herdu kêlekên Apo ku wî xwûnsariya xwe qet wenda nekir. Tûrê tiji mûcewherat jî di destên wî de şeqitî û kete erdê. Memo mat bû, di nav lingên qeletûyan de sekinî bû. Destên xwe hêjandin, dixwest tiştekî bêje, lê zimanê wî nedigeriya. Van hemû tiştana di nava bîtekê de derbas bû bûn...
Apo:
- Hûn kî nin ?
Di wê tariyê de serçav û sersekeyên kesî nedihat naskirin: Tenê deng û livîn... Di nav xûşîna baranê de galgala wana pir bê toşe bûn... Gava Memo bi bêheşî destê yekî girt, şelmaqekî giran li ser rûyê wî ê rastê ket.
Apo:
- Hûn hevalê wî lawikî nin ? Şerm e, hûn çima wî dikotin ?..Hûn kî nin ?
Dengekî:
- Em merovê ji te pêttir û fêlbaztir in.
Apo:
- Hûn dizanin ez kî me ?
Dengekî din:

- Belê... Tu jî dizekî mîna me yî. Te li dûkanek piçûk mûcewherat dizî, emê jî li te bistînin.

Dawî ji qirika Memo, yek bi yek şor derketin:

- Vana zêrê min in... zêrê min in vana... Deste Apo medin... Welle bille min dizîn... min dûkan şêland...

Dengê şelhaq, gurmisk û pînan ketin nav nalînên lêwik. ê ku vegevizî û kete erdê...

Apo:

- Gelo hûn tewr ne merov in ?

- Em merovê ji te zexmtir û pêttir in. Ger polîs merov in, em jî merov in...

Dengê pînan dom dikir û lawik diqîriya...

Apo:

- İnsafa we qet tunne ye?

- Belê, insaf çî ye ?... însaf jı bo belengazan zerar, bona dewlemendan kar e, qezenc e...

Apo:

- Ev dema dema we ye. Lê dor û dema min jî ê were.

Dengê "Belê":

- Dora te ni, lê dongiya te hat.

Xençereke girsî dirêj ta binî kete nav dil û kezewên Apo, ê ku mîna sipîndaran li ser piştê ket... Dengê bazdana sê cot lingan li ser kevirên şeqemê bilind dibûn, dûrketin, sist û wenda bûn.

Memo hêdî hêdî rabû ser çongên xwe, nêzîka bedena Apo bû. Bêdeng destên xwe li ser dev û rûyê gerand; tiliyên wî dilerizîn. Hustiyê Apo tijî tiştekî germî nerm bû bû. Xafilda brûskekê veda; dorhêl ron bû. Ji sîgê Apo xwûn mîna ava kaniyên biharê dihêrikî, diçû, diket ser kevirên şeqemê û rêz dibû... Çavên Apo vekirî mabûn; te digot ka ew tijî sarkalm û zelûlî bû bûn... Ronakî hate qedandin.

Memo siftê destê xwe ê rastê hêjand; hêjand.Hemû kincên wî rind şil bû bûn. Av gihêştibû çêrmê wî... Paşê bûl bû , serê xwe kir nav sînga Apo,ê bi xwûn:

- Bazdin, werin, merovek hate kuştin... Hawar!, merovek kuştin.

Tariya şevê de, baranê tava xwe zêdetir dikir û hişk dibarî.Derva sar bû. Peyîzê kurmê xweyî paşin dirijand. Gurmîna baranê bêtir bû bû. Merov digot ka ew dera çol bû.

- Hawar! çirrî û gazî! Merovek hate kuştin! Hawar! Merovê çakî merxasî rind kuştin, werin!

Di kolana Diyarbekrê de xwûn tev ava baranê dihêrikî. Hemû derî

û pencere kîp û girtî bûn. Lawikek di nava kolanekê de, ser meyîtekî bû... tarî bû!...

M. B o r

---

## H o  X o r t

Ho xort!
Xortê Kurd,
Pêşengê xebat,
Hêviya welat,
Kurrê bav û dê
Ji bo azadî,
Ji bo serbestî,
Bi şev û bi roj,
Me divê xebat.
Heval û hevrê
Azadî,bi dûketine..
Berî her tiştî,
Ji her ramanek,
Ku me bi dûrxe,
Ji armanca me.
Heya em navên,
Ramanên cankuj
Di nav serên xwe,
Çawan sar dibe,
Ev tivanca me.
Hin ji me,
Bawer in ku,
Azadiya welêt,
Ji neyaran,
Ji zorkeran,
Ew e serxwebûn.
A rast,
Çi ramanek kevn,
Çi ramanek nû,
Ku me girêde,
Me dike kolî,
Ew e wenda bûn.
Divê em,
Berî her tiştî,
Bi nêhrîna xwe,
Bi ramana xwe,
Azabin serbest.
Çiqas em,
Bêne girêdan,
Bi ramanên xelkê,
Li ser reya wan,
Dê bibin bindest.
Bo çi tu ?
Xwe qels dibînî,
Kêmtirî xelkê,
Dûvik û terî,
Şermende,
Reben û bêkêr.
Çi roja,
Ku bûye şerr,
Ku bûye ceng,
Tu dibû serdar,
Tu bû nijdevan,
Her tu bû piştmêr.
Ji bo çi ?
Tu bikî,
Xelk bixwe,
Her ji keda xwe,
Bimînî bêpar!..
Ji dilpakî,
Bi dilqencî,
Beyî xapandin,
Bimînî li paş
Xulamê neyar.
Bes e, ho!
Çavê xwe veke,
Da ku carek din,
Wekî her carê,
Neyî xapandin.
Baş binas,
Reya xwe,
Armanca millet,
Da giyanê Kurd
Bête vejandin.
Azadî,
Ji bo te
Ku bi tukesî,
Bi tu ramanan,
Neyî girêdan.
Yek armanc,
Yek rêzan,
Yek raman,
Xebatê bikî,
Ji bo Kurdistan.
Ji bo îro,
Ev gotin bes in,
Heke zanibî,
Ji min bibhîze,
Şîreta biran.
An na,
Dê bê xapandin,
Ji dilpaqijî,
Bibî part ji bo,
Rovî û guran.

Osman S e b r î, Bahoz, rûpel 63,1956